

Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

<https://rantey.org>

Yedek ve Duyuru Kanallarımız

Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

- Telegram: <https://t.me/birkitapbir>
- WhatsApp Kanalımız : <https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4lvMoc0Y>

Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî 8

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Profîsor A. Hesretyan

Werger Dr. M.S. Cuma

Berlin, di 17. 6. 1999 de

Kurtîya jîyana min di nava çend rêz û dêran de

Ez di dawîya gulana sala 1937 de li gundê Kêstek de li Herêma Cezîrê de li Kurdistana Surî de ji malbata Başokê Yezîdîyî Musulman de hatime bizayîn; jiber ku fermana Bav û kalên min li ser destên Selteneta Osmanî de der sedsalê nozdehan de li Şingalê de hate birakirin û bi darê zorê ve gumgume bi destên me ve dane bihilgirtin.

Min xwendina xweyî dibustanê li bajarê Qamişlo û Şamê de ji sala 1946 tanî sala 1959 de di nava hin dibustanên Suryanî de date bidawîkirin.

Di pêşî de di payîza sala 1959 de min li bajarê Şamê de di zanistgeha wê de di berê felsefê de date bixwendin.

Di pişt re di buhara sala 1960 de li Elmanya Fêderalî de li bajarê Monîx de di zanistgeha wê de di berê zanistîyên dewletê de tanî sala 1963 de date bixwendin.

Di payîza sala 1963 de bi saya Partîya Demokratî Kurdistan ve xwendin li Elmanya Demokratî de bi destên min û neh Hevalên dinî Partî ve hate bikevtin û min li Berlina Rojhilat de di Kolêca Aburî de aburîya siyasî date bixwendin.

Di tîrmeha sala 1967 de min têde Diplom di zanistîya mêjûwa aburîya siyasî de date biwergirtin û herwehaji têde di rêşmeha sala 1972 de min Doktora di zanistîya mêjûwa aburîya siyasî de date biwergirtin.

Ji sala 1972 - 1975 de min di warê wergerandinê de didate bikarkirin.

Ji sala 1975 tanî sala 1992 min li zanistgeha Humboldt de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa aburîya siyasî de bi

giştî ve û di mêjûwa aburîya siyasîya Dewletên paşkevî de bi taybetî ve didate bikarkirin.

Ji sala 1953 de min xwe bi zimanê meyî şêrîn û perest ve didate bimijûlkirin û wî û herwehaji mêjûwa me tevaya bala min bi ser xwe ve didatin birakişandin. Bi xewna zarotîya min ve dihate biderkevtin, ku ez di warê wî û herwehaji mêjûwa me de bidim bikarkirin û wan bidim bipêşvexistin, da ku milletê Kurd ji sedsalên navî û bendîtîyê de bête birizgarîkirin û bi serxwebûnê ve di nava Kurdistanê de bête bitackirin; jibervêjî ve ez ji bona xwendekarîyê ji bona Ewropa hatim biçûyîn.

Cihanbîniya min di têgihiştina diyalêktîka jînê de li ser felsefa Zerdestî, Aristo, Xanî, Hegel û Marx de tête bibingehkirin û têgihiştina min di çarekirina pîrsa kurd de û pêkanîna Dewleteke Milîyî ser bi xwe ve di nava Kurdistanê de li ser rêbazê Barzanî û felsefa Xanî de tête bicî û biwarkirin.

Ji sala 1953 de û hêj ez bi Endamê Partî ve têtîm biderkevtin û her û her ez bi jêhatî ve di nava rêzên wê de bi mîna Endamekî ve didim bikarkirin.

Di nava salên 1979 tanî sala 1993 de bi Endamê Komîtîya Nawendî û Endamê Mekteba Siyasî ve dihatim biderkevtin.

Di sala 1996 de ez bi Nîşana Barzanî ve hatim bixelatkirin û herwehaji bi Rawêjkarê Siyasî ve ji bona Mesud Barzanî hatim bidestnîşankirin.

Ji sala 1964 de min jinek Elmanî dayite bianîn û lawekî me bi navê Ciwan ve tête bidîtin, yê ku ew bi yekekî ve ji Zanistvanên Gencên Elmanî ve di Zanistîya Elektironik de tête biderkevtin.

Min di jîna xwe de ji xwe re bi zimanê Erebi, Ingilîzî, Suryanî, Farisî, Elmanî û Rusî ve dayête bixwendin; belam min Suryanî û Rusî dane bijibîrakirin.

IV

Li vêderê de ez hinek ji karên xwe li ber destên
Xwendevanên giramî de didim bidanîn û ew jî evin; tevî
ku armanca min di jînê de tête biderkevtin, ku ez sed
nivîstan bi Kurdî ve bi zaravayê kurmancî ve ji bona
nivîstxana Kurdî bidin binivîsandin:

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1931-1958
Mesud Barzanî

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1958 - 1961
Mesud Barzanî

Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê
Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê
Mohemed Emîn Zekî Beg

Mêjûwa Dewlet û Mîrneşînîyên Kurd Di Pêla Musulman-
tîyê De
- Bergê Duwem Ji Kurtîya Mêjûwa Kurd û Kurdistan -
Mohemed Emîn Zekî Beg

Pirsiyarîya Kurd
Mêjûwa Kurdan û Neha Wan
(Civata Xweyîbûnî Kurdîyî Welatperwer)
-Belavoka Pêncem -
Dr. Bilêc Şêrkoh

Kurd
Rûnkin û Dîtin
Kurd Nevîyên Mîdîyan
V. F. Mînoriskî

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de
Profisor A. Hesretyan

Der Barê Sitraticîya Siyasî û Sipahî ya
Tevgera Welatîyî Kurd
-Temaşekirinek ji bona Mêj û Neha, herwehaji yekeke din
ji bona Ayinî de-
Ismet Şerîf Wanlî

Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şeweyê wê,
Pêşkevtina wêna, Rûnkirinên li ser Mêjûwa Kurdistanê û
Dîroknivîsandina Rojhilatê de
Doktor Ismet Şerîf Wanlî

Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de
Akadimiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadimiya Za-
nistîya Ermeniya Sovyêtê; Mosko, di sala 1987 de

Mîr
Nikolo Mikavili

Peymana Civakî
Jean-Jacques Rousseau

Pêşkevtina Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê
Friedrich Engels

Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merovan
Friedrich Engels

Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de
Lenin

Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê
Lenin

Zînetî Zîmanî di nava Heremên Kurdî de
R. I. Tissabolov

Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
-Çend bîr û bawerî li ser hin rudanên siyasîyî de ji sala
1956 - 1975 de-
Dr. M. S. Cuma

Herrwehaji min di sala 1966 de namilkeyek di bin nav
û nîşana: Li ser tirba Pêro de date bibelavkirin

Herwehaji min Manêsta Partiya komunist ji bal Karl
Marx - friedrich Engels de di sala 1975 de ji bona zimanê
Kurdî zaravayê kurmançî date biwergerandin û ew di
weşanên Ronahî de di sala 1976 de hate biçapkirin.

Herwehaji min di gelaveja sala 1986 de: Sî sal mêjûwa
Komela Xwendevên Kurd li Ewropa date binivîsandin. Ew
ji bal Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di
gelavêja sala 1986 de li bajarê Berlina Rojava de hate
biçapkirin.

Dr. M.S.Cuma

Naunîşan: Kurdîstana Turkî di Navbera
Herdu Cengan de

Nivîskar : Profîsor A. Hesretyan

Werger : Dr. M.S. Cuma

Çapa yekem : Kurdî - Kurdmancî - 1999

Çapxana : Rewşenbîrî - Hewlêr - Kurdistan

Dane : 1000

Leyawt: Govend M.H. - Berig: Serdem

Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Jimara spardinê (107) li sala 1999

Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî (8)

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Profisor A. Hesretyan

Werger Dr. M. S. Cuma

Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Jimara spardinê (107) li sala 1999

Çap: Çapxana Rewşenbiri - Hewlêr - Kurdistan

Navrok

Pêşgotin.....	4
Pirsiyarîya Kurd li Turkiyê de.....	13
Ji destpêkirina Tevgera Kemalî de tanî	
Kongirê Lozanê	13
Raperîna Kurdan di Sala 1925 de (Raperîna	
Şêx Seîd)	74
Lîkarxistina Raperînê	74
Birêveçûna Raperînê	87
Pêrabûnên Yasayî û Sipahîyî wergirtî	
ji bal Serdarên Turkan de ji	
bona nabûdkirina Raperînê	95
Girtina Rêberên Kurdan û Dadkirina	
Wan	119
Serûştîya Raperînê	134
Ramyariya Desteyên Serdarên Turkî	
Beramber bi Xelkên Kurd ve	
(1924-1939)	142
Lîsta -1-	143
Lîsta -2-	190

Pêşgotin

Xwendevanên hêja!

Vaye ez nivîsta Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de ji bona nava destên we didim bidanîn.

Ez ji Xwendevan û Rexnevanan hêvîya lêbuhurandinê li ser hemû van kur û kêmanîyên de didin bidaxwazkirin, yên ku ew di nava vê nivîsta hanê de têtin bidîtin.

Ev nivîsta hanê min ew di 6. 1. 1988 de ji zimanê Erebi date biwergerandin, ya ku ew ji bal Dr. Sededîn Mula û Bavê Nazê ji zimanê Rusî hatibû biwergerandin. Ez dixwzim li vêderê de sipasîya xwe ji bona van herdu Dostan li ser vî karê qenc de bidim pêşkeşkirin.

Min ev karê hanê him ji bona pêşvexistina zimanê me û himjî ji bona bêtir têgihiştin û pêgihiştina Miletê me di mêjûwa xwe de date biwergerandin; jiber di vî warê hanê de kêmanyên me bi pir zor ve têtin bidîtin.

Danerê vê nivîsta hanê Profisor Hesretyan Serkê Beşê Kurdî li Zanistgeha Moskê de tête biderkevtin û ew yekekî

5 Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

bi pir karnas ve di warê mêjuwa Kurde de û herwehaji ji dil û can ew bi dostekî Ermeniyî Kurdî şêrîn ve tête biderkevtin.

Ez tevaya sipasiya xwe ji bona vî dostê şêrîn û xweşewist ji dil û can didim bipêkşeskirin. Hevîdarim, ku her û her dostaniya Gelê Ermeniyî xweşevist ligel birayê wîyî Mar de, weha Ermenîyan di mêjuwa kevna de Kurd didan binavkirin, bête biberz û bibalakirin.

Ev karê bi nerx û hêja ve demeke pir giring û xwînavî û hêjbêtir poşandî di mêjuwa me de dide biderxistin û biraxistin, ya ku ew tanî nihaji hêjî pir bi kêmbûn ve li ser ge hatîye binivîsandin.

Serpêhatîyên rûdanên vê pêlê dûr yanî nêzîk bingehean wan di tevaya siyaseta Osmanî de di dawîya sedsalên heştdehan de beramber bi Kurd ve tête biderkevtin û wê ji wê demê bi xwe jî ve daye bidestpêkirin.

Piştî bezandin û rûxandina Dewleta Osmanî di sala 1918 de û bi dawî hatina cenga yekem ve û bi girtina kokgirê aşîtiyê ve li Sêver de û peymana wê di sala 1920 de beramber bi çarekirina pirsîyariya Mîliyî Kurd de hêviyeke mezin ji bona serxwebûna Kurdistanê li nik Miletê Kurd de ji nû ve careke din hate bidîtin.

Kurdan li gora zanebûn û karîna xwe de careke din ji nû ve ji bona vê mebesta perest di serxwebûna Kurdistanê de dane bixebatkin.

Pir dek, dolab û vîlik li ser serên Kurd de hatin bigerandin û di encamê dawî de li ser bingehe Peymana

Sayks-Piko de, ya ku ew ji bona parvekirina Dewleta Osmanî di navbera Igilistan, Firensa û Rusya de li bajare Beyrudê de di sala 1916 de hatibû bigirêdan, ji nû ve Kurdistan di navbera çar Dewletan de hate biparvekirin û bibendekirin.

Bingehê vê parvekirina hanêyî nuh û hemû destanên, yên ku ew tani niha bi ser serên Kurd de ji bal van Dewlewten Dagîrkerên Kurdistanê de têtin bikirin, tevde ew li ser dewlemendîya Kurdistanê Jêrî de li ser nefta wê de hatin û hêjî têtin bikirin.

Ev jî di bin nav û nîşana pirsîyarîya Musilê de di sala 1925 de tête bidîtin, ya ku bingehê çarekirina wêna di nabebera Turk û Ingilîzan de di sala 1926 de hate bikirin.

Hoyê çarekirina vê pirsê hanê di nava wan Dewletan de di Peymana Lozanê di sala 1923 de hate bikirin, ya ku tede Peymana Sêver beramber bi Kurd ve ji bona daketina Turk ji Wilayeta Musilê, -ango bigir ji tevaya Kurdistanê Jêrî ligel nefta wê de ji bona Ingilîz-, bi carekê ve hate bihilanîn û bijibîrkin.

Destana Netewê Kurdî perçekiri bi hemû nobûn û hovîti ve ji bal desthilatîyên Dagîrkerên Kurdistanê de hate bidestpêkirin.

Dirbûn û hovîtiya wan beramber bi Netewê Kurd ve gelekî ji Ramyarîya Kolonyalîya Portogâlî û Sîpanê li Emerîka de bi tûjtir, notir û hovtir ve tête biderkevtin.

Ramyarîya -Siyasetê- wan nebes tenê li ser talankirina

7 Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

dewlemendiya welatê me û kole û bendekirina Miletê me de tete biavakirin, na hejîbêtir ew li ser qirkirina wî de bi carekê ve tete bihîmkirin.

Li ser vê dewlemendiya welatê me de tanî irojî hejî Dewlên Kolonyalîyî Dagîrker bi hemû hovîti Kurdistana me didin bitalankirin û bi serdejî ve bi hemû çekên dujehî jî ve jî bona bendekirin û qirkirina Miletê me bi Çekên Kimyawî û Biyolocî ve didin bikarkirin.

Careke din jî di vê Pêla me de ji nû ve bi hemû xurtbûn û nobûna xwe ve pirsîyarîya Kurd jî bona serxwebûn û pêkanîna Dewleteke Milîyî Hevgirtîyî serbixwe ve jî bona gorepana rojhilata navîn hatîye bikevtin.

Ev xebata me vê carê di vê pêla niha de bi saya xebata Miletê me û yekbûna wî li Kurdistana Jêrî de bi qonaxeke pir bilind û giring ve hatîye bivegihaştin.

Pişti avêtina Çekên Kimyawî û Biyolocî ji bal Dewleta Iraqê de ji bona qirkirina Miletê Kurd tevaya dunyayê vê carê ew bi hewara Kurd ve hate bihatin. Destên Serdarên Iraqîyî regezperest dane bikurtkirin û Siwaneke Sipahîyi Parastinê jî bona ser kurdistana Jêrî ji bal hêzên Hevalbend de beramber bi hovên Serdarên Mirovwxwerên Iraqî de hate bivedan.

Di vê salê de rûdanên pir giring û kûr di mêjuwa me de û herwehaji di mêjuwa rojhilata navîn de hatin bidestpkêirin.

Helbijartina demokrasî, pêkanîna desthilatîya Kurdistan û dazanîna Dewleta Fêderalî -Hevgirtî- ji bona Kurdistana Jêrî de hêvîya Kurd di serxwebûnê de li ser bingehê siyaseteke nerm, liserxwe û rast de hate bidanîn.

Ev Ramyarîya hanê nebes tenê berjewendîya Gelê Kurdistanê dide biderxistin, herwehaji û pêrejî berjewendîya Gelê Ereb, Turk û Iranî jî dide biderxistin, ku ev Miletên hanê bi hev re û mîna hev di serxwebûna Milî û Welatî de ji bona xweşbûna abûrî, pêşveketin û geşbûna civakî bêtin bijîyandin.

Ji bona vegirtvan û talankerên hovên Serdarên Kurdistanê ji Ereb, Ecem û Turkan bes û bi tenha ve du rê têtin bidîtin, da ku ew li ser de bêtin biçûyîn:

1. Rêya pêrûniştina serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna Dewleteke Milîyî hevgirtiyî serbixwe ve li seranserî Kurdistanê de û jîyan ligel Netewê Kurd de bi aşitî û dostanî ji bona xweşbûna jînê û bikaranîna hemû dewlemendiya van welatan bi hev re ji bona berjewendîya Gelên xwe tete bidîtin, da ku ew jî tevde ji vê li paşvekitana hanê de bi hev re bêtin birizgarkirin.

2. Çûna sertî li ser vê siyaseta niha de bi talankirina dewlemendîya Kurdistana me, kole û bendekirina Miletê me, na hêjbêtir bi qirkirin û nabûnkirina Netewê Kurd ve tete biderkevtin.

9 Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Ev siyaseta hanêyî dawî bi giştî ve ji bona Netewê Kurd bi destaneke gewre û giran ve, lêbelê bi neçarî ve bi serxwebûn, yekgirtin, rizgarkirin û xurtbûna wî ve tête bidawikirin.

Lêbelê ev siyaseta hanêyî dawî bi giştî ve dê ji bona Ereb, Turk û Iranî bi destaneke deha gewretir, kûrtir ve oête bidawîkirin, ku di encame dawî de bi neçarî ve li ser vê siyesta çepelî kotî de ew dê bi dehan sal ber bi ber paşvexistinê ve bêtin birakişandin û dê welatê wan dûr yanî nêzîk bête bikavil û biwêrankirin.

Baştirîn nimûne li ser vê siyaseta dir û hov beramber bi Gelê Kurd ve siyata Dewleta Irqêyî bêtir ji pêncî sali ve tête bidîtin, ya ku ew di encamê dawî de bi wêrankirina wê û rûxandina wê hate bidawîkirin, di wê roja pîroz de, di roja Dazanîna Dewleta Havgirtî-Fêderalî- de li Kurdistana Jêr de hate bidîtin.

Ev rastîya hanê divê bi diyarî ve ji bona wan Dewletên Dagîrker û Kolanyaî û herwehaji ji bona Miletên Ereb, Turk û Iranî jî bête bigotin. Ev Dewletên han jiber vê bi destkevtina Kurd ve cerg û hinav li wan de tête bilerizkirin.

Taya mirina desthilatî, talankirin, kolonyalîkirina wan ji bona Kurdistana me vaye dayite bidestpêkirin.

Hîç gûman têde niye, ku Netewê Kurd ji dil û can ew dixwaze bi serxwebûn, xweşî û dostanî ve ligel Miletên Ereb, Turk û Iranî de bête biijiyandin.

Ev Miletên hanê hemû mîna hev û bi hev re bi baştirîn dostên Netewê Kurd ve têtin biderkevtin û Kurd jî bi xwe jî ve bi baştirîn dostên wan têtê biderkevtin, heger ku ew bi rastî ve di bingehê qazanc û berjewendîya xweyî Milî de di niha de û hêjbêtir di yyinde de bêtinbi liberketin.

Azadîya me Kurdan bi azadîya van Miletan ve têtê bigiredan û herwehaji azadîya van Miletan jî bi azadîya me Kurdan ve têtê bigirdanê. Miletêkî azad Miletêkî din Jêrdestên xwe nade bikirin.

Destana van Miletan di wê çaxê de dê bête bidestpêkirin, gava ku ew vê rastîya hanê di serguhên xwe re bidin biavêtin.

Li vêderê de bes û bi tenha ve ji bona bibîrxistinê em ji bona dostên xweyî Gelê Ereb li Iraq û Surî de vê rastîya hanê didin bixuyanîkirin û li ber çavan wan de didin bidanîn:

Bê ava Kurdistan Iraq û Surî nikarin bi başî û xweşî ve bêtin bijîyandin, na hêjbêtir ew nikarin wetov nala niha jî bêtin bijîyandinbijîn?

Herwehaji ma gelo dê Turkî û Iran jî bi bê çarekirina pirsîyarîya Kurdistan di serxwebûn û yekgirtina xwe de dê bikarin ew xwe bi pêş ve bidin bixistin?

Her Mirovekî piçekî têgihiştî di mêjûwa rojhilata navîn de, di mêjûwa xebata serxwebûna Milatan de di seranserî cîhanê de bê çarekirina serxwebûna Kurdistan û yekgirtina wê ev Dewletên Dagîrker, Talanker û Kolonyaliyên Kurdistan ji bal Netewê Kurdê gernas û mêrxas de di Encamê dawî de dê bêtin bitarûmarkirin.

11 Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

mêjuwa rûxandin û nemakirina Babil û Nîneva divê her û her li ber çavên van Talankeran û Mirovxweran de bête bidanîn.

Netewê Kurd ji berî pênc hezar sal di hemû qonaxên mêjuwa rojhilata navîn de her û her bi mêrxasî û gernasî ve li ber rûmeta welatê xwe de beramber bi pir Vegirtvanên bi nav û deng ve di mêjuw de hatîya birabûn û ew di encamê dawî de ji nava Kurdistana xwe dane bderkirin û bipengizandin û hêjbêtir bi hust bi bi hust ve pê bi pê ev xakê perest ji gemara tapanên Dujminan daye bipakkirin û birizgarkirin.

Pirsa ku ew niha xwe bi darê çu ve dide bikirin, ma gelo dê ev Talenkerên Serdarên Dagîrkerên Kurdistana me di vê rastîya hanê de bêtin biliberkevtin, di vê deme ku Netewê Kurdî perçekirî bi şiyarbûna Milî û serxwebûna Kurdistana xwe ve di tevaya dunyayê de bi nav û deng ve tête bikirin û ew şev û roj ji bona durujmê Kurdistan yanjî Neman bi pêgîrî ve jê re dide bixebatdikin.

Mujde li asûwê esmanê Kurdistana me de vaye Dazanîna Dewleta Havgirtî-Fêderalî- li Kurdistana Jêrî de tête bidazanîn. Ev hêvîya bi hezaran sedhezaran ji gorîyên Kurdistan di rêya rûmet û xebatê de ji bona serxwebûna Kurdistana me û yekbûna wê vaye hêdî hêdî bi nermî ve, li ser xwe de û hêjbêtir li ser bingehe hiş de tête bicihanîn.

Tevaya Kurd li seranserî Kurdistanê de niha yek erk û armanca jêre tête bidîtin: ew jî şev û roj xebat û karkirin ji bona xurtkirin û pêsveexistina vê Dewleta Kurdistana me yî perste dide bikirin, ya ku ew hêvîya jîna me ye, na hêjbêtir ew tevaya Mirovanîya me bi xwe ye.

Dermanê vî derdê me mîna hercar ew bi carekê ve di bingehê yekitîya Kurd de li seranserî Kurdistanê de tête bidîtin. Ev yekitîya hanê bi rêzana destûra serxwebûn, yekgirtina Kurdistanê me û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe ve tête bîderkevtin.

Dujminên me di hemû pêlên mêjûwa meyî tirş û tal de her û her wan ji duberîyê di nava Miletê me de bi hemû tuwana xwe ve dane bikarkirin û bi rastî jî ve her û her bi vî karê hanê ve wan em di nava xwîna me de dane bivegevizandin û welatê me ji xwe re ser li nû de bi mêrga kuştin û talanîyê ve dane bikin.

Jibervêjî parastîna yekitîya me bi erkekî herî gewre ve li ser şanên me de tête bîderkevtin. Bêyî vê yekitîya Kurd li seranserî Kurdistan de bivin yanî nevên, dê em hemû bîdestkevtinên xwe ji nava destên xwe bidin bîberdan û biwindakirin û careke din jî bi neçarî ve destana me ji nû ve, lê vê carê hêjî gûrtir û bedtir dê bête bîdestpêkirin.

Berî ku ez vê pêşgotina xwe bi dawî ve bînim bianîn, ez li ser xwe de didim bidîtin, ku ez li vir de tevaya sipasîya xwe ji bona Fewzî Esed, Dr. Fewzî Resul, Mizgîn, M. A. Delawî û Ciwan li ser alîkariya wanî bi nêrx ve ji bona bicihanîna vî karî bidim bipêşkeşkirin.

Berlin, di 2 çirîya paşî 1992 de
Dr. M. S. Cuma

Pirsiyarîya Kurd li Turkiyê de

Ji destpêkirina Tevgera Kemalî de tanî Kongirê
Lozanê

Tevgera Rizgariya Kurd li Turkiyê de, ya ku bi destpêkirina Sedsalên Bîstan ve hatîye bidestpêkirin, piştî derbasbûna xwe di hin qonaxên pêşketina xwe de nîşana rizgarkirina Milî ji xwe re date biwergirtin. Ev tevgera hanê beramberî pêrabûnên siyaseta Şovîniyî Borcuwazîyî Turkî hate binokirin, ya ku ew di bin Rêberiyên "Turkiya Genc" de dihate biwênerkirin.

Bezandina Imperetoriya Osmanî di Cenga yekem de, topavêtina mêldariya Musulmantîyê û Osmanîtîyê, ligel jî gûrbûna Milîbûna Turkî de, ya ku wê Turkirin û Hilandina Kêmaniyên Miletên din bi darê zorê dida bidaxwazkirin, hişt, katbûn û pêşvexistina Şiyarbûna Milîyî kurd û gewrebûna tevgera wîyî Rizgarî pê bête bidestpêkirin.

Miletê Kurd jî mîna Miletên din di zîneta herifandina

Imperetoriya Osmanî de ji bona mafeyê xweyî Milî dest bi xebatê ve date bikin. Li ser têgihiştina tevgera Kurd de di wê qonaxê de "Komela Vejenadina Kurdistanê" (Cumîyet Tealî Kurdistan) hate biderkevtin, ya ku ew di sala 1918 de hate bipêkhatin û wê rawestandînen nerm ji xwe re dane biwergirtin¹. Vê Komela hanê ligel "Partiya Azadiya Ligelhev" de li ser dana Ewtonomî de ji bona Kurdistanê di nav çarçopê Imperetoriya Osmanî de peymanek date bigirêdan². Şaxên wêna li Wilayetên Diyarbekir, Bedlis û Al-Ezîzan³ de jî dihatin bidîtin, ji bona veğerandina kurdan ji heremên cudayî ji Enedolê ji bona cihên wanî Berê, herwehaji ji bona danîna karmendan ji Kurdan di dam û destgehên Mîrî de li Kurdistana Turki yê de⁴, xurtkirina pêwendiyê ligel Serdarên bajarê Sulêmaniyê de (li Îraqê) de û pêrejî danîna pêwendiyên Dostaniyê ligel Îngilîzan de wê didate bixebatkin.

Lêbelê Rêberên "Komela Vejandina Kurdistanê" xebata rast û durûst beramberî Turkan didan binayînkirin. Di

¹Dr. T. Z. Tunaya. Turkiyede Siyasi Partiler. 1859. 1952. Istanbul, 1952, R. 429-430

²M. Toker. Şeyh Saitb ve Isyanî. Ankerâ, 1968, R. 115

³K.. Ataturk Nutuk, C, III, Istanbul, 1962, R. 904 (Vesîrlar 8-9)

⁴Li gora bir û bawerîya Merovê bi nav û deng ve di Komela Vejandina Kurdistan de Kamiran Alî Bedirxan divabû Kurdistana Turkiyê Wilayetên Erzeromê, Wanê, Bedlisê, Diyarbekrê û Xarpûtê (Mamurî û El-Ezîzê) bêtin biberkevtin, yê ku topraxa wan 207 hezar Kilometrê Çargoşî dihatin biderketin (bîner li Kanîya Jimara I, R. 431 de).

civîna girêdayî de di Îlula sala 1919 de li Istenbolê de di dema xwestina Merevên Xort di Komelê de bi wergirtina biryarekê ve li ser dazanîna Serxwebûna Kurdistan û derkirina hemû Biyaniyan de jê û di nava wan de jî hêzên Turkî de Serokê Komelê Seyid Abdul-Qadir li ber vê Pêşneyara Xortên Kurd de hate birabûn; jiber ku bi tevgera Kurd ve nayête bikevtin, ku ew di ruwê Turkan de di demeke wehayî teng de bête birawestandin, ya ku ew tere têtin biderbaskirin. Hêjbêtir ji vêjî Abdul Qadir li ser pêşkeşkirina yarmetiyê de ji bona Turkan sorbû û li ser Endamên Xortên Komelê ji bona çûna heremên kurd de temînî dikir, herwehaji xebat diji pêrabûnên Eremenîyan ji bona pêkanîna Dewleteke Milî ji wan dida daxwazdikirin, wî her û her dida xuyanî kirin, ku ji bona dana Ewtonomî ji bona kurdan Sultan dê sozê xwe bîne bicihanîn.⁵

Tevlivêjî çendji Bernameyên Rêberiyên "Komela Vejandina Kurdistanê" jî bi nerm ve dihatin biderkevtin, van Rêberiyên hanê nedikaribûn Mêldariyên Endamên bêtir Xwîngerm di ser guhên xwe re bidin biavêtin.

Di birûskekê de ji bona Wênerê Diplomasiya Ingilîzî de li Bexdadê de Balozyanê Biritani de li Istenbolê de di mêjûwa 18 cotan sala 1919 de dide vinivîsandin:

Abdul-Qadir, tevî ku ew Serokê Dîwanxana Pîremerdên Osmanî jî bû, "bi navê Cîvata Kurd ve li vê derê de pirsîyariya Serxwebûna Kurd û Rizgarîkirina wan ji bin nîrê Turkiyî zikreş de ji min re date bipêşkeşkirin".

⁵M. N. Dêrsimî. Kurdistan Tarihinde Dersim , Heleb, 1952, R. 120-121

Herwehaji di birûskeke din ji de di mêjûwa 3 gulana sala 1919 de ji bona Wizareta derveyî Ingilîzî Balozvan dide biagehdarkirin:

"Ew Dewleteke Azad ji bona xwe didin bidaxwazkirin... Ew rizgarkirina xwe bi carekê ve ji Turkan didin bidaxwazkirin, yê ku wan ji bona kurdan hîç bi carekê ve tiştek nedan bipêşkeşkirin -weke ku ew li ser zimanê Abdul-Qadir de hatiye bigotin, yê ku bi taliyek pir ve li ser Turkan de dida biaxivtin"⁶.

Bêyî ku em li nik pir şapên bizava Kurd de di wê qonaxê de, herwehaji ligel durûjim û daxwazên wêna de bêtin birawestandin, em didin binîşankirin, ku remana rizgarkirinê ji bin nîrê Turkî rehên xwe pir kûr û qûl dayite biberdan, tanî radeyekî wisa ku Serokê Civata Dîwanxana Pîremerdên Turkî bi xwe jî ve bi bal ve hatibû birakişandin.

Herwehaji pêrejî rawestandina Şerîf Paşa di vî warê hanê de hîç delîlekî ji xwe re nade bidaxwazkirin, yê ku wî di Serpereştîya Dewleta Imperetoriya Osmanî de Şûnkarîyeke pir nazik û bala ji xwe re dabûn biwerdigirt.

Weha di kongirê Feresayî de, yê ku ew têde bi Serokê Wênerên Turkî ve dihate biderkevtin, wî ji ser xwe Berbirsîyariya Peyvdariyê bi navê Wênerê Turkî ve date biavêtin, wî xweser xwe nala Wênerê Kurdistanê date bidazanîn û dêst bi gift û goyînê ve ligel Wezîrê derveyî

⁶S. S. Gavan. Netewê perçekirî di Rojhilata Navîn de. London, 1958, R. 21

17 Kurdistanî Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Îranê de ji bona Dazanîna "Serxwebûna" Kurdistanê di bin perên Îranê de date bikin.

Weha du bibîrxistin ji dêlva Kurdan ji bona Kongirê Aştîyê bi daxwazên Kurdan ve di 22 avdara sala 1919 de ligel Neqşeke "Kurdistanîyî Lihevhatî" de date bipêşkeşkin.

Herwehaji pêrejî Şerîf Paşa gift û bêj ligel Wênerên Ermenîyên Taşnak jî de date bikin, ku li ser kêra vê jî de bibîrxistineke ligel hevdû de ji bona Kongirê Aştîyê de di mêjûwa 20 befirbara sala 1919 de herdu aliyan dane bipêşkeşkin.

Pir bi eşkere ve têtin biderkevtin, ku ev rastiyên hanê li ser Nobûna pirsîyarîya Kurd de li Turkîyê de bi delîlên pir diyar ve têtê biderkevtin; jiber pirsîyarîya Serxwebûna Erministana "Turkî" û him jî Kurdistanî "Turkî" piştî Cihêbûna tevaya Xakên Imperetoriya Osmanî li Ewropa û Asya de hate bipêşkeşkin.

Di nava van rewşên hanê de pirsîyarîya parastina yê mayî ji Imperetoriya Osmanî ji bona Borcuwazîya Turkî hate bipêşkeşkin. Nebes tenê peyv li ser bergirtina destdirêjiya Biyanî de di nava Xakê Turkîyê bi xwe v, herwehaji li ser Erministanê û Kurdistanê jî de di hate bikin.

Jiber vê yekê jî hêjî Mustafa Kemal Paşa cihê lingên xwe li Enedola Rojhilat de ne dabû bierdkirin, xweser wî bi civandinên hêzan û xurtkirina cihên Turkan ve li vê heremê de date bidestpêkin.

Ne bi xorayî jî ve Yekem Balozvanê Sovyêti li Tirkîyê de S. I. Aralov li ser têgihiştina jirêderketî ya li nik Ataturk de li ser Mafeyê Çarenûsî Miletan de date binîşankirin.

Weha Aralov dide binivîsandin⁷:

Di dema ku K. Ataturk li ber mafeyê Turkan de di Serxwebûnê de dide bidan, weha ew vî mafeyê hanê ji bona Ermenîyan û Kurdan dide binayînkirin.

Wisa di nava vê rûnkirina hanê de Merov dikare cewhera Politîka Kemaliyan beramber bi pirsîyarîya Ermenî ve û him jî beramber bi ya Kurd ve bête biliberkevtin.

Weha Kemalî nala Wêneran û liberxwedanan ji bona berjewendîya Borcuwazîya Turkî û nemaze bi rengêkî taybetî ve ya Enêdolî bi xwe ve her û her ew beramber bi tevgera azadîxwazî Kurd ve ji pêşîya pêşî de li ber de têtin biradibûn.

Di 15 axlêva sala 1919 de Mustefa Kemal Paşa ji Amasya ji bona Cihgerê Walîyê Diyarbekrê bi birûskeke ve bi şefre ve bi vê navroka hanê ve date birêkirin:

"Her Komelek, ku ew perçekirinê dide bibelavkirin, divê ew xweser jî hev bête bixistin ... Erkê Welatî bi van pêrabûnan ve bi xurtî ve dide bipêwistkirin. Jîbervêjî min pêrabûnên we bi carekê ve der barê Baregeha Kurdî de bi başî ve date bidîtin"⁸.

⁷S. I. Aralov. Bîrwerîyên Diplomasîyekî Sovyêti. Mosko 1960, R. 212.

⁸K. Ataturk. (Nutuk), Istanbul, R. 901, 903-904.

Peyvdarî di vê birûska hanê de li ser jihevexistina Şaxê "Komela Vejandina Kurdistanê" de li Diyarbekrê de li ser destên desthilatîya Turkî de tete bigerandin.

Herwehaji bûyînen mîna vena li her cihekî din de, ku karîn tete dihate bidîtin, ew jî dihate bikin. Weke tete bidiyarkirin, dibe, ku desthilatîya Turkî di bin rewş û zînetên destdirêjîya Biyanîyan de ne dikarîbû bi cengeke eşkere û fireh ve beramberî Kurdan bête birabûn; jibervêjî wêna tevaya karê xwe di vê qonaxa hanê de ne di serkutkirina tevgera Kurdî de didate bididîtin, lêbelê wê ew di parastina Serdarîya xwe de li Kurdistanê de didate bididîtin, herwehaji bi karanîna Zemîndarên Kurd ve di beramberkirina tevgera Azadîxwaza Ermenîyan de didate bididîtin.

Weha di peyvîna xwe de li ser vê de M. Kemal di birûska xweyî şefrekirî ve di mêjûwa 18 axlêva sala 1919 de ji bona Serleşkerê Orduwa Yekem li Orfa de dide binivîsandin, ew dibêje, ku Tevaya Xelkên Enedolê "ji bona Rizgarkirina Serxwebûna Welêt hev didin bigirtin... Bigir tevaya desthilatiyan û Walîyan tev de li vê biryarîyê de têtin biderkevtin. Herwehaji ragiyandin ji bona Ewtonomî li Kurdistanê de di bin saya Ingilîz de dihate birawesandin. Tevaya Mêldarên vê remanê hatin biderkirin. Kurd jî tev li Turkan bûn"⁹.

Li vê derê de Rêkirvanê vê birûska hanê nade

⁹K. Atatürk. (Nutuk), Bergê Sêyem, R. 910 (Bawername).

binîşankirin, gelo "kîjan Kurd tev li Turkan de hatin bikirin"? Weke ku diyare, ne tevaya Rêberên Kurd li tevgera Kemalî de didane bipîştgirtin.

Lêbelê rastî her rastî dimîne, weha hin soz ji bona Kurdan hatibûn bidan û Hinan ji Rêberên Kurdan weha didane bibawerkirin, ku dê Xwedmuxtarî (Ewtonomî) ji wan re piştî biserketinê bête bidan. Jiber vê yeka hanê jî tête biliberketin, bê çima Kongirê Gewreyên tevgera Milîyî Kurdî, yê ku ew di axlêva sala 1919 de li bajarê Erzeromê de hatibû bigirtin, biryariyek date biwergirt, ku têde ew dildariyê ligel tevgera Serbestkirina Turkîyî Nûhatî de didin biderxistin, herwehaji pêrejî wan tevaya piştgirtina xwe jêre datin bidazanîn, heger Milîyên Turkî bi Xwedmuxtarîyê ve ji bona Kurdsitanê pê bêtin birûnîştin.

Lêbelê heger Turk vê biryariya hanê bidin nayînkirin, wê çaxê dê Kongire ligel raperîneke giştî de beramberî Sultan deng bide bikirin, bêyî ku hîç pêt bi tevgera Kemalî ve bête bidan¹⁰.

Rêberên Kurdên Beşdar di vî Kongirê hanê de bi xwe ve ew ne dijî pêkhatina Dewleteke Turkîyî Welatî dihatin biderkevtin, ku di nava tara wê de ji bona Kurdistanê Xwedmuxtarî (Ewtonomî) bête bidan. Û ji bona vê yeka hanê bi xwe jî ve Jimareke pir ji Rêberên Kurd li Kongirê 10 çirîya pêşî de sala 1919 de li Erzeromê de hatibûn

¹⁰Memorandum Sur la situation des Kurdes et leurs revendications. Paris, 1945 R.2.

bibeşdarîkirin, yê ku ew di mêjûwa 10-23 gelawêja sala 1919 de hatibû bibigirtin.

Di Kongirê Erzeromê de tevî li Beşdarbûna Mayên "Komên Liberxwedana Mafeyan" bi serde jî ve Komela Liberxwedanê ji bona mafeyên Milîyên Wilayetên Rojhilat jî de têde hatibûn bibeşdarîkirin, ku di vê Komela hanê de pir Rêberîyên Kurd dihatin bidîtin, yên ku ew li pişt pêşkeşkirina pirsîyarîya Kurd de li ser Kongire de dihatin biradiwestandin¹¹.

Tevî ku li ser vê pîrsa hanê de li Kongire de hate bigiftûbêjkirin, lêbelê di daxuyanîya kotahî de bes û bi tenha weha hate biderxistin:

"Wilayetên Erzerom, Siwas, Diyarbekir, Xarpût, Wan û Bedlîs ... yekitîyeke lihevhatî didin bipêktînin, ku ew ji Imperetoriya Osmanî nayêtin biperçekirin yaxud bicihêkirin..., di bin çî mehneyekê jî de bête bidîtin. Herwehaji Musulmanên van hereman li ber çavên xwe de Nîşanên Rehî û yên Civakîyî cuda ji her van Komên Musulmanan din bidanîn, yên ku ji wan Miletêk tete bipêkhatin, lêbelê jî bi rengêkî giştî ve ew xwe nala Biran didin bidanîn, ku ew ji piştî Bavekî û Dêyekê têtin bikevtin¹².

Nala vê xwîngermbûna Turkîyî avdayî bi mêldarîya Musulmantîyê ve ji bona Milîvanên Turkî bi pêwîst ve dihate biderkevtin, da ku ew pê Musulmanan- ji Kurdan,

¹¹F. S. Aşkon. Kongirê Siwasê. Istanbul, 1963, R. 73.

¹²M. Kemal. Mêjuwa Tirkîyî nuh, Bergê yekem, R. 381, Pêvekirina 11.

Çerkesan, Lazan û yên din-bi ser xwe ve bidin birakişandin û wan di rêya Hestkirina Oldariyê de beramberî destdirêjkirina Biyaniyan û Xelkên File bidin bikaranîn.

Weha ligel vê daxuyanîya kotahîya Kongirê Erzeromê de dide bidazanîn, ku tevaya Musulmanên Wilayetên Rojhilat yek Miletî didin bipêkanîn. Tevlivêjê bê ka çi Daxuyanîya Kotahî li ser "Nişanên Rehî û yên Civakîyî cuda ji her van Komên Musulmanan" jî de dide binavrokin, rastîya xistina wê di nava yek "Miletî" de di pêşîya pêşî de bi nayînkirina xurûbûna Milîya Kurdî ve dide biderxistin û di encamê dawî de bi nayînkirina mafeyê Çarenûsî Kurd ve bi xwe ve tête biderkevtin. Jiber vê yeka hanê jî ne bi derewa ve hate biderkevtin, ku pir ji Gewreyên tevgera Kurdan bi Kemalîyan ve nedidane bibawerkin.

Lêbelê Kemalîyan ji dêlva Cemawerên Gelêrîyî Kurd wan pişta xwe bi Zemîndarên Kurdan ve dabûn bigirêdan.

Li ser vê rastîya hanê de tevaya naman û bangên pir têtin bimukurkirin , yên ku Mustefa Kemal ji bona mêldarkirina Zemîndar û Şêxên Kurdên bi deshilat ve ji bona rakişandina wan bi alîyê xwe ve di rêya wan naman û bangan de didate biarmanckirin.

Di gelawêja sala 1919 de Mustefa Kemal Biryarîya Kongirê Erzeromê ji bona Hin Gewreyên Zemîndarên Kurdan re date birêkin, herwehaji ligel jî de nameyekê, ya ku ew tede ji bona wan dide bibangkirin, ji bona xebatkirinê diji "Gelacîyên" Ermenîyan û "Dujminên" din

jî ji wan re date bibirêkirin.

Weha M. Kemal nameyekê ji bona yekekî ji Zemîndarên Şernexê Abdul-Rehman Axa re date binivîsandin:

"Dilsoziya we ji bona Xelîfe û Tacê ji tevya dunyayê re bi diyar ve tete biderkevtin û jê jî bi kêmtir ve nayete biderkevtin, ku yê we bi carekê jî ve hîç pê nayên birûniştin, ku welatê meyî perest ji bal Ermenîyan de bête bipîskirin û jiber nasîna min ji her kesî bêtir bi sincîyên weyî bilind ve tete bidîtin Ez bi carekê ve di wê bîr û bawerîyê de me, ku ezê we bi leztirîn dem ve di pêşîya Welatperwerên, yên ku ew jîna xwe ji bona pirsîyarîya Milet û Welêt didin bitirxankirin, dê bibînim. Weha vaye ez ji bona we jimarekê ji daneyên daxuyanîyên kotahî û yên biryarîyên cuda ji yên Kongirê Erzeromê didim birêkirin, herwehaji bi xurtî ve bi dawîanîna wan jêhatîyên Xînezî ve didim bikirin, yên ku Dujminên me bi wan ve têtin birabûn. Bi bawermendî ve bi welatperwerî û dilsoziya we ve dê ezê çavdêrê bendewarê pêrabûnên we bim¹³".

Herwehaji birûskên mîna vêjî ji bona Zemîndarên Motkîn Hecî Mosa Bê û Şêx Abdul-Baqî Afendî Kiyufer Vêzade ji Bedlîsê, ji bona Zemîndarên Dêrşîv Omêr Axa û Resul Axa ji Mûşê, ji bona Endamê Berlemanê berê Sa-Dela Afendî, Şêx Mehmed Afendî û Şêx Diya Aldîn Afendî ji Nûrşîn û herwehaji ji bona Zemînadê Xerzanê Cemîl Çetobî hatin birêkirin.

¹³K. Ataturk (Nutuk) Bergê Sêyem , R. 940 (Vesirelar).

Hin ji Zemîndarên Kurdan ji bona banga M. Kemal dane bierênîkirin. Lêbelê jî piraniya wan Biryariya Kongirê Erzeromê bi başîve nedane bididîtin; ne jiber bes pêtpênêkirina berjewendiya Milîyî Kurdî, lêbelê jî di pêşî de jiber bi navê Sultan ve dihate bigirêdan. Û di dawîya dawî de wan ne dixwest, ku ew bi vî "Gurîyê" hanê ve bêtin birûniştin.

Der barê hêzên pêşverû de di Civaka Kurdî de, yên ku "dilsoziya wan ji bona Tac û Sulatan" bi cihê lêgûmankirinê ve dihate biderkevtin, Mustafa Kemal yarmetî ji wan nedidate bidaxwazkirin. Evaya di nava rewş û zînetên katbûna xebata rizgariyî Gelên Imperetoriya Osmanîyî jihevketî de bi cihê liberketinê ve tête biderkevtin; jiber ku wan nema dikarîbûn bi "Welatperwer" ve bêtin biderkevtin, yên ku wan jîna xwe ji bona pirsîyariya "Netewê" Turkî û "Welatê Osmanî" nema didane bipêşkeşkirin.

Jîbervêjî dikare bes û bi تنها ve bête biliberketin, bê çima di Kongirê Sîwasê de bes hinek ji Kurdan tede beşdarbûn û tede hindamên Kurdî ji bal Mustafa Kemal, Reûf Beg, Xoce Reîf Afendî, Şêx Hacî Fewzî Afendî û Berî Samî Beg hatin "biwênerkirin"¹⁴. Lêbelê bê çawa wan kesên Navdar bi "Wênerên" Wilayetên Rojhilat ve berjewendiya Kurdan didan biderxistin, liberketina wêna bi xweve hîç bi dujwarî ve nayête biderkevtin.

¹⁴F. S. Aşkon. Kongirê Sîwasê. R. 149.

Tevî ku li dujminyatîya beramberî Impirayaliyê de di daxuyanîya kotahîya Kemalîyan de hatiye binivîsandin, ya ew ku ji bal Kongirê Siwasê de, di mêjûwa 11 keçîrînkê sala 1919 de hatiye biderketin, ew Daxuyaniya Kotahî bi xwe ve bi canê Şovîniyî guhpênedayî ve bi mafeyên Kêmaniyên Milî ve û bi rengêkî taybetî ve beramber bi Kurdan ve hatibû bidagirtin.

Weha di pişt de Biryariyên Kongirê Erzeromê û yê Siwasê di bingeha "Peymana Milî" de hatin bicihkirin, ya ku di rêbebdê sala 1920 de ji bal Parlemanê Istenbolê de hate biwergirtin, Ev perlemanê ku piraniya Endamên wî berjewendiya Kemalîyan didane biwênerkirin.

Benda yekem ji "Peymana Milî" dide binivîsandin, ku perçeyên Imperetoriya osmanî, yê li herdu aliyên xêza nîşankirî de di Lihevhatina Modros de di mêjûwa 30 çirîya pêşî de si sala 1918 de hatine bicihkirin û yê bi pîrbûna xwe ve ji bal Turkan û Musulmanan de têtin biwarkirin, ewên ligelhev bi pêwendiyên Oldarî û Ferhengî ve têtin bigirêdan û bi xwedan yek armanc ve, di "yekitîyeke bi carekê ve didin bipêkanîn, ku ew bi her mehneyekê jî ve çî rast bejî yanjî çî mafeyî be jî hîç jî hev nayêtin biperçekirin"¹⁵.

Weha Biryariyên Kongirên Erzeromê û Sîwasê, herwehajî bîr û bawerîyên bingeşîyên "Peymana Milî"

¹⁵I. Z. Karal. Mêjuwa komara Turkî (1918-1960) Istanbul, 1963, R. 52.

didin biderxistin, ku Kemaliyan hîç bi mafeyên Milî ve ji bona Kurdan nehatine bipêrûniştin.

Lêbelê wan her û her ji bona bi karanîna Zemîndarên Kurdan ji bona armancên xwe ve di bin perda "Yekitîya Ayînî û Netewî " de dihatin bipêrabûn. Li ser ronahiya vêna de tiştêkî nuh nehate bikirin, ku Mafeyên .Milîyî Kurd ji bona çûna bi rêxistina xwe ve li ser xebatê de mêjûwa wê ber bi dema "Turkiya Genc" ve tête bivedgerandin, bêtî ku ew hîç tiştêkî ji Kemaliyan bidin bipêşbînîkirin.

Weha rewş û zînet jiber du hoyan dihatin binokirin:

Yekem.

Kemaliyan dest bi
girtina Rêberiyên
Kurdayetîyê ve li Istenbolê
de datin bikirin, da ku ew
Serekên tevgera Kurd bidin
biberbadbikin.

Duwem.

Ji aliyê din de
Dewletên Impiryalî, yên ku
"Şûreşgêriya" Kemalî cerg li
wan de date bilerizandin, ji
bona bi gijanîna hemû hêzên
bi tirsûyî ve li ser wan de û
di nava wan jî de tevgera
Kurdî jî wan jêre didate
bikeftileftkirin.

27 Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Weha raperîna Melatya di havîna sala 1919 de yekemîn livandina Kurdîyî ji dil de di vê pêla hanê de ew tête bijimartin.

Weha ji bona likarxistina vê raperînê hin ji Endamên "Komela Veşandina Kurdistanê" û herwehaji Serwanê Ingilîzî Noël têde hatin bibeşdarîkirin.

Weha di vî batê hanê de Raportê, ku ew ji bal Bahozvanê Ingilîzî de di sala 1919 de ji bona Wîzareta derveyî Biritanî hatîye birêkirin, serenc dide bikişandin:

"...Ez ligel Abdul-Qadir û hinên din mîna wî de hatim biaxivtin. Min çûna wî ji bona Kurdistanê û ji bona bi karanîna desthilatiya wî ve li wir de li ser de date bipêşkeşkirin. Weha ji bona bi kêrkirina li ser wan de bêtir ji pêncî carî, ez neçarbûm, bidim bivegerandin, ku yê me dixwazin Turkan bidin bixapandin. Tevlivêjî wehaji bi Kurdan ve nabe bête bikirin, ku bi wan jî ve pir bête bibawerîkirin.

Armanca Dewleta Şahîtiya Bilind bi xwe ve lawazkirina Turkan li gora karinê de bi xwe ve tête biderkevtin. Rakirina kurdan ji bona serxwe bi van kirinên hanê ve bi pîlanekî xerab nayête biderkevtin".

Lêbelê di raporteke din de di wê salê de bi xwe ve ew dibêje:

"Hêjî Kurd di rûwê Mustafa Kemal de bi serxwe ve nehatine birabûn, lê Noël hêvîdare, ku ew dê di vir de bête biserkevtin ..."¹⁶.

¹⁶E. Ulubelen. Ingiliz gizli belgeleruy Turkuye Istanbul, 1967, .202 (1, 2)

Di havîna sala 1919 de Serwan Noël bi Meletya ve hate bigihaştin. Wênerên Malbatiya Bedirxaniyan Kamîran Alî Beg û Celadet Beg, pêrejî Cemîl' Paşe Zade, Akrem Beg (Ji Diyabekir) û ligel 15 Suwarên Kurdan de lê dane bipêşewazîkirin.

Li gora birûska şefrekirî de, ya ku ew ji bal Serleşkerê pêncem de di mêjûwa 6 kewçîrînk de di sala 1919 de di bin jimara 529 de, ya ku ew ji bona Serleşkerê sêhem Kazim Qere Bekir Paşa hatîye birêkirin, Noël gotîye, ku ew ji bal Dewleta Sultan ji bona lêkolîna li rastê de ya endazîya serjimara xelkên Turk, Kurd û Ermenîyan hatîye bidesthilatkirin¹⁷.

Weha rastîya dîtina wîyî xweser ji bal Walîyê Meletya Xelîl Rehim Beg¹⁸, Gewreyê Malbata Bedirxaniyan, yê ku ew di piştî jî de li ser Kurdistan de bi Serdar ve hate bidazanîn, hîç gûmanekê di rastîya armancên hatina wîna de ji bona Meletya nade bihiştin.

Herwehaji di vê demê bi xwe jî ve Walîyê El-Ezîzê (Xerpûtê) Alî Xalib Beg¹⁹ bi mehna xwestina li dû girtina Rêbiran de, yê ku ew nardinên Berîdî didin bitalankirin, ew jî ji bona Meletyê hat.

¹⁷Kanîya pêşî, R. 202

¹⁸"Cerîde" R. 303, sala 1965.

¹⁹Li ser di: F. S. Aşkon. Kongirê Sîwasê, R. 30 - 34. 20. "cerîde" 3. 3. 1925 biner

Bi ser van jî ve Xelîl Rehim Beg Wênerên ji pir Eşîrên Kurdan ji bona Meletyê datin bibangkirin. Hemû kar û bar bi carekê ve didan binîşankirin, ku amadekirina raperînekê dijî Turkan dihate bilikarxistin.

Herwehaji pêrejî di vê dema hanê de bi xwe jî ve Kongirê Gewreyên Kurdan li bajarê Şêro de (nêzîka 20 km dûr ji Meletyê) hate bigirtin, ku têde Serdarê Kurdistanîyî hatî dihete bidazanîn, Xelîl Rehim Beg bi navê Civata Liberxwedana mafeyên Kurdan ve bi xwendina girîngtirîn bawerîyên bingehên Kurdistana Serbixwe date bidestpêkirin, yên jî ji bona hin ji Gewreyên kurdan nala bangekê hate birêkirin.

Weha di vê banga hanê de tê:

"Kurdên li ser encamên zordariyê de ji bal Karmendên Turkan de li kurdistanê de bi jîyana jêrdestiyê ve hatine bibedbextkirin, bi hatina demjimara rizgarkirina Milî ve bi berztirîn xêrpêhatin ve ew pê didin bida.

Xelkên Kurdistanê nema ji îro û pêve bendên koletiyê didin binaskirin".

"Qanûnên Turkî, yên ku ew tanî niha ji bona tawanbariyê û zordariyê dihatin bikaranîn, ew nema di tara Erdê Milî de têtin bikaranîn.

Kongirê, yê ku ew girawkirina xweşîya Gelê Kurd dide biarmanckirin, di rêya pêşvexistina wîyî abûrî, civakî û remanî de dê di pêşîya pêşî de bi wan pêrabûnan ve ew bête birabûn, yên ku ew bi cihanîna van armancan ve pê rê didin bidan.

Weha di nêzîk de dê ji bona Civateke Destûrî li gora dema nuh de bête bibangkirin, ya ku ew di mêjûwa kurdistanê de dide bidestpêkirin.

Weha tanî wê dema hanê bi van biryarên hanê divê bête birêberkirin:

A. Dadgeh dikarin bi kar û barên xwe ve tanî hin demeke din bi rengê nihayî ve pêtin bipêrabûn.

B. Polis, Cendirme û Leşker ji bona fermana bin destên min têtin bikevtin.

C. Tevaya çek, teqemeniyên cengînî, cil û bergên leşkerî, yê ku Dewletê ew ji bona hêzên leşkerî dabûn birêkirin, da ew pê xebata li kurdistanê bidin bitemirandin, tevde bi carekê ve ji bona ber destên min têtin bikevtin.

D. Lêbuhurandina giştî dê bête bidazanîn.

E Zû xweser wêneyên Tel-et, Anwer û Cemal û her wehajî wêneyên Sultan jî, yên ku ew li avaniyên giştî de û di dibustanan de hatine bihildan, bidin biavêtin.

F. Divê dibustan bêtin bigirtin, tanî ku Mamostên kurd bi fêrkirinê ve bêtin birabûn²⁰.

²⁰"cerîde" 3. 3. 1925 biner

31 Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Mustefa kemal bi karxistina raperînê ve ji destpêkirina gelawêja sala 1919 de agehdar bû. Wî Serleşkerê orduwa sêzdehan li Diyarbêkrê de bi çavdêrîkirina Serokên Kurdên ji Istenbolê û Meletiyê hatî ve date biagehdarkirin û herwehaji ku ew wan di dema gihştina wan de bi bê dengî ve bide bigirtin.

Lêbelê Rêberên Desthiltiya Cihî ev mêrxasiya hanê di xwe de nedane bididîtin. Jiber vê yekê jî bi fermana Mustefa kemal ve di 9 kewçîrînkê sala 1919 de Sertîpê Tîpa Panzdehan (Parêzgêra El-Ezîzê) Ilyas Beg ligel 52 Serbazên Suwarên wilaxan ligel du metilyozan berên xwe bi Meletiyê ve dane bivekirin. Herwehaji di wê rojê de bi xwe jî ve gurdan ji çekdarên suwar ji El-Ezîzê, gurdanek suwarî ji Siwêrek, bi serdejî jimarek ji Evseran ve bi Otombilan ve ji Sîwasê berên xwe bi ber Meletiyê ve danbe bivekirin.

Di dema pêhesandina Rêberên kurd de bi nêzîkbûna hêzên Turkî ve ew ji bona Kiyaxta revîyan û weha wan xwe ji bona destpêkirinê dane bilikardixistin.

Weha jî ji bona vî hoyî bi xwe jî ve wan pêwendî ligel Wênerê "Intelîcens Servis" Serheng Bîl de li Helebê de dane bikin²¹, yê ku wî nav di Kurdan de ji bona raperîna wan beramberî Turkan dida bidan²².

Bi pîrbûna gûmanê ve Kemal li ser kar û bar de bi başî ve agehdar bû. Weha bi hîç awayekî ve bi lihevhatinekê ve

²¹Li: Du Bois. Connaissance des Kurdes. Beyrouth 1965, R. 147 biner

²²Li: B. Nikitin. Kurd. Mosko. 1964, R. 292 biner

nayête biderkevtin, ku girtina Rêberên Kurdan di destpêkirina gelawêj de "bi bê dengî ve" bête bixwestin.

Herwehaji di 10 kewçîrînkê de bi gerandina li dû wan û girtina wan de hatîye biferamankirin. Herwehaji di wê demê de bi xwe jî ve, bi "wergirtina pêrabûnan ji bona bê parkirina tevgera cihêbûnê ji her yarmetiyekê, danîna Fermanîdarê cendîrme Tewfîq Paşa bi Walîyê Meletyê ve, herwehaji danîna Welatperwerekî Turkî di Cihê Walîyê El-Ezîzê de hate biferamankirin. Ji bona birîna rê ji her livandinekê dij beramberî bi Welêt û Milet ve divê tevaya hêzên Dewletê li Meletya û Al-Ezîzan de di bin Rêberiya wî de bêtin bidanîn, pêrejî divê agehdarî bi her derê ve bête bigihaştin, ku her yekî tev li Revîyan bête bikirin, dê ew bi tundî ve bête tawanbarkirin... Jiber dibe, ku em dê duçarî Şeran beramberî hêzên biyanî bêtin bikirin, yê hebûna meyî Milî bi ber tirsê ve didin bixistin, divê raport li ser amadekirin û pêrabûnên wergirtinên cewherî de di vî babetî de ji min re bêtin bipêşkeşkin"²³.

Tevî li serbûna van amojgarîyan de hêzên yekaneyî leşkerî hêjî bi dudilî û bê bawermendî ve dihatin bimayîn. Weha Ilyas Beg di 11 kewçîrînkê de dide biragiyandin, ku Peyamberê ji bal Walî hatîye birêkirin, ew dide bizanîn ku "Walî Xalîb Beg û Waliyên din ji cihên xwe bi mercên diyar ve ji bona vegerandinê bi amade ve têtin biderkevtin. Ez bi agehdarkirina me ve hêvîdarim, ma gelo 'berjewendiya Welêt pêşkeşkirina van daxwazan dide bidaxwazkikirin yanî na"?

²³K. Atatürk. (Nutuk), Bergê yekem, R. 122 (1925-1926).

Serekên yekaneyên leşkerî ji tirsê wan xwe li karên jêhatî de nedidan bidan, lêbelê wan Rêberên Kurdan bi guhpêdan ve çavdêrî li wan de didan bikin. Weha di êvara 11 kewçîrînkê de Ilyas Beg bi navê xwe ve û herwehaji bi navê yekaneyên dinî Leşker ve li Meletya de date birêkirin, ku ew têde dibêje, Kurd xwe li Raga de (nêzîka pênc demjimaran bi piyan ji Meletyê ve têde bidûrkin) bi serhev ve didin bidan, herwehaji Walî Xelîl Rehîm Beg û Hevalbendên wî li virin, di çaxa Eşîrên dorhêlê (tanî sînore Siwêrek) herwehaji pêrejî Eşîrên Dêrsimê ji bona hatina wê derê ji bona pirsîyariya kurdî tevde xwe didin bikarkirin²⁴.

Û ji bona nehiştina tevlebûna Kurdên Dêrsimê ligel Şûreşvanên Meletya de Kemal ji bona Walîyê Sîwasê Reşîd Paşa fermanek date biderkin, ku ew wan Rêberên kurdan ji bona layê wî bîne bikin, yên ku ew bi ragiyandinê ve ji bona berjewendiya Dewleteke Kurdî têtin birabûn. Kesekî bi vê fermana Mustefa Kemal ve ji bil Alî Şan Beg (Wênerê Kurdên Koçer, Fermandarê Qayimqamiya Omeriya) pêve neda bikin.

Weha ev dîdarîya hanê di kewçîrînkê sala 1919 de li Sîwasê de hate bipêkhatin, ku têde Kemal ji Alî Şan Beg date bixwestin, ku ew jêre raporteke li ser jêhatibûnên Endamên "Komela Vejandina Kurdistanê" bide bipêşkeşkin. Weha Alî Şan Beg bersiva kemal date bivegerandin, ku li gora bîr û baweriyên Wêlson Serekê Dewletên Yekgirtiyên Amerîka de Wilayetên Rojhilat bi perçeyekî ji Ermenistanê ve didin bidan û weha mafeyên

²⁴K. Ataturk.(Nutuk), Bergê yekem, R. 133-134 (1925-1926)

Kurdan di serguhan re têtin biavêtin. Jiber vê yeka hanê jî Kurd ji bona pêkanîna Kurdistan Xwedan Ewtonomî di Wilayetê Rojhilat de, yên ku di wan de kurd pîrbûnekê didin bipêkanîn, di bin çavdêriya Sultanê Turkî de jê re didin bixebatkirin.

Lêbelê Kemal di bersiva xwe de date bizanîn, ku bîr û baweriyên Wêlson bi hîç piştgirtinekê ve nayêtin bihêzkerin û ew li ser Rêberên Kurdan de dide bipêşneyarkirin, ku ew ligel wî de nala Wênerên Dêrsimê de hevkarîyê bide bikin. Di dawîya dawî de M. Kemal bîr û bawerîya xwe dide bidaxuyanîkirin, ku ew bi bawer ve tete biderkevtin, ku dê Rêberên Kurdan bi carekê ve pîlanên ne Neştîmanîyên Dewleta Ferîd Paşa nedin bigirtin û jiber tevaya Wênerên Kurdan li Kongirê Erzeromê de ji bona wî bi piştgirtinê ve dane bisozdan, weha ji bona vê yekê jî ew wênerîya wan di Wilayetên Rojhilat de bi xwe ve dide bikin²⁵.

Weha armanca Kemal ji bona dan û sitandinê ligel Hinekan ji Rêberên kurdan de, da ku ew ji ketina nava Kurdên Meletyê bêlkî xwe bidin bidûrkirin, herwehaji pêrejî di hem katî jî de wî yekaneyên leşkerî Turkî ji bona nabûdkirina tevgera wan dabu seranserîkirin. Weha jiber negirtina piştgirtinê ji Eşîrên dorhêla xwe ew kurdên civandî, yên ku xwe ji bona hêrîşê hatibûn bilikarxistin, ji hev hatin bibelavkirin û Alî Xalêb ji bona Orfa hate birevyan û di pişt re ew ji bona Helebê hate biçûyîn. Herwehaji Serwanê Ingilîzî Noël di rêya Elbustan re hate bidûrkirin.

²⁵M. N. Dersim. Kurdistan Tarihinde Dersim. R. 122-123.

Bi windakirina Rêberan û bi nemana piştigirtina Ingilîzî ji bona Beşdarên raperînê ew bi Semtên cuda ve dihatin bipengandin.

Weha ketina yekemîn serhildana Kurdan beramberî Kemaliyan nade biderxistin, ku kemaliyan tevgera Kurdan dane biberbadkirin.

Weha li ser wê ronahiya bûyînên li jor hatî de li ser nayînkirina Hêvîyên Milîyî Kurdî de ne pir çetine liberketina neçarbûna berzbûna tevgera Kurdî bête biliberketin, herwehaji pêrejî li gora derketina cewhera siyaseta şovîniyî Kemalîyan xebata tevgera Kurdan bi geş û gûr ve dihate bikirin. Herwehaji bi her awayekî jî ve tevgera Kurd di wê qonax hanê de bi xurtbûneke pîgirtî ve tanî pileyekî weha berz xwe dida bipêşkeşkirin, ku ji bona xwe pêrûniştina Dewletî date biwergirtin.

Mebest di vê pêrûniştina hanê de bi mafeyên Milîyî Kurd ve ew pêrûniştinên hanê têtin biderkevtin, yên ku ew ji bal Peymana Sêver de hatibûn bidanîn. Wehaji tevî ku ew Bendên wê Peymanê ne hatin bicihanîn, lêbelê jî ew bi xwe jî ve ji bona nîşankirina siyaseta Dewletên Rojava di Rojhilata Navîn de, herwehaji pêrejî ew ji bona nîşankirina cih û berzbûna tevgera Rizgarîyî Kurd pir bi giring ve dihatin biderkevtin, ya ku ew bi carekê ve nema di serguhan re dikarîbû bihata biavêtin.

Weke ku diyare, Peymana Sêver di benda xweyî 62 de di heremên bi pîrbûn ve kurdin, di nava tara Turkiyê de û li ser destên Wênerên Ingilîzî, Firensî û Italî de li gora pilaneke danîyî ji bona pêkhatina Ewtonomî dide binivîsandin.

Lêbelê benda 63 li ser Turkiyê de bicihanîna Ewtonomî di nava sê mehan de li gora pilana, ya ku ew ji wê re ji bal Komitîyê de tête bipêşkeşkirin, divabû wê ew bîne bicihanîn.

Herwehaji di dawîya dawî de benda 64, ya ku ew dide binivîsandin, ku Kurd dikarin ji bona Civata Hevgirêdana Netewan daxwaza Serxwebûnê ji Turkiyê bidin bipêşkeşkirin.

Weha Civatê dikarîbû li ser vê daxwaza hanê de pê bête birûniştin, ya ku Turkiyê bi pêrûniştina wê ve di pişt re di hate bineçarkirin, ku ev jî divabû li ser de Peymaneke taybetî de di nava Turkiyê û Dewletên Hevalbendên bingehî de bihata bikirin.

Movika dawî ji vê benda hanê Musil dide bigirtin, ku tede weha hatîye binivîsandin: Di dema daketina Turkîyê de ji heremên Kurdî de Dewletên Hevalbendên bingehî hîç li ber tevlihevbûna bi azadiya xwe ve ji bal Kurdên Neşînvana de di perçeyên Kurdistan de, yên ku ew di nava Wilayeta Musil de têtin bikevtin, ji bona vê Dewleta Kurdîyî Serbixwe rê li ber wan de nadin bigirtin²⁶.

Weke diyar dibe, Peymana Sêver ji bona pêkhatina Kurdistaneke Xwedan Ewtonomî di nava çarcuwê Turkiyê de di pêşî de, lige guhestina wê de ji bona Kurdistaneke Serbixwe piştî derbasbûna salekê jê pê hatîye birûniştin.

²⁶"Paymana Sêverêyî lihevhatinê û bawernameyên li Lozanê Morkirî de" Mosko R. 24-25.

Herwehaji pêrejî tevlêbûna Kurdên herema Musilê ji ligel wê de di pişt re ji hatibû bidanîn.

Jibervêjî di babetî giringbûna Peymana Sêver de ji bona kurdan B. Nîkîtin daye binivîsandin: "Tevî ku peymana Sêver bes û bi tenha ve reş li ser sipî de mabû bihiştin, lêbelêjî wê pêçbûneke pir giring di pêşvexistina pirsîyarîya kurdî de date biderxistin.

Di cara pêşî de di mêjuwê de pirsîyarîya kurdî, (Ewtonomiya Cihî ji bona Melbendên bi pîrbûna Neşînvânên xwe ve Kurdin), di Belgeyekî Diplomasî de ji bona çarekirinê tête bipêşkeşkirin. Weha ji wê bêhnê û pêve nema giringbûna Dewlî ji bona pirsîyarîya Kurdî lê tête bigûmankirin"²⁷.

Evaya bi carekê ve beramber bi Peymana Sêver bi gistî ve, yanî "Ramyarîya Kurdî" ji bal Dewletên Impîryalî de bi regekî taybetî ve ligel Serûştiya Impîryalîyê de ne dihatin bidîjkin. Jiber mebest ne ew bû, ku wan dixwest Serxwebûna Kurdan bi wan ve bidin bidan, lêbelêjî wan her û her ji bona bikaranîna Hêvîyên Kurdan yên Milî ji bona berjewendiyên xweyî zodariyê didan bikaranîn. Evaya nemaze ji rewşa Ingilîzan tête bixuyanîkirin, gava ku wan Kurdistana Jêrî (Îraqîyî niha) bi bin destên xwe ve dane bixistin, tevgera Kurd li wê derê de dane berbadkirin û herwehaji pêrejî hîç bi mafeyên Kurdan ve li Îraqê de ji bona Serxwebûnê pê nehatin birûniştin.

²⁷B. Nikitin. Kurd. Mosko. 1964, R 292.

Lêbelê di wê çaxê bi xwe jî ve wan "Piştgirtina" tevgera Kurdî li Turkiyê de didan bigirtin. Weha bi vê rêya hanê ve wan li ser Kemalîyan de bêtir didan bigivaştin, da ku ew daketinên din ji wan re bidin bikirin.

Weha li vê derê de seyr têde niye, ku her gava Kemalî ber bi rast ve ji bona mêldarîya Impiryalîyan bêtir dihatin bilivandin, weha deha bi leztir ve beramber wan berjewendiya Milîya Kurd û Peymana Sêver didan "bijibîrkin".

Jibervîjî bi xwe jî ve Peymana Sêver hate bijibîrkin, gava ku Turk ji bona Ingilîzan di Peymana Lozanê de ji Wilayeta Musil hatin bidakevtin û bipêrûniştin. Weha di dawîya dawî de berjewendiyên Ingilîzî û Monopolên Neftiyên din hatin bicihanîn.

Tevlivêjî Sîxurên Impiryalî di destdirêjîya xwe de di nava pirsîyarîya Kurd de û di tevgera Kurdîyî Milî de di pişt re nehatin birawestandin.

Li vê derê de divê li ser me de herdu mercên pirsîyarîya kurd:

Yê li rastê û yê xweyî de bidin binîşankirin.

Alîyê vî mercê li rastê de di nîşana tevgera Kurdîyî Milî de gûrbûna wê jiber siyaseta şovîniyî Kevneperestîya Turkan tete biwênerkin.

Alîyê din ji vî mercê xweyî di karkirinên Sîxurên Impiryalîyê de ji bona bikaranîna vê tevgerê ji bona

mebestên xwe ve têtê bidîtin²⁸.

Tev li vê tevlihevbûna van herdu Aliyan jî de di rastîya rastî de, di dawîya dawî de bingeha pirsîyarîya Kurdî li Turkiyê de xebata Neteweyekî zorlêkirî ji bona Serxwebûna xwe dide bipêkanîn.

Vê xebata hanê di destpêkirina pêla "Turkiya Genc" de date bidestpêkirin û tanî dema Kemalîyê li Turkiyê de beramber bi siyaseta Desteyên desthilat ve date bidirêjkin, yên ku wan berjewendiyên Milîyî kurdî didan binayînîkirin û her û her yên ji bona Hilandina kurdan û yaxud ji bona berbadkirina wan didan bikeftileftkin.

Li vê derê jî de seyr niye, ku ne bes tenê Cemawerên Cotkarên Kurd tev li tevgera Dijbûyî de beramberî Turkan bêtin bikin, herwehaji pêrejî Endamên Suwarên Nerêxistîyî Kurdên "Hemêdî" jî, yên ku ew tanî demeke nêzîk jî pir ji bona Rêstikê û Sultan jî bi dilsoz ve dihatin bidîtin, tev li wê tevgerê de hatin bikin.

Eşkere ye, ku hêzên "Hemêdî" di dawîya sedsalên nozdehan de li ser destên Abdul-Hemîd de ji bal Zemîndarên Kurdan hatin bidurustkin. Ew bi xwe ve nala suwarkirineke leşkerîyî Eşîrîyî ji ber xwe dihate biliberketin.

Mebesta Dewleta Turkî ji pêkanîna Suwarên "Hemêdî" ji bona bikaranîna wan dijî tevgera Milîyî Ermenîyan û herwehaji ji bona beramberkirina wan dijî Rusan dihate

²⁸Li: C. B. Akobov. Derbarê hevgirtina Milîyî kurd li Îranê de. Mosko 1952 R. 18.

bidîtin. Pêrejî di him katî jî de pêkanîna wan Suwaran xistina Zemîndarên Kurd ber bi çavdêrîya xwe ve û bi bê beşkirina tevgera Kurdî ji van hêzên likarxistî de Dewleta Turkî ji xwe re dida biarmancdikirin.

Weha Dewleta Turkî armanca xweyî yekem date bicihanîn -jiber Taqimek ji Zemîndarên Kurdan bi xwe ve nemaze di Pêla Serbirîna Ermenîyan de bi rêxistî ve li ser destên "Turîkîya Genc" de di sala 1915 de hatin biderkevtin.

Lêbelê beramberî herdu armancên din weha pir ji Yekaneyên û Pêkhatiyên "Hemîdî", yên ku wan herifandina Imperetoriya Osmanî didatin bidîtin, di dema Cenga Cîhanî Yekem de xwe bi aliyên hêzên Rusî ve didan biveguhestin û pir caran jî wan berên çekên xwe ber bi Dewleta Osmanî ve didan bizîvirandin. Weha ew ji bona tevgera Kurd bi kêreke jîndarîkirî ve hate biderkevtin.

Tevî li cewhera Derebegîyî-Kevneperestîya Destgeha "Hemîdî" de Kemalî bi hîlanîna wê ve nehatin biranbûn; bi hêvîya ku ew Kurdan ji bona berjewendiyên xweyî talanîyê ve bidin bikaranîn.

Civandina serekîyî van hêzên "Hemîdî" li ser "Anîya Rojhilat" de di bin Rêberîya Kazim Qere Bekir Paşa de dihate bikomkirin, yê ku wî bi karanîna wan ve di Cenga Talanyê de dijî Ermenîyan dida bikaranîn. Herwehaji dijî Miletên Pişt Qefasya û herwehaji pêrejî "Bendkirina" Kurdan bi xwe ve wî date bidazanîn.

Lêbelê di bin rewş û zînetên nuh de wî nikarîbû armancên xwe bide bicihanîn. Gurdanên "Hemîdîyî", yên ku ew ji bal Turkan de hatibûn bixapandin, fermanên Turkan

didatin bicihtanîn, pir caran wan rabûnên xwe beramber bi Turkan ve dane bidazanîn.

Tîpa di bin Rêberîya Xalid Begê Cibrî de di vê pêla hanê de nemaze roleke pir jêhatî date bilistin. Xalid Begê Cibrî ji Malbateke Derebegîyî Kurdiyî mezin bû, yê ku wî xwendina xwe di dibustana Eşîrî de li Istenbolê de anîbû bidawîkirin. Ew di nava Suwarkirina Rêberîya "Hemîdî" de bi zanebûn û jîrbûneke Cengînî dihate binîşankirin. Jibervêjî hêjî ew Xort bû, lêbelê wî nîşana Serhengîyê dabû biwergirtin.

Di pêşîya pêşî de wîna Gurdanek dida birêberîkirin û di pişt re Orduwek ji hêzên "Hemîdî" date birêberîkirin. Di binkêra herifandina Imperetoriya Osmanî de, şiyarkirina tevgera kurdî de û ligel peyvê de li ser "piştgirtina" wê de ji bal Dewletên Rojava de Xalid Beg bêtir bi pêwistiya tevlehevbûna wî ve ligel vê tevgera hanê de û alîkarîya wê de bi bawermendtir ve dihate biderkevtin.

Weha di sala 1920 de Xalid Beg û Evserên mayî ji Tîpa wî dest bi ragiyandineke pir xurt ve ji bona remana Serxwebûna Kurdistanê dane bikin. Wisa ligel Şêx û Axayê Eşîrên di nava Farto de, li Karliyova, li Melazgirt, li Polani û li Xînes de ji bona xebatê dijî Bîryarên Kongirên Erzeromê û yê Siwasê de û herwehaji pêrejî dijî benda têde hatî di "Peyman Milî" de, ya ku ew bi perçîmkirina Kurdistana Turkîyê bi Gewdêyê Tirkîyê ve dide bigotin, divê bête bikin, wan gift û go ligel wan tevan de dane bikin²⁹.

²⁹M. S Firat. Dogu illeri ve varto Tarihi. Ankara 1961, R. 117-118.

Weha ew di wê bîr û bawerîyê de bûn, ku dem ji bona Rizgarkirinê ji bin Serdarîya Turkîyê hatîye bisitewandin, ya ku wê Gelê Kurd bi sedan sal ve di tarîya tarîyê de û di nezaniyê de daye bihiştin û herwehajî pêrejî wê ew ji biçûktirîn mafe bê pişk û par dane bikin.

Ligel van jî de wan date bidestpêkirin û ew hatin biliberketin, ku ew di vê pêla hanê de di rêya raperînek Çekdarî de, ligel berzkirina endazê şiyarbûna Milî de û mil bi mil ve ligel ragiyandinê de ji bona remana xebata rizgarkirinê dê bikaribin mafeyên xwe bidin biwergirtin.

Weha jibervêjî Rêberên Kurdan dest bi çekkirina Eşîrên Hevalbendên xwe dane bikin, pêrejî wan Kurd bi berkirina cil û bergên Milî û bi xwendin û nivîsandina Kurdî ve dane biamojgarîkirin.

Herwehajî ligel jî de Nivîsandinên Gewreyên Siyasiyên kurd de nala Xalid Begê Cibrî bi xwe ve, herwehajî yê Mele Ahmedê Cezîrî, Ahmedê Xanî û yên din dane bibelavkirin.

Di havîna sala 1920 de Xalid Begê Cibrî ligel hêrdû Endamên Komela "Vejiandina Kurdistanê" de li Istenbolê de, ligel Abdul-Qadir û Abdul-Rehmanê Hekarê de dane bipêwendîkirin. Û ew di rêy wan re ligel Endamê Civata Netewê Bilindî Turkî Yusif Diya û Hevalbendên wî de bi hev ve hatin bigihaştin, ku ew dê di rêya Girêdana Netewan re xebatê ji bona wergirtina Serxwebûna Kurdistanê bidin bikin. Herwehajî pêrejî Xalid Beg bi civandina birêxistinên Zemîndarên kurd, Şêx û Keyên gundên Melbendên Farto, Polanik, Malgirt, Xinês, karliyov, Solxan û Çapaqçur ve ji bona daxwaza wan ji Hevgirêdana Netewan li ser dana

43 Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Serxwebûna Kurdistanê de date bidestpêkirin.

Weha ev birêxistinên hanê di rêya "Komela Vejdîna Kurdistanê" de ji bona Mustafa Nemrud û Şerif Paşa hate rêkirin, ku wan jî ji bona Hevgirêdana Netewan dane bipêşkeşkirin.

Weha jêhatbûna Xalid Begê Cibrî nema veşartî ma bû. Jibervêjî ew ji bona Erzeromê di mêjûwa 19 gelawêja sala 1920 de hate bibangkirin û ew li wê derê de nala Wênerê Komitiya Hejmêr di Dadgeha Leşkerî Bilindî Orduwê de hate binîşankirin, bi armanca dûrkirina wî ji tevgera Kurdî bête bikirin.

Lêbelê vê Şûnkariya Karmendiya Mîrî perdeyeke pir lihevhatî ji bona karên wîyî veşartî lihev didate bianîn. Di sala 1921 de (li gora kaniyên din di sala 1922 de) Xalid Beg Komitiyek veşartî li Erzeromê de date bipêkanîn. Herwehaji wî hevkarî ligel "Komela Vejdîna Kurdistanê" û Yusif Diya de, yê ku ew ji Civatê jiber karên wîyî Beramber hatibû bidûrkirin, date bixurtkirin. Herwehaji ligel jî de her û her Xalid Beg bi ragiyandinê ve ji bona Serxwebûnê dihate biradibûn. Weha wî hevalbendîya nêzîka 80 % ji Kurdên wan Hindamên jorî ji xwe re didate biwergirt û wî ew di rêya Rêberên wan de bi rêxistin ve û bi çekkirina wan ve dihate birabûn³⁰.

Di wê dema ku Komitiya Erzeromê de di bin Rêberîya Xalid Beg de pîlanê raperîneke çekdarî li Melbendên

³⁰"Istanbul", 10. 3. 1925.

Kurdîyî Rojhilatî Dêrsim de didate bilikardixistin, wehajî Endamên "Komela Vejandina Kurdistanê" berê ligel Rêberên din ji Kurdan de serhildanek li dijî Turkan de di hindama Dêrsim-Koçgerî de dabû bilidardixistin.

Divê bête bigotin, ku helbijartina Kurdan ji bona vê heremê ne ji ber xwe ve hatibû bidîtin. Jiber Kurdên Dêrsimê, weke M. B. Fironze daye binîşankirin, bi rêça Alewî ve didin bibawerîkirin û bi cudabûna Kurdê "Bawermendên" din ve bi Qizilbaşî ve têtin binavkirin, ku weha "Musulmanên Bawermend bi çavekî sivik ve li wan de didatin binêrin; jiber ewan di Oldarîya wan de ji bil agehdariyên Efsaneyî poşandî de bêtir nedihatîn biliberkevtin. Weha bi giştî ve tanî demeke nêzîk ew hatibûn biguhpênedan...". Hêjî yê jor dibêje "Kurdên Qezilbaşên Eşaêr wan bi xwe ve hîç carekê jî ji caran Serbazî nedane bikin û her û her ji bal dîtina Dewleta Turkî de nala kêmtirîn Kesên Enedoliyî bawerpêkirî dihatin bidîtin.

Herwehajî hêjî rewşa wanî niha jî wisaye. Ne bes tenê ew bi rabûna karê Serbazkirinê ve di Leşkerîyê de nayêtin birabûn, herwehajî lêbelê ji bona Dewletê bi zincîrekê ve ji raperînan ji nişkê ve bi pir serêşîyê ve didin biçêkirin..."³¹

Van rewşên hanê dane bihiştin, ku Dêrsim nala Nawendîya tevgera Kurdî bête bihelbijartin.

Di destpêka sala 1920 de civîneke Wênerên Kurdan di Serbazxana Hisên Abdula de ji Navçeya Belîce (Melbenda Kanvalê) de hate bigirtin û di kar û barê vê civînê de

³¹M. F. Fironzi. Gerek ji bona Anqera. Karên Helbijartî. Bergê yekem, Mosko - lëningirad R. 300

45 Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de

Serekên Eşêrên Canbegiyan, korminşah û yên din dane bibeşdarîkirin. Amadevanan bi carêkê ve ji bona destpêkirina xebata çekdarî ji bona Avakirina Kurdistana Serbixwe bi hev re dane bisundxwarin, ya ku ji Wilayetên Diyarbekir, Wan, Bedlîs, El-Ezîz, Dêrsim-Koçgerî tete bipêkhatin.

Weha li gora biryarîya vê civînê de Kurdan bi civandina çekan ve dane bidestpêkirin.

Nûçe ji bona Nawendîya tevgerê dihatin bigihaştin, ku hêzên Kurdîyî pir baş bi rêxistî ve li Rojavayî Dêrsim de bi jimareke 45 hezar Peyan ji bona alîkarîya Kurdên Rojhilatî Dêrsimê ji bona destpêkirinê hatine biamadekirin, herwehaji Şaxekî "Komela Vejdandina kurdistan" li El-Ezîzê de hatîye bipêkhatin û tevgera Milîyî Kurdî li tevaya hêlên Kurdistanê de bi serketin ve tete bibelavkirin³².

Di çirîya paşîyî sala 1920 de civînek li Xozat (Nawendîya Dêrsim) de di navbera Rêberên Kurdên Dêrsim û Çîmîşkizk de hate bikirin, ku di vê civîna hanê de yekkirina tevaya kar û baran ji bona sitendina mafeyên Milî hate bibiryarkirin. Weha li ser vê biryarîya hanê de bîrwerîyek ji bona Dewleta Anqera di mêjûwa 15 çirîya paşî de hate birêkirin, ku tede cewhera dîtina Dewleta Anqera li ser Serpereştîya Ewtonomî ji bona Kurdistan bersiva wêyî xweser ji bona Dêrsimyan dide bidaxwazkirin, herwehaji pêrejî divê hemû Kurdên girtî di zindanên El-Ezîz, Meletya, Sîwas û Arzincan de xweser bêtin biberdan, divê tevaya Karmendên Turkan ji heremên, yên ku ew di pîrbûna xwe

³²M. N. Dersimi. kurdistan Tarihinde Dersim, R. 126.

de kurdin bêtin bikişandin û herwehaji divê hêzên Turkî ji herema koçgerê xweser bêtin bikişandin.

Bersiva li ser vê bîrxistina hanê de Dewleta Anqera Wêner ji El-Ezîzê ji bona Dêrsimê date birêkirin. Piştî ku Wêner bi dadiya daxwazên Kurdan hate birûniştin, wan ew bi ne rabûna wan ve bi raperînê ve dane biamojgarîkirin. Lêbelê Rêberên Kurdan ew Amojgarên hanê dane bivegerandin û di rêya Walîyê El-Ezîzê de di mêjûwa 25 çirîya paşiyî sala 1920 de têlîgrafek morkirî ji bal Serekên Eşîrên Rojavayî Dêrsimê de ji bona Civata Netewê Bilind de hate birêkirin, ku têde hatîye binivîsandin:

"Peymana Sêver pêkanîna Kurdistana Serbixwe dide biduçarkirin, ku ew ji Wilayetên Diyarbekir, El-Ezîz, Wan û Bedlîsê tête bipêkhatin. Jibervêjî divê ew bête bipêkhatin, heger na, dê em bi sitendina vî mafeyê hanê ve bi hêza çek ve bêtin bineçarîkirin"³³.

Dêrsimyan bersiva vê birûskê bi nivîsandin wernegirtin. Lêbelê bi armanca xapandina Kurdan û wergirtina demê Dewleta Anqerê di rêya Walîyê El-Ezîzê de Rêberên Kurdan bi pêrûniştina xwe li ser daxwazên wan de dane bagehdarkirin, herwehaji di wê demê bi xwe jî ve wê bi rabûnên cengîni dijî tevgera Kurd li herema Sîwasê de date bidestpêkirin.

Ligel vê jî de Kemaliyan ji bona rakişandina Serokên Kurdên bi nav û deng ve ji bona aliyên xwe di rêya soz û bertîlan de dane bidestpêkirin. Weha Walîyê El-Ezîzê

³³ kanîya berê, R. 127-129

daxuyaniyek bi navê Mustefa kemal ve date bibelavkirin, ku ew têde dide bizanîn, ku herdu Rêberên kurd Meco Axa û Diwab Axa ji dêlva Dêrsimê di Civata Netewê Bilindî Turkî de hatine binîşankirin, herwehaji Wênerên Kurdan ji hemû Melbendên Kurdistanê ji bona Anqera tîn û dê biryar ji bona berjewendiya Kurd bêtin biwergirtin, herwehaji pêrejî dê daxwazên Kurd bi rengekî giştî ve bêtin bicihanîn³⁴.

Piştî ku Meco Axa û Diwab Axa bi vê soza hanê hatin bibawerkirin, herdu nala Du "Wênerên Dêrsim" ji bona Anqera hatin biçûyîn, wan li wir de xwe di tepê de datin bidîtin. Da ew xwe ji wê tepê bidin birizgarîkirin, ew di nava destên desthilatîya Anqerê de ji bona givaştinê li ser tevgera rizgarîkirina kurdî de li Dêrsimê de nala destikekî dihatin bikaranîn. Bi ser van jî ve Kemalîyan jimareke din ji "Wêneran" ji dêlva Dêrsim mîna Mustefa Zekî Beg, Remzî Beg, Abdul-Heq, Tewfîq Beg û Hisên Xeyrî Beg di Civata Netewîyî Bilindî Turkî de dana binîşankirin³⁵.

Tevî li siyaseta hajbûyî hinekan ji Rêberên Kurdan tevger li Dêrsimê de, ya ku ew ji bona desthilatîya Turkî di rastîyê de nehate biserberjêrkirin, ew ne hate birawestandin. desthilatîya rastî li vê derê de di destê Merovê Kurdê bi nav û deng Seyîd Rida ve dihat bidîtin, yê ku ew di cewherê de ne dijî alîkarîyê ligel Kemalîyan de dihat bidîtin, lêbelê wî bi cihanîna mafeyên kurdîyî Milî ve di nava tara Dewleta Fêderalîyê yekgirtî de dida bidaxwazîkirin.

³⁴ kanîya berê, R. 130

³⁵Dr. Tiz. Tunaya. Turkiyede Siyasi Partiler, R. 538-539.

Rewşene, ku ev daxwazên hanê ligel berjewendiyên kemalîyan de, yên ku wan perda "Dostên" kurdan bi hatina buhara sala 1921 ve ji ser ruwê xwe datin biavêtin, li hev ne dihatin bikirin.

Weha Kemalîyan ji Desteyê Milîyî Kurdî daxwaza devjêberdana liberxwedanê û berdestbûnê didane bikirin, heger na, dê ew fermanên nabûdkirina gundên Kurdan ji rehan de bidin biderkirin. Da ew Kurdan bidin bitirsandin, Serekê hêzên Turkî li heremê de Serheng Xalis hin ji Merovên kurdên bi nav û bang ve li Omeraniyê de di mêjûwa 4 avdarê de sala 1921 de datin bigirtin û di bin çavdêrîyeke nehîniyî pir de bi pêt ve ew ji bona Zaza dane birêkirin. Lêbelê gava xeber bi destyekî Kurd ve li bajarê Bazîhacî hate bigihiştin, ew di rê de ligel Pasewanîtiya Turkî de hatin biberengarîkirin û girtî dane biazadkirin, piştî ku wan Pasewanetî datin bibezaandin³⁶.

Weha vê rûdaya biçûk di rastîyê de destpêkirina rabûnên leşkerî di nava Kemalîyan û hêzên Milîyî kurd de date bidestpêkirin.

Piştî ku Kurdan Pasewanetî dane bitarûmarkirin, wan ji Serheng Xalis xweser berdestbûna gurdan bê qeyd û şert datin bidaxwazîkirin³⁷, heger na, ew bi xwe ve tevaya encamên girêdayî li ser vê de dide bihilgirtin. Serhengê Turkî ev daxwaza hanê date bivegerandin, lêbelê wî hêviya xwe ji wan re date bizanîn, ku ew rê bi gurdanê wî ve ji bona vegera wî ji bona Sîwasê pê bidin bidan. Piştî ku

³⁶ kaniya berê, R. 153-165

³⁷ A. Kemalî, Erzincan ... Erzincan. 1932, R. 156

Kurdan ji xwe re nayîn dane biwergirtin, Desteyên Mehmud Beg û Ezmet Beg dest bi dorgirtina Omraniyê ve di 6 avdara sala 1921 de datin bidestpêkirin.

Weha tevaya Xelkên vê heremê bi piştgirtina Şûreşgêran ve hatin birabûn. Piştî ku şer rojekê bi carekê ve hate bidirêjkirin, gurdanê Turkî bi berdestbûnê ve hate bineçarîkirin.

Dadgeha Leşkerîyî Kurdî, ya ku ew ji bona vê bi taybetî ve hatibû bipêkhatin, bi darvekirina Serheng Xalis date bidadkirin û di Nawendiya Omraniyê de dadkirin hate bicihanîn, herwehaji pêrejî ala Kurdistana Azad hate biberz û bibalakirin.

Di encamê bezandina gurdana Turkî de pir çek û teqemenîyên cengê, pêrejî bêtir ji hezar hesip û jimareke pir ji hêstiran bi destên Kurdan ve hatin bikevtin. Weha Komitiyeke pêkhatî bi taybetî ve ji bona vê mebestê bi dana belgeyên ne xerab ve ji bona Evser û Serbazên Dîlên Turkan dida bidan û wê ew dane biberdan. Ligel vê jî de rê bi Kurd û Çerkesên karger di gurdana Turkî de ji bona kevtina wanî nava rêzên desteyên hêzên çekdarî Kurdistanê de hate bidan.

Van rûdanên hanê dengdanekî pir dûr di dirêjî û pahnbûna Kurdistanê de li dû xwe de date bihiştin. Weha jî nala Omraniyê Kurdên Koçgerê bi ser xwe ve hatin birabûn û wan ligel desteyên Kurdên Dêrsim de, yên ku ew ji Êla Oqaçik bûn, ew di hewara wan de hatin bibeşdarîkirin, dikarîbûn herema xwe ji Turkan di 8 avdarê de bidin rizgarîkirin. Herwehaji desteyên Kurdan li Kimaxê de liberxwedana Turkan dane bitarûmarkirin û Qayimqam û

Serekê hêzên Cendirman dane bidîlkin.

Herwehaji wan pira Çertofê li ser Çemê Furatê de datin biçakkirin, Qayimqamiya Korçayê dane bivekirin, Wênerên desthilatîya Turkî dane bigirtin û ji bona bi darvekirina wan ve ew ji bona Omranîyê dane bikişandin. Di encamê van pêrabûnên leşkerî de Kurdan Qayimqamiya Kanval, koçixîsar, Dêfrêxî, Zaza, Rêfaxyê, Koroçay û Kîmaxê dane bivegirtin.

Li ser dayînên Alî Kemal de raperînê heremeke nêzîka 15 hezar Km çargoşî topraxa wê dihate biderkevtin. Wehî 15 desteyên Kurdan dijî Turkan didane bişerdikirin, ku her yek ji wan jimara Şervanên wan di navbera 100 Şervanî tanî 1500 Şervanî de dihatin biderketin. Tevaya Şervanên di hêzên Kurd de bêtir ji 6000 Şervan dihatin biderdiketin³⁸.

Piştî ku Şûreşvanên kurdan hêzeke weha ji xwe re dane biwergirtin û biserketinên weha ku bi kêmanî ve li wan de nayête binêrîn, bi destên xwe ve dane bixistin, Rêberên wan birûskek di mêjûwa 11 avdara sala 1921 de ji bona Serekê Civata Netewê Bilind li Anqera de dane birêkirin, ku ew têde daxwaza Wilayeteke Serbixwe ji van Nawendiyan didan bikirin: ku ew ji Koçgerî, Dîvrixî, Refaxiyê û Kimxa bête bipêkhatin, yên ku Kurd têde pîrbûna Xelkên wan didin bipêkanîn, herwehaji nîşankirina Kurdekî ji cih nala Walî li ser de bidin bidestnîşankirin. Tevlivêjî ligel nermbûna pir ji dîtina serûştîya van daxwazan jî de Dewleta Anqera lênerîn yaxud bicihanîna wan jî date bivegerandin .

³⁸ kaniya berê, R. 163

Mîna her car Dewleta Turkî, gava bi metirsiya rewşê ve date bihestkirin, bi hêviya berbadkirina Şûreşvanan di rêya siyaseta "Qamçî û Şekir" de dest bi xapandin û gerandina vîlikan ve date bikirin.

Ji bona let letkirina tevgera Kurd Dewleta Turkî Wênerîyek ji bona Wilayetên Rojhilat di bin Sereketîya Serekê Dadgeha lêvegerandinê Şefîq Axa de ji Kurdên Bedlîsê date birêkirin, yê ku ew di 15 avdara sala 1921 de ligel hin ji Begên herema Sîwasê de bi bajarê Sîwasê ve hate bigihaştin. Şefîq date bizanîn, ku ew Kurdekî mêldarê tevgera Kurdî dide bikirin û ji bal Dewletê de bi rabûna gift û bêjan ve ligel Rêberên Kurdan de ew hatîye bidesthilatîkirin.

Vî "Kurdê Mêldarê tevgera Kurd" date bixwestin, ku Kurd şerên xwe beramber bi Turkan ve bidin birawestandin, tanî ku bi kêmanî ve gift û bêj bêtin bikotahîkirin.

Divê li vê derê de bête binîşandan, ku jimareke nekêm ji "Mêldarên tevgera Kurd" di nava Rêberên raperînê de nala Kemal Heyder Beg, yê ku wî Hevalbendîya Şefîq didate bikirin, hatin biderketin.

Weha bi vî rengî ve dubendî di xebata Kurdan de di vê herema hanê de hate bidozandin. Weha di vê pêla hanê de, di dema gift û goyî de dihatin bikirin, Serekê Komên Nawendiyên hêzên Turkî Nuredîn Paşa ji bona şeran dijî Kurdan bi lez ve xwe dida bilikardixist. Weha tîpa sêyem û ya pêncî ji Suwaran ji Yozgat di 12 avdara sala 1921 de ber bi Sîwasê ve dest bi ketina rêya xwe date bikirin. Wehaji

gurdana amadekirî ji bona şer ya Orduwa pêncan li Amasiya, pêrejî bi serdejî du gurdanên ji tîpa dehan ya orduwa pêncî li Mirzugon de bi cihkirî ve tevde ew bi vê derê ve hatin bigihaştin.

Di wê rojê de bi xwe jî ve Rêberîya Komên Nawendiyî hêzan ji bona cengê biryarîya dagirtina Xelkêyî perçeyî date bikirin. herwehaji li jêr fermana Serekê Komên Nawendî de hêzên cendirme ligel yekaneyên warkirî li Sîwasê, Yozgatê, Amasiya, Mirzêgon, Tokatê, Arzincanê, Bayîportê, Hirisonê, Şabîn-Koçxisarê, Çimişkizikê, Arabgirê û heremên din de hatin bidanîn.

Piştî vê komkirina hêzan Rêberîya Turkî Rewşa Nebarî li Wilayetên Sîwasê, El-Ezîzê û Arzincanê de di mêtûwa 15 avadara sala 1921 de date bidazanîn. Tevlivanjî û ji bona sistkirina hinera Rêberên Dêrsimê Dewletê birûskek ji wan re date bilêdan, ku têde ew ji wan bersivê dide bidaxwazîkirin, ma gelo dê ew li ser xebatê de hêjî bêtin biçûyîn? Di bersiva xwe de li ser vê birûska hanê de Rêberên Kurdên Dêrsimê datin bidazanîn:

"Jiber vê, ku ew dizanin, ku Dewleta Turkî ji bona nabûdkirina kurdan kar dide bikirin, weke mîna ku wê Ermenî dane binabûdkirin, dê ew her û her li ser xebata xwe de ji bona bi cihanîna mafeyên Milî û liberxwedana dadwerî ve bêtin biçûyîn"³⁹

Divê li vê derê de bête bigotin, ku metirsiya Dewleta Anqera li ser rewşa Dêrsimê de bi pileyekî weha hatibû bigihaştin, ku ew têde bi kişandina perçakî ve ji hêzên Turkî

³⁹M. N. Dersimi . Kurdistan Tarihinde Dersim, R. 145.

di anîya Yunanî de hate bineçarîkirin û ber bi şerkirina Kurdan ve ruwê wan date bivedan. Bes ji bona agehdariyê orduwa çardehan û tîpa sêzdehan ji Suwaran ji bona Sîwasê hatin biveguhestin.

Û bi armanca rê li ber belavbûna tevgera kurd de li Rojhilat û Bakur de bête bigirtin, Dewletê hêzên pir mezin ji bona El-Ezîzê û Arzincanê dane biveguhestin. Herwehaji hêzên Turkî çavdêriyeke pir tûj li ser rêya Sîwasê-Kenvalê-Meletyê-Ilyazig-Sîwasê-Zaza de datin bidanîn. Herwehaji pirên li ser çemên Fîrat û Muradê de datin bigirtin, yên ku ew Dêrsim ligel El-Ezîzê, Arabegîr, Meletyê, Igin, Kimaz û herwehaji rêyên din de didin bigirêdan.

Tevî li buhara sar jî de ferman ji bona hêzan bi destpêkirina şerên jêhatî ve hate biderkevtin. Şerên pir giran û tûj di herema navbera Dêrsim û Arzincan de bi rengêkî taybetî ve hatin bikirin. Pêrabûnên Nuridin Paşa ji bona serberjêrkirinê Rêberên kurdên dudilî dane bibawerîkirin, Ku Kamalî ji dil û can ne bes tenê hîç naxwazin sozên xwe bi cih ve bidin bianîn, herwehaji pêrejî ew hîç bi çûktirîn daxwazên kurdan ve nadin bicihnanîn, weha tanî Heyder Beg jî ne bi sozên Turkan ve didate bibawerîkirin, ew jî tev li xebatê de dijî wan hate bikirin. Şeran li ser xêza Sîwas-Koçxîsar-Zaza û Sîwas-Kenval de date bidestpêkirin.

Kurd ji Biçûk û Mezinan, her yekî ji Zilam û Pîrekan, Kal û Zarokan çek dikarîbûn hilgirtana, li gora karîna xwe de ew di van şeran de dijî Turkan dihatin bibeşdarkirin û wan hêrîşên Turkan yek li dû ya din de bi mîrxasî ve didan bivegerandin.

Lêbelê hêzên beramber ne mîna hevbûn. Şûreşgêr di bin givaştina hêzên bi serketî ve duçarî vegera ber û paş ve hatin bilirin û jimareke pir ji Rêberên Kurdan bi mêrxasî ve hatin bikuştin. Di zîneteke weha de Rêberên Şûreşgêran biryarek ji bona veguheştina Pîrek û Zarokan ji bona Dêrsim dane biwergirtin.

Di 24 cotana sala 1921 de Heyder Beg ligel 2000 Mirov de ber bi Irzîcan û Biyolyomyor ve (yanî ber bi ber Jor û Jorê Rojhilat ve) bi nêta yekbûna wî ve ligel Dêrsimyan hate birêkevtin. Hêzên Turkî bi dû wî ve hatin bikevtin û gava ew bi tuxûbên Eşîrên Korîşan û Balabanan ji Jorî Irzîcan ve hatin biketin; jiber wî nêt hebû, ku ew di xaçîrêkên Biyolyomyor-Mama xatûnî çîyayî de xwe bi Dêrsimê ve bide bigihandin, lêbelê ji dêlva destê alîkarîyê jêre bête bidirêjkin, Axayê Eşîra Korîşan bi çend hezar Mirov ve rê li ber Heyder Beg date bigirtin û wî date bizanîn, dê ew cengê dijî Şûreşgêran bide bidestpêkin, heger ku ew di nava "Erdên" wî re bêtin biderbaskirin. Piştî ku desteyên Heyder Beg ev lêdana hanê ji piş ve hate bipêkevtin, ew ji şeran ber bi çîyayê Koçgîrê ve hate bivegerandin.

Wehajî hêjî şerên tûjî Şûreşgeran beramberî hêzên Turkî bi berdewam ve dihatin biderkevtin, yên ku wan pêşîya xwe bi carekê ve didan bitextkirin. Caşên Osman Topal Axa bi harbûna xwe ve beramberî Xelkên kurd dihatin binîşankirin. Wîna tevaya Xelkên gundên vegirtî bi carekî ve didane biqirdikirin.

Weha M. F. Fironze der barê hovîtiya wî Derebegê Kevneperest, yê ku wî ligel alîyê hêzên Dewletê de didate bişerkirin, weha daye binivîsandin: "Ji demeke kurt de

yekek ji mezintirîn Serokên bi desthilatî ve li lazistan de Osman Axa ligel Caşên xweyî çekkirî de ji Laz heremên Kurdîyî Şûreşgêr dijî Turkan li Rojhilatî Enedolê de dide bihêrîşkirin, da ku ew wan hereman bide bikavil û biwêrankirin⁴⁰.

Bi armanca şikenandina textikê piştî Şûreşgêran ve Nuridîn paşa bi nabûdkirina Rêberîya wan ve date biryarîkirin.

Weha wî li ser Begên Sîwasî ji Kurdên Hevalbendên Turkan de bi rabûna dan û sitendinê ve li ser xêza aniyê de ligel Heyder Beg de û razîkirina wî bi hatina Sîwasê ve ji bona gift û bêjê date bipêşkeşkirin.

Weha Heyder Begê bi dudilya xweyî bi nav û deng ve ling ji bin hate bişemitandin û vê carê jî ew hate bixapandin. Weha ew ligel hêzekê ji 1000 Mirovî de pêkhatî ji bona Sîwasê ji bona nik Bingeha Rêberîya Leşkerê Tirkî hat biserdan, bi lez û bez ve ew ligel 400 Peyayên xwe de hate bigirtin û 600 Şervanên mayî ji bona Wilayetên Rojava û cihên dinî cuda hatin birêkirin.

Weha vê bêbextîya nuhî Heyder Beg giranbûnên bi baran ve ji bona tevgera Kurd date bipeydakirin. Ligel ku wêna Şûreşgêr dane bilawazkirin, herwehaji pêrejî wê ziyaneke gewreyî rewanî bi wan ve date bixistin. Lêbelê Turkan bi kirinên xweyî hovîtî ve beramberî Kurdan kêrên dûr ji bona xwe didan biarmanckirin, ku yek ji wan weha tete

⁴⁰M. F. Fironzi, Gerek ji ... R. 278.

biencamkirin, ku ew yên dudilî bi bi vê vè didin biagehdarkirin û bi rastî jî ve pir kesan dest bi dûrbûna xwe ve jî tevgerê dane bikirin.

Weha li pêşîya hêzên Şûreşgeran de, yên ku ew roj bi roj ve kêmtir dibûn, yên ku ew ji bal Alî Şêr, Nuri, Sabir, Mohehed Alî, Cengîz, Hemo Tar Bazalî, kamil Ezîz, Dîlo, Başo Ebas û yên din de dihatin birêberkirin, nema bêtir ji kişandina xwe ji şeran ber bi heremên Dêrsimî çiyayî ve tiştêkî din hatibû bimayîn, ku li wê derê jî de belayên dinî nuh çavdêrîya wan didan bikirin.

Weha ev di rastîya rastî de dide binîşandan, ku serhildana Kurdên Koçgêrê bi ketinê ve hate bipişk û biparkirin. Rêberîya hêzên Turkî li Sîwasê de Kutahîyek date bibelavkirin, ku ew têde dide bigotin: ku di encamê şer de 113 Kurd hatin bikuştin, 113 jî hatin bibirindarkirin û 159 Kes jî hatin bidîlkin.

Herwehaji pêrejî Rêberên Kurdên Koçgêrê nala Ezmet, Behrî Beg, Sabir Beg, Xîlîk Alî, Hemo, Ezîz, Takî, Heyder Beg, Pehlewan, Hisên û Aşûr hatin bidîlkin... Di hem demê de jî 2000 tiving û teqemeniyên din hatin bijêrdestkirin⁴¹.

Pişti temirandina vê serhildanê 400 Gunehbar ji bona dadgeha leşkerîyî jirêderkevî li Sîwasê de hatin bipêşkeşkirin. Weha li ser Heyder Beg, Seîd Ezîz û 15 Kesên din de jî Hevalên wan bi darvekirinê hatin bidadkirin.

⁴¹M. N. Dersimi. kurdistan Tarihinde Dersim, R. 159.

Herwehaji pêrejî li ser Alî Şêr, Wem, Nuri, Mehmed Mustefa Paşa Oxlo, Hemo Tar Bazalî, Dîlo, Sebrî û 95 Şûreşgêrên dinî ne li wir de bi mirinê ve dane bidadkirin. Lêbelê beramberî Gunebarên din dadiyên cuda bi dirêjbûna xwe ve hatin biderkirin, ku ew di navbera 5 salan û heta heta li gora pileyê "Gunehkarîyan" de pêşkeşî ji wan re bi zindanê ve hatin bidadkirin.

Lêbelê tar û markirina vê raperînê aramî û asayiş li Dêrsimê de neda bipeydakirin. Herweha tevgera li dûhev de ji bona berdana Girtiyên rengê ji rengên liberxwedanê dijî Turkan ji xwe re date biwergirtin. Ev tevgera hanê bi nîşanên xweyî taybetî ve dihate binîşankirin; jiber Dêrsimyan daxwazên xweyî di birûskên rêkirî de ji bona Anqera bi pêrabûnên leşkerî ve li ser xêza Irzîcan-Kimax-Êçîn tanî tixûbên Zaza û Dîvrigê de didan "bixurtkirin".

Weha di vê rewşa teng û tar de ji bona Kemalîyan, ku divabû ew tevaya hêzên xwe li ser anîya Rojava de dijî Yunaniyan bidin bicivandin, Civata Netewê Turk li ser pêşneyara M. kemal biryarîya Dadgeha Leşkerîyî Jirêderketî li Sîwasê de beramber bi Kurdên Girtî ji bil Alî Şêr, Wem û Nuri date bihilanîn.

Weha bigir tevaya Kurdên dadkirî bi sêdarê ve ew hatin biberdan. Lêbelê lêbuhurandinê ew Kurd bi ber xwe ve nedane bixistin, ji yê ku wan xwe berdestê hêzên Turkan nedabûn bikirin û bi serê çiyên ve hatibûn bikevtin. Di mana wan de di rewşa ku Turkan ji wan re bi navê "Rêbirên Rêyan" ve didan binavkirin, Kurdên Dêrsimê dev ji rabûnê şerên xwe bernedan; jiber Dewletê hîç kêreke wêyî bi rastî

ve li ser Dêrsimê de ne bû.

Weha Agda ji bona nimûne, ku bi carekê ve di bin desthilatîya Seyid Riza de bû, ala Kurdistanê li wê derê de berz û bala bû, hêjê ew dihate bihejandin û desthilatîya Turkî destkurt bû û bi hîç kirineke rast û durûst ve nedikarîbû bête birabûn.

Lêbelê ji alîyekî de Dewleta Turkî desthilatîya xwe ji bona Dêrsimê piştî temirandina raperîne nedikarîbûn bidana bivegerandin, herwehaji ji alîyê din jî de Kurdan armancên xwe nikarîbûn bidana bicihanîn.

Weha li ser van tevan de diyar dibe, ku armanca raperîna Dêrsimê pêkanîna Ewtonomiyekê ji bona Kurdan li Turkîyê de bû, ya ku ew li gora Peymana Sêver de dikarîbû bihata bicihkirin. Herwehaji dê wê bi navê Kurdan daxwaza dana Serxwebûnê bida bipêşkeşkirin. Weha jibervêjî bi xwe jî ve Dewleta Turkî ji bona serkutkirina raperîna Dêrsimê bi lez û bez ve bi hemû kar û barên xwe ve hate birabûn, tanî pileyekî weha, ku wê hêzên xwe ji bona vê mebestê ji anîya Yunanî date bikişandin û berê wan ber bi Kurdistanê ve date bivedan. Weha di vir de yekek ji hoyên temirandina raperîna Dêrsimê û rûdanên tên têtin bipoşandin.

Hoyê din ji bona kevtina vê tevgera hanê têtê bidîtin, ku Dewletên Impiryalî piştî xistina bîr û bawerîya serxwebûna Kurdistanê di Peymana Sêver de datin bidanînin, ne bes tenê hîç ji bona tevgera Kurdî alîkarîyek bipêşkeşnekirin, bi serdejî ve di warê rastîyê de bi hîç livandinekê ew ji bona bergirtina Kemalîyan di nabûdkirina vê tevgera hanê de nehatin biranebûn.

Di Encam de zîneteke weha hate bipêkhatin, ku têde remana Kurdistaneke sewrbixwe dihate bidîtin, lêbelê ew hêza hanê têde nedihate bidîtin, ya ku ew di vî warê hanê de dida bixebatkirin, da ku ew ji bona bicihanîna vê remana hanê di rastîya rastîyê de bide bicihkirin. Lêbelê çend ev rastîyên hanê jî giringbûna wan gewre jî bêtin bidîtin, hoyên temirandina tevgera Kurd di wan qonaxên gotî jî de bi tenê li ser wan de nayên bigirtin. Lêbelê hêjbêtir ew hoyên hanê komeke ji rastîyên din didin bigirtin, ku ew di serûştîya tevgera Kurdî de bi xwe jî ve têtin bipoşandin:

Yekem:

Divê penc ber bi
serûştîya derebegîyî eşaîrîyî
civaka Kurd ve û endazê
merckirî pêve ji bona
hevgirtina Milîyî Kurd bête
bikişandin; ya ku yekitîya
wan di xebata serbestîyê de
ber li ber de dida bigirtin.
Weha van dijbûnên civakî di
civaka Kurd de û pêrejî
cudabûna berjewendiyên
cuda ji hev di navbera
Desteyên Kurdîyî fireh û pir
perîşan de ji alîyekî de û di
navbera Serekên wan de ji
alîyê din de, pir ji wan
Serekên eşîran jî bona
orduwa şovînîyên Turkan ve
-Dujminên tevgera şûreşgêrî
Kurd pê hatin birakişandin.

Duwem:

Nebûna yekitîya
 oldarî sergêjîyek di nava hin
 komên Kurdan de date
 bipeydakirin; lêbelê hêjî
 Desteya Borcurwazîyî Zanayî
 Nuhhatî, ya ku dê wê
 bikarîba bi serketina xebatê
 ve ji bona yekkirina tevaya
 hêzên Milî bida bilidarxistin,
 pir qels bû. Herwehaji
 raperîna Koçgêrê di piranîya
 aliyên xwe de ji bal Endamên
 "Komela Vejandina
 Kurdistanê" de hatibû
 bilikarxistin, lêbelê Komel bi
 xwe ve di wê dema hanê de,
 di rastîya rastî de ji hev
 hatibû bivekirin. Weha bi vî
 rengê hanê ve li nik Kurdan
 de rêxistina wanî siyasîyî
 karîn ji bona rêberkirina
 raperînê ji navînîyeke yekkirî
 nebû, herweha ligelji de
 raperîna Dêrsimê tevî
 dûrbûna giringbûna wêna wê
 seranserî Milet ber xwe ve
 neda bigirtin, bes û bi tenha
 ve ew nala tevgereke
 heremîyî cihîyî ji xwe re hate
 bimayîn.

Sêyem:

Pêwiste bi taybetî ve
pence ber bi vê rastîyê ve
bête bibervekirin, ku rêberîya
tevgera Kurdîyî dûr ji Gelê
xwe pir caran reman û
hêvîyên wî bi ne başî ve
dihate biliberdikevtin. Weha
bi ne bûna piştgirtina
Cemawarên Gelêrî ve ji bona
wan ne bes tenê pir caran
wan bêbextî li tevgerê de
didan bikirin, lêbelê wan
pišta xwe bi Gel jî ve jiber ne
bawerîya wan pê ne didan
bigirêdan, ji dêlva vê
piştgirtina xwe ji bal Gelê
xwe de wan pišta xwe ji bona
"Alîkarîya" Dewletên
Împiryalî û car caran jî li ser
... Kemalîyan jî didan
bigirêdan. Weha di encamê
dawî de pir caran li ser
çarekirina tevgera kurd de ne
di rêya xebatê de ji bona
serxwebûnê, lêbelê di Holên
Diplomasîyê de dihate
bibiryardan; jiber vê jî kêsa
rengên pir cuda ji bona
destdirêjkirina nava
pirsiyarîya kurd dihate

bidîtin. Weha li ser vî rengê
hanê de bi xwe ve dikare bête
biliberketin, bê çima
çarekirina tevgera Kurd di wê
çaxê de bi xwe ve, di pişt
pišta Gelê Kurd de di encamê
dawîya dawî de dijî
berjewendîya wî di rêya
pîlana Dewletên Impiryalî de
ligel Kemalîyan de di
Kongirê Lozanê de (di sala
1923 de - Cuma) hate
bibiyarkirin.

Weke me berê daye bibîrxistin, ku li gora Peymana Sêver
divabû Encûmenek ji Wênerên Dewletên Hevalbend ji bona
likarxistina Yasayê Serpereştîya Xweyî ji bona heremên di
navbera Ermînya, Îraq û Suryê de pê bête birabûn. Ku di
çaxa Xelkên herema kurdî piştî derbasbûna salekê li ser
girêdana peymanê de bibîrxistnekê ji bona Hevgirêdana
Netewan bidin bipêşkeşkirin, ku têde piranîya Kurdan
cihêbûnê ji Turkîyê bidin bidaxwazîkirin û heger jî Civata
Hevgirêdana Netewan bi vê dazxwaza hanê hate
bipêrûniştin, wê çaxê li ser Turkîyê de divê ku ew ji vê
herama nîşankirî bête bidaktin.

Lêbelê wehajî me date bidîtin, bê çawa Dewletên
Hevalbend piştî nêzîka derbasbûna nîv salê li ser morkirina
Peymana Sêver de bi amadebûna xwe ve li ser xistina hin
guhertinan de têde li ser pirsîyarîya kurdistanê de datin
bizanîn. Bi navtêdanê ve li ser vê rastîya hanê de û li ser
jibîrkirina diyar de ji bal Dewletên Hevalbend de beramberî

berjewendîya Gelê Kurd de Turkan raperîna Dêrsimê datin bitemirandin û weha pêrejî kûra agirê serxwebûna kurd li Dêrsimê de wan datin biberbadkirin.

Bi serdejî ve hêjbêtir Dewletên Hevalbend di pêşneyarên xwe de di avdara sala 1922 de ber bi pirsîyarîya Kurd ve hîç bi carekê ve ber pêde nehate biçûyînn. Di encamkirina van tevan de Kemalîyan nehiştina xistina pirsîyarîya kurd di xana kar û barên Kongirê Lozanê de dikarîbûn biwerbigrin.

Weha bi vî rengî ve tanî wê demê dawîya remana serxwebûna Kurdistanê hate biderkevtin, ji Kurdan re tiştêkî din nema hate bîditin, ji bil ku vê pîlana hanê li ser wan de di rêya Yasan de bidin bicihkirin. Di pişt re peyv dikarîbû ne li ser serxwebûna Kurdistanê de bête bigerandin.

Lêbelê li ser ku kî bêtir dikarîbû bi jêhatbûn û kosetî pirsîyarîya Kurd ji bona berjewendiyên xwe nemaze di pirsîyarîya Musilê de ji xwe re bide bikaranîn. Divê li vê derê de bête bigotin, ku şehrezabûna Destêyên Serdaran li Turkîy de di vîlik û tepên weha de ji şehrezabûna Ingilistanê û Hevalbendên wêna ne bi kêmtir ve dihatin bidîtin.

Di encamê dawî de rewşeke weha hate bipêkhatin, Ku Ingilîzan xwe têde weha dane bixuyanîkirin, ku ew li ber serxwebûna Kurdan de li Turkîyê de didin bidan, di dema ku wan cûlandina kurdan li Îraqê de didan bitemirandin. Wehajî di vê dema hanê jî de Turkan bi xwe jî ve xwe nala Havlbendên Serxwebûna Kurdan li Îraqê de didan bidîyarkirin. Lêbelêjî pêrejî wan bizava Kurd li Turkîyê de didan biberbadkirin.

Weha Mustefa kemal di peyva xwe de ligel Balozvanê Sovyêti S. I. Aralov li ser vê mebesta hanê de dide bigotin: "Kurdên Neşînvânên dorhêla gola Ormiyê daxwaza xwe di yekkirina rêxistina livandinê de ligel Turkiyê de dane biderxistin. Li nik wan de dirav û çek têtin bipeyda kirin û ew xwe ji bona raperîna dijî Impîryalîya Ingilîzî didin biamadekirin.

- Kemal date bipêvekirin, Ku pirsîyarîya Kurd pir tevlihev û dijwar tête biderkevtin û Ingilistan pêvegirêdana Kurdan ligel herdu Dewletên -Turkî û Faris de- ji xwe re dixwaze bide bikaranîn, da ku ew bi rola xwe ve bête birabûn, ew dixwaze Dewleteke Kurd di bin zalbûna xwe de bide bipêkanîn, da ku ew di encamê dawîya dawî de desthilatîya xwe li ser wan de, li ser Faris û pişt Qefqasya de bide bivegirtin ... Rêberên Kurdan niha ew ji hev bi perçen ve têtin biderkevtin: Hin ji wan mêldarê Îranê didin bikirin, Hinên din mêldarên Ingilistanê didin bikirin û beşê sêyem ber bi me ve têtin bikişandin ... Weha li bajarê Sulêmanîyê de Ingilîzan Şêx Mehmed bi rawestandina dijî me ve dane bineçarkirin ...

- Em, Turk -Kemal date

bigotin û ligel jî de bi qerf ve beşîşî-
em ji aliyên xwe de kêmanîyê nadin
bikirin, weha me alîkarîya Kurd û
yên din di ruwê Ingilîz de li jêrî
Kurdistanê de daye bikirin"⁴².

Van dek û dolabên hanê bikaranîna Kurdan di berberîya Turkî-Ingilîzî de li ser pirsîyîya Musilê de didate biarmanckirin. Xweser piştî biserketina Kemalîyan li ser Yunanê de di sala 1922 de hêzên xwe wan li ser sînorê Musilê de datin bicivandin. Serleşkerê hêzên Mîla Musilê Ozdermir Paşa dest birêkirina bangan ji bona Serekên Kurdayî cuda date bikirin û ligel wan de wî pêwendîyên xwe date bidanîn. Weha gihandina vê nêta hanê hêsanbû; jiber tevgera dijî Ingilîzî seranserî Îraqê li ber xwe de dabû û Rêberên wê berên xwe ber bi Turkiyî ve dabûn bivedan; jiber ku ewaya bi hêza beramberî Ingilîzan ve dihata biderkevtin.

Û bi armanaca mêldarîya Kurdên "Îraqê" bi aliyên xwe ve Kemalîyan ligel Şêx Mehmed peymanek dane bigirêdan, ku têde hatiye binivîsandin:

"Dewleta Turkî bi dana serxwebûnê ji bona kurdistana Jêrîn soz dide bidan û bê destdirêjîya xwe di nava kar û barên wêyî hundurû de wê peyman date bidan" (benda yekem), bi Şêx Mehmed ve nala Serdarê Kurdistanê li Sulêmaniyê de ew pê hate birûniştin, ku dê Civatek bête bipêkanîn (benda duwem). Mafeyê Dewleta Turkî bikaranîna hêzên çekdar li Kurdistana Jêrîn de di dema

⁴²S. I. Aralov. Bîrweriyên Diplomasîyeki Sovyêti, R. 107- 108.

çengê de tête biderkevtin (benda sêyem)⁴³.

Rewşene, ku em bivên yanî nevên, divê em bi "Mêldarîya Turkîyî" Şêx Mehmud ve bêtin birûniştin, lêbelê jî ji bona Şêx Mehmud bi pêrûniştinê jî ve em têtin bineçarîkirin, ku ew di xebata xwe de beramberî Ingilîzan ne dikarîbû dev ji yarmetîya Turkan bidin biberdan. Hiç jî gûman li ser niye, ku van rewşên hanê weha roleke mezin date bilîstin, ku Ingilîz û Turk ji bona Kongirê Lozanê (sala 1923- Cuma) bân û ew ji bona hev bi amadebûn ve bêtin biderkevtin, ku li ser pîrsa kurd de ji hev re bêtin bidakevtin.

Çawa be, wa diyare, ku pîrsiyarî di vî Kongirê hanê de ji bona bêjeke "Zanistî" hate biveguhertin, gava pîrsiyarîya Kêmanîyên Milî li Turkiyê de li ser de hate bipeyivandin, bê çawa têgihiştina Kêmanîya Milî tête binîşankirin.

Weha bi diyarî ve tête biderketin, bê çawa Ingilîz pêrazî bûn, Ku "Wênerên" Kurdan di Civata Netewê Turkîyî Bilind de li ser wê pîrsê de bersivê bidin, Ma gelo Kurd li ser Cihêbûna Kurdistanê ji Turkiyê de sorin? Di vî babetê han de daxwaz bi birûskî ve di sala 1922 de ji bona Civata Netewê Turkîyî Bilind dane birêkirin. Civîneke ji nişkêvê ji bona Civatê hate bigirêdan, ku tede Mustefa Kemal ji bona Wênerên "Kurdan" date bipêşkeşkirin, ku ew di vî babetê hanê de bîr û bawerîya xwe bidin biderxistin. Weha Wênerê Erzeromê Hisên Ewnî Beg li ser vî babetî de bi diyarî ve date bibersivkirin:

⁴³Kozu Oxlu. kurd û Impiryaliû (belavokeke hundurûyîyî Ragihandina Rojhilatata Navîn) 1932, Jimar 13-14, R. 115

"Ku ev Welatê hanê ji bona Kurd û Turkan tête bivegerandin. Ê bes û bi tenha ve mafeyê van herdu Netewan, Netewê Kurd û Netewê Turk tête biderkevtin, ku ew ji ser vî depê hanê bidin biaxivtin"⁴⁴.

Weha Wênerên Dêrsimê Hesên Xeyrî û Ramiz, "Wênerên" Orfa Bozan Beg û Şahîn, Wênerên Kurdên ji Palo, Wanê, Bedlîsê, Diyarbekir û Meletya-ango bigir tevaya Kurdên "Wênerên" Civata Turkî piştî peyvên Wênerê Erzeromê datin bigirtin.

Rewşene, ku ev yekbûna dengên "Wênerên" Kurdan giringbûneke wêyî başî ji bal dîtina berjewendîya bizava Gelê Turkîyî beramebrî bi Impiryalîyê ve date bikin; jiber wê destdirêjkirina Dewletên Rojava di nava kar û barên hundurî Turkiyê de date bidûrkin. Lêbelê ji bal berjewendiyên Milîyî Kurd de bes û bi tenha ve ev "yekbûna" wan bi bêbextîyekê ve tête bihêjakin.

Lêbelê tevîvêjî "Wênerên" Kurdan ne dikaribûn bizanîbana, ku ew gava li ser mafeyên Kurdan de didin biaxivtin, dê ew di demeke kurt de bêtin binabûdikin.

Lêbelê çawa jî be, Civata Netewê Turkîyî Bilind piştî piştgirtina wan ji xwe re date biwergirtin, bersiv bi birûskî ve ji bona Lozanê date birêkin, ku têde hatîye binivîsandin, Kurd bi carekê ve hîç ji Turkan nayêtin bicihêkin⁴⁵.

⁴⁴A. Bedirkhan, *la Question Kurde*, Paris. 1959, R. 9.

⁴⁵M. N. Dersimi. *Kurdistan Tarihinde Dersim*, R. 189.

. Weha piştî ku Serekê Rewanekê Turkî ji bona Kongirê Lozanê Ismet Paşa ev birûska hanê date biwergirtin, wî date bizanîn:

ku Turkîyê ji bona du Miletan, Turk û Kurd bi mal ve têtê bidanîn, herdu Milet jî beramberî bi Dewletê ve bi mînahev ve têtin biderkevtinû ew herdu bi mînahev ve bi xwedanê mafeyê Milî ve têtin biderkevtin. Nêt ji van peyvên hanê ku dê ji bona Kurdan bi rastî ve hin ji "Mafeyên Milî" bêtin bidan, lêbelê bêyî hîç diyarîkirina piçekî jî ji cewhera wan bête bidiyarkirin.

Piştî ku Beşdarvanên kongirê Lozanê xwe bi beramberî rastîyekê ve datin bidîtin, ku "Wênerên" Kurdan Cihêbûna Kurdistanê ji Turkîyê nadin bidaxwazîkirin û Dewlet bi cihanîna mafeyên Milîyî Kurdan pê dide bisozdan, weha ne bes tenê li ser danîna remana serxwebûna Kurdistanê de di koşa jibîrkinê de hatin "birazîkirin", lêbelêji pêrejî hemû belgeyên Mîrî jî, yên bi Kurdan ve dihatin bigirêdan, ew ji xana kar û barên Kongire hatin biderkirin.

Di peymana morkirî de di mêjûwa 23 gelawêjê de di sala 1923 de li Lozanê de bes û bi tenha ve li ser kemaliyan de bi wergirtina van amojgarîyên tèn hate bibeskirin:

"Benda 38 -Dewleta Turkî bi misogerkirina liberxwedana giştî ji bona jîyan û serbestîya Neşînvanan, bê cudabûn ji binyadîyê, milîbûnê, ziman, rehê û oldarîyê bi peyman ve dide bikirin".

"Benda 39... Hîç tu bend di ruwê hîç Neşînvaneke Turkî de, di warê dan û sitandina wanî azadî de bi çi zimanekî jî be, ger ew jî di pêwendiyên taybetî de yanî bazirganyê de, yaxud di warê oldarî de, yanî di warê ragiyandinê de, yaxud

di berkirinên çapemenîyên cuda de, yanî di civînên giştî jî de bin, nayêtin bidanîn ..."⁴⁶.

Weha ji pêrabûnên dek û dolabên Impiryaliyên Hevalbend û Kevneperestên Turkî li Kongirê Lozanê de hate biberkirin, ku nayînkirina mafeyê Kurdan di serxwebûnê de li Turkiyê de durûvê xweyî yasayî û biryarkirina xweyî yasayî date biwergirtin.

Weha jiber vê jî, ji vê koşa hanê jî, di dema F, Nêkîtin Kongirên Sêver û Lozanê de dide bihêjakirin, ew dide binivîsandin:

"De bera Peymana Sêver pîlanekî ji aliyê ramyarîyê de ne di cihê xwe jî de bête bidîtin, jiber vê jî dibe, ku ew neyête bicihanîn. Herwehaji di nêta me de niye, ku em mêjûwa Diplomasîya piştî Cengê li Asya Pêşîn de bidin birastkirin. Lêbelê bi pêrûniştina Sêver ve bi bîr û bawerîya Ewtonomî ve ji bona kurdistanê û ji komên bîr û bawerîyên din vê Peymana hanê di wê dema hanê de Qanûna Dewlî date biserxistin... Peymana Lozan ev yeka hanê nekir; jiber vê jî rewşene, ku ew ji bal ruwê dîtina pêşvexistina Qanûna Dewlî de gaveke ber û paş ve tete bidîtin..."⁴⁷.

Nêkîtin di vê hêjakirina xweyî hanê de bi rast ve tete biderkevtin, nemaze rabûna Dewletên Impiryalistî bi danîna remana serxwebûna Gelê Kurd ve di nava perda jibîrkirinê de bi nala hilanîna rewşa dadwerîyê ve ji ser tevgera Milîyî

⁴⁶"Peymana Sêverêyî lihevhatinê û bawernameyên li Lozanê de Morkirî", R. 152.

⁴⁷B. Nikitin. Kurd. Mosko 1964, R. 408

kurd hate bidîtin û di encamê dawî de nala dayîna "mafeyê" Qanûnî ji bona Kevneperestîya Turkî bi nayînkirina berjewendiyên Milîyî Kurd ve li Tirkîyê de hate bidîtin.

Weha nîzimbûna ramyarîya Dewletên Impiryalî li ser çûna yarîkirinê bi pirsîyarîya kurdî ve dihate bîdiyarkirin, ya ku ew ligel van jî de her û her wan ji bona bikaranîna wêna di vê demê de yanî di ya din de ji bona gihandina armancên xweyî Impiryalîyî cuda wan ew dida bikaranîn.

Weha me bûyînên nîşankirî ji vê ramyarîya Pîlangerî di qonaxa tê de di lêvenerîneke taybetî de lê daye bitemaşekirin. Lê li vê derê jî de em dixwazin, dîtina Xwedanên Guhpêdanên bi van bûyînan ve bi ber heve ve bidin bianîn. Em dê van bûyînên hanê û agehdarîyên raxistîyî jorî bi givaştî ve bi serhev ve bidin bicivandin:

1. Tevî cihêbûna pir Welatên ne Turkî ji Imperetoriya Osmanî di encam de nala "Dewleteke Pir Milî" hate bimayîn. Raste, ku Turkîya bendkirî ji bal Talankerên Impiryalîyî de bêtir bi hêz ve nema mîna berê dihate bîderkevtin, piştî çengê ew Dewleta Kolîdarî nala Imperetoriya Osmanî hatibû bimayîn, lêbelê jî bi her awayekî jî ve wê dikarîbû desthilatîya xwe li ser Ermînya Rojava û Kurdistanê de bide biparastin. Divê em li vê derê de bi tonekî taybetî ve bidin bironîkirin, rastîya ku Kevneperestîya Turkî xweset bi windabûna erdên xweyî kolonyalkirîyî fireh bi "Malkirina" bi carekê ve ji bona Kolonîyên mayî bide

biveguhestin. Weha ji bona vê niyaza hanê bi xwe ve wê ramyarîya bi dawî date bianîn, ya ku "Turkîya Genc" bi ramyarîya "Valakirina" Ermînya ji Xelkên wêyî cihî date bidestpêkirin, wehajî xweser wê li ser wê şopê de bi xwe jî ve dest bi "Maldarîkirina" wî perçê Kurdistanê ve date bikirin, yê ku wê ew dabû bisengînîkirin.

· Weha ev pêla hanê, ya ku me lêvenerî nala qonaxa pêşî ji ramyarîya Borcuwazîyî Turkî di pirsîyarîya Kurdî de tête bijimartin, ji bona parastina kurdistanê ji bona xwe û "Maldarîkirina" wê di pişt re dide biderxistin.

2. Borcuwazîya Turkî di vê ramyarîya xweyî hanê de ligel liberxwdana tevgera Milîyî Kurd de hate bipoşkirin, ya ku rêxistinên xweyî Civakî-Zanyarî û ramyarî di dema herifandina Imperetoriya Osmanî de dabû bipeydakirin. Wan rêxistinan şiyarkirina Milîyî Kurdî didan bikûrkirin û wan Kurd ji bona xebta serxwebûnê didan bibirêxistin. Wan rêxistinên hanê bi rengekî binge hî ve Wênerên Zanevanên Borcuwazîya Kurdî Nuhatî ji (Wêneran, karmendan, Evseran, Dadyaran, Nivîsvanan) û Bazirganan, pêrejî ji Serokên Eşairan û Meşayîxên Welatperwer jî di nava xwe de didan bicivandin.

Lawazbûna tevgerê di vê pêla han de di nebûna bernameyeke xebatîyî hûr de, di nebûna yekitîyê de çi di navbera komel û encûmenên Kurdîyî cuda de, yanjî di navbera Eşîran û Komên Eşîrtîyê de dihate bidîtin. Herwehaji ligelji pêwendîya lawazî van rêxistinên ligel cemawerên gelêrî û bîr û bawerîy wanî evsanî beramber bi armancên rast û durûstî Dewletên Impiryalî û nemaze Ingilistan ve dergehek ji bona van Dewletan bi destdirêjkirina nava kar û barên kurdan û bikaranîna xebata wan ve ji bona armancên xweyî Impiryalî date bivekirin. Wehaji jiber vê jî bi xwe jî ve Dewletên Impiryalî bendên li ser serxwebûna kurdistanê di nava Peymana Sêver de datin bidanîn, pêrejî di wê çaxê de bi xwe jî ve bi her awayekî ve wan kar didane bikin, ku ew remana hanê di warê rastîyê de neyête bicihanîn.

3. Xebata Gelê Turkîyî dijî Impiryalîyê, ya ku bi Şûreşa Kemalî ve tête binavkirin, hin ji hêvîyan ligel hin ji Rêberên Kurdan de di wergirtina mafeyê pêşveketina serbixwe de, yanjî ewtonomî bi alîkarîya Miliyên Turkî ve date bipeyda kirin. Wehaji jiber vê jî wan di pir pirojeyên Kemaliyan de xwe têde dane bibeşdarîkirin û bi rengê pir bi kêr ve wan piştî xebata wan dijî talankerên Impiryalistan dane bigirtin.

Û ji bona bikaranîna Kurdan di vê xebata

hanê de û ji bona livandina xweyî li ser berê ramyarîya derve de Borcuwazîya Turkî guhpêdanek bi Derebegên Kurdan ve date bidan, hêjê ji vê jê bêtir wê "Piştigirtina" tevgera Kurd li.. Îraqê de date bigirtin, lêbelê sebarêt bi "Kurdên xwe" ve, weha mîna derçû, gavên pêşîyî Milîvanên Turkî nemaze biryar û daxuyanîyên derketî ji Kongirên Erzeromê û Sîwasê ligel "Peymana Milî" de hatin biderketin, ku tevaya ramyarîya wêna ber bi hiştina Kurdistanê ve ji bona xwe û di encamê dawî de vegirtina Kolonyalî li ser Kurdan de dida biarmanckirin.

4. Weha li tevgera Kurdîyî serbestkirinê lêdaneke pir diwar di Kongirê Lozanê de lê hate bikevtin, yê ku encamên wî mîna gaveke ber bi paş ve beramber bi Peymana Sêver ve li ser ruwê dîtina Qanûna Dewlî de û li ser rewşa tevgera serbestkirina kurdan de hatin bidîtin. Weha Kongirê Lozanê date bixuyanîkirin, ku Dewletên Impiryalî li Rojava de li pirsîyarîya Kurdî de nala pelekî qazanckirî di gift û bêja xwe de ligel Turkiyê de li ser Wilayeta Musilê de lê didin bitemaşekirin. Weha piştî wan armancên xwe dane bicihanîn, bi pir hêsanî û sadebûn ve wan dev ji remana Kurdistana serbixwe dane biberdan û weha wan bi vî rengê hanê ve "mafeyê" nayînkirina awatên tevgera Milîyî Kurdî û nabûdkirina Tevegra wanî Milî ji bona serxwebûnê ji bona kevneperestên Turkan dane bipêşkeşkirin.

Raperîna Kurdan di Sala 1925 de (Raperîna Şêx Seîd)

Lîkarxistina Raperînê

Raperîna Kurda di sala 1925 de cihekî xweyî pir giring di mêjûwa tevgera rizgarîya Kurdan de dide biwergirtin. Destpêkirina likarxistina vê raperîna hanê, ya ku ew di pişt re bi "raperîna Şêx Seîd" ve hate binavkirin, di pêşîya bîstan de ji vî sedsalê hanê de tête bivegerandin.

Mêweyê jêhatbûnên komên Kurdîyî veşartî "Komela Serxwebûna Kurdistan" bû, ya ku ew di gulana sala 1923 de de ji van koman hate biderketin. Ev Komela hanê Komeleke veşartî bû, ku ew jî bi xwe jî ve ji komên veşartî bipêkdihat. Ev komên hanê jî her yek ji pênc Kesan dipêkdihat, ku wan hevdû bi navên veşartî ve didatin binaskirin. Herwehaji li ser wan de dihate biqedexekirin, ku ew di derveyî malika xwe de, ya ku ew têde bûn, ligel hevdû de bidin bipêwendîkirin. Pêwendî ligel malikê de di rêya Endamekî ji komîtîyeke bilindtir de dihate bikirin⁴⁸.

Weha li ser Endaman bû, ku ew navê rêxistinê nedin biderxistin û her yek bi tawanberekî pir tûj û sert ve dihate bitawanbarkirin, heger ku wî nehîniyên wê bidana biderxistin.

Di vê pêla hanê de sazmenî ji bal Serheng Xalid Cîbrî

⁴⁸M. Toker, Şeyh Sait ve Isyani, Ankara 1968, R. 35

de dihate birêberîkirin, yê ku wî alîkarî bi nêzîkkirina Hecî Musa Serokê Eşîra Motka ligel Rêberîya Sazmendîyê de dida bikirin, (Hecî Musa Endamê Wênerê Encûmenên Helbijartîyî berê ji bona Kongirê Erzeromê di sala 1919 de bû).

Herwehaji Serheng Xalid Beg alîkarî ji bona nêzîkkirina Xalid Hesenan Beg Serokê Eşîra Hesenan ligel Rêberîya Sazmendîyê de date bikirin⁴⁹.

Pêrejî wî keftileft ji bona wergirtina dildarîya hin ji Serokên Eşîrên din jî didate bikirin. Di vê pêla hanê de komel bi pêkanîna hin ji rêxistinan di nava sipah de hate biserkevtin, ku wê di karîbû hin ji Evseran ber bi bal xwe ve bide bimêldarîkirin. Di nava van Evseran de hin ji Evserên Îraqî dihatin bidîtin, ku weha bi vî rengî ve alîkarîya bi rêxistina pêwendiyê ve ligel Bexdad û Helebê de hate bikirin. Ji alîyê din de Rêberîya Komela Serxwebûna Kurdistanê ji bona beşdarîkirina desthilatîyên cihîyî hevalbend û herwehaji pêrejî Serokên Eşîrên Rojhilatî Welêt jî ji bona vê beşdarbûnê jî ji bona Jêhatbûnên xwe wan didate bixebatkin.

Ev gavên hanê -li gora bîr û bawerîya wan de-ji bona bi serketina xebata çekdarî ve, ji bona bi cihanîna armancên komelê pêwist ve dahtin bidîtin⁵⁰.

⁴⁹Xalid Hesenan Beg Serokê Eşîra Hesenan bû û pêrejî wî Rêberîya çar gurdanên "Hemîdîyan" dida bikirin. Xalid Beg piştigirtineke mezin ji Eşîra xwe, Eşîra Hesenan didate biwerdigirtin, ya ku ew bi sedan ji Suwarên Çekadarn dihate bipêkhatin

⁵⁰Hisên Berzanî. Partî û Sazimendiyên Civakîyî kurdî di xebatê de ji bona Çarekirina pirsîyarîya Kurd (Nameya Doktora) Mosko 1976, R. 45 (bi zimanê Rusî).

Weha di nava van Kesên hanê de, ku komelê ji bona wergirtina dildarîya wan didate bixebatkirin, Şêx Seîd bi xwe bû, yê ku ew li Kurdistanê Turkî de pir bi xwedan desthilatî ve dihate biderkevtin⁵¹.

Cihê civakîyî bilindî Şêx Seîd û dewlemendîya wîyî gewre bi hoyên biryara Rêberên Komelê ji bona pêwendîyê ligel de hate biderkevtin û herwehaji ji bona karkirinê ligel wan de ew hate bibangkirin. Di dawîya havîna sala 1923 de Yusiv Dîya (yekek ji Rêberên tevgera kurd û Endamê Parlemanê yê berê ji dêlva Bedlîsê ve) serdanek ji bona Şêx Seîd li Xînê de date bikirin.

Di vê dîtina hanê de ew ji bona guhestina ragiyandinan bi hev re li ser bi hev ve hatin bigihaştin û pêrejî ji bona bi rêk û pêkxistina rabûnên wergirtî ve ligel hev de der barê bi rêxistina raperîna Kurdî jî ve li ser de bi hev re hatin bigihaştin. Di zivistana sala 1923-1924 de Rêberên Kurdan li Palo de civînek xwe dane bilidarxistin, ku têde biryarîyek bi pêwistkirina jêhatîkirina tevgera kurdîyî veşartî danr biwergirtin.

Endamên tevgerê û hevalbendên wêna jimara wan her û her ber bi bêtirbûnê ve dihae biçûyîn. Bi niyaza nehiştina guhpêketina desthilatîyê Rêberên tevgera Kurdî di civînên biçûk de biryarîyên xweyî veşartî datin biwerdigirtin. Ji bona nimûne, Yusiv Dîya di buhara sala 1924 de li Erzeromê de li nik Xalid Cibrî Beg de hate "mêvandarîkirin" û ew ligel hev de di vê civîna hanê de ji bona bi çekkirina Eşîrên Kurdî ve bi carekê ve bi hev re hatin bigihaştin.

⁵¹M. Toker. Şeyh Sait. Ve Isyani, R. 311

Herwehaji li ser yarmetiya Şêx Mehmed û Ismaîl Axa Simko de, yê ku ew li derveyî Turkîyê de dihatin bijîyandin, ew bi hev re hatin bigihaştin, pêrejî ew li ser rêkirina bîrxistinekê de ji bona Bihevgerêdana Netewan de di rêya Surî re bi daxwaza jê ve ji bona pêşkeşkirina yarmetiye ji bona kurdan bi hev re hatin bigihaştin. Weha di pişt re Dîya nameyek ji Cibrî Beg ji bona Şêx Seîd li Kosmar (Melbenda Xînê) de date bînin, piştî vê wî serdan ji bona heremên cuda, nala Xokso, Hacı Umer Tukman, Xok Oxlân, Qarî Ofa û Farto date bikin û wî Serokên Eşîran li ser van biryarîyên wergirti de dane biagehdarkirin⁵².

Di payîza sala 1924 de Yusiv Dîya bi Istenbolê ve hate bigihaştin û wî ligel Endamên Partîy Komarî Pêşverû de date bidan û bisitandin⁵³.

Herwehaji wî ligel Mirovên dîni bi nav û deng ve ji beramberên Mustafa Kemal date bipêwendikirin.

Rewşen bû, ku jêhatbûna Rêberên Kurdan guhpêdana desthilatîyên Turkî bi ber xwe ve bide bikişandin. Herwehaji ji ber xwe hin ji Serokên Eşîra "Xormîkî" Kurdî

⁵²M. Şerif Firat, *Dogû illeri ve Varto Tarihi*, Ankara, 1961, R. 126

⁵³Partiya Komarî Pêşverû di çirya paşî de sala 1924 de hate bidamezirandin. Serokê wê Kazim Qere Bekir Paşa bû û Sikreterê wê Gîştî Ali Fuad Paşa bû. Bernameya Partî li ser: "Pêşveketina Civakî", "Rastkirinê", "Rêzlegirtina Oldarî", "Nenawendikirin" û pêrabûnên Rastkirîyên din de di nava xwe de dida biwergirtin. Hin ji Cîgerên (Kurdan) yê berê di vê Partîya hanê de Endambûn, ku vêji hişt, desthilatîya vê Partîyê di Wilayetên Rojhilatî Welêt de bête bixurtkirin

desthilatîyên Turkî li Anqera de li ser kar û barê raperînê de û li ser likarxistina wêna de bi rengêkî veşartî ve datin bagehdarîkirin.

Bi fermaneke xweser ji bal Mustefa Kemal de desthilatîyên Turkî Yusiv Dîya û Xalid Cibrî Beg dane bigirtin û ew di bin çavdêrîyeke tûnd û tûj de ji bona Bedlîsê dane birêkirin, da ku ew li wê derê de ji bona Dadgeha Serbazî bêtin bipêşkeşkin⁵⁴.

Herwehaji Hacı Musa Endamê berê di Encûmena Wêneran de hate bigirtin. Wisajî pêrabûnên din jî ji bona girtina hinên din ji Kurdên Welatperwerên nas hatin bidanîn⁵⁵.

Weha helbijartina Cihgerê Xalid Cibrî Beg û Yusiv Dîya di Rêberîya Komelê de pir bi pêwist ve dihate biderkevtin. Weha bi vî rengî ve helbijartina Şêx Seîd nala Serek jêre (ango Komela Serxwebûna Kurdistan) hate bikirin. Wehaji pêrejî Komelê biryarek bidestpêkirina raperîneke giştî û azadîkirina Girtîyên Sîyasîyên Kurd ji Zindanên Turkî date bigirtin. Bi alîkarîya karmendên kargeha berîd û birûskê ve li Xencê (Wilayeta Bingolê) de Şêx Seîd dikarîbû agehdariyê li ser name û birûskên guhestî de di navbera Berpirsiyarên Turkan de bide bikirin. Herwehaji Şêx Seîd bi çavdêrîyeke taybetî ve li pîrskirinên, yên ku ew ligel Xalid Cibrî Beg û Yusiv Dîya de dihatin bikirin, dikarîbû bide

⁵⁴M. Şerif Firat. Dogû illeri ve Varto Tarihi, R. 27

⁵⁵Di avdara sala 1925 de Xalid Cibrî Beg bi gule barandinê ve dane bikuştin, lêbelê Yusif Diya bi sêpiyê ve dane bidarvekirin.

bitemaşekirin. Lêbelê gava Dadgeha Qadê li Bedlîsê de dest bi dadgehkirina Girtîyan date bikin, weha desthilatîyan pêwistîya bangkirinê ji bona Şêx Seîd ji bona Dadgehê nala "Çavbînekî" bi başî ve date bidîtin. Lêbelê Şêx Seîd verêkirina dû ji bal Dadgehê de, da ew li ber wê de nala Çavbînekî bête bidîtin, jiber rewşa xweyî tendurûstî û mezinbûna temenê xwe date bivegerandin, ku ew ji bona hatina wîna ji bona Bedlîsê rê pê nadin bidan⁵⁶.

Weha ji vê têtê bidiyarkirin, ku desthilatîyên Turkî berî girtina Xalidê Cibrî li ser jêhatbûnên Komela Serxwebûna kurdistanê de bi agehdar ve nedihate bidîtin.

Weha Lawê Şêx Seîd, Alî Riza di çirîya paşî de sala 1924 de bi serdanekê ve ji bona Diyarbekir û Helebê hate birabûn, da ku ew li wê derê de li ser rawestandina likarxistina raperînê de ligel Rêberên kurdên din de ji bona lihevhatinkê bête bighaştin. Weha wî li wê derê de civînek ligel wan de date bikin, ku têtê piranîya Kurdên bi nav û deng ve ji Turkiyê, Îraqê û Suriyê de têtê hatibûn bibeşdarîkin. Di vê civîna hanê de li ser rewşa Kurdistana Turkiyê de bi dûr û dirêjî ve hate bigiftûgokirin, ku têtê Beşdarvan. bi hev re bi yek bawerîyê ve hatin bigihaştin, ku ew jî eve bû:

Girawkirina mafeyê Milî ji bona Miletê kurd bes û bi tenha ve di rêya raperîneke çekdarî de dikare bête bicihanîn. Herwehaji pêrejî ew li ser destpêkirina dema raperînê de li Kurdistana Turkîyê de di 21. avdara sala 1925 de (Roja Cejna Milî-Newroz) hatin bilihevhatin. Pêrejî wan di vê civîna hanê jî de Encûmena Serkirdayetîya raperînê datin

⁵⁶Akşam 19. 8. 1925

bihelbijartin⁵⁷.

Di pişt re Alî Riza di 15 çirîya paşî de sala 1924 de ji bona Istenbolê hate biçûyîn û wî li wê derê de Kurdê bi nav û deng ve Seyid Abdul-Qadir date bidîtin. Alî Riza di vê dîtina hanê de ligel wî de li ser rewşa Wilayetên Rojhilat de date biaxivtin.

Herwehaji wî ji bona wî dîtînên Encûmena Rêberîya raperîne û pilanên wê û ligel jî de wî dîtina xwe li ser pilanên Rêberên Kurdan de li Heleb û Îraqê jî de jê re date biraxistin.

Weha Seyid Abdula-Qadir li ser Alî Riza de date bipêşkeşkirin, ku tevgera Kurdî serûştîyeke oldarî pê bête bidan û wî date bizanîn, ku dê ew -wê çaxê- bi tevaya hinera xwe ve tev li tevgerê de bête bikirin. Di pişt re wî hin çapemenîyên dij bi Mustafa Kemal bi wî date bidan, da ku ew wan li Wilayetên Kurdî de bide bibelavkirin.

Alî Riza bi carekê ve ev pirs û remanên hanê, pêrejî pilana raperîne û pevçûnên veketî di navbera Kurdên Sunî û yên Qezilbaş de, Qezilbaşên ku bi beşdarbûna xwe ligel raperîne de nadin bidaxwazîkirin, ji bona Beşdarvanên civîne, ya ku di destpêkirina befirbara sala 1925 de li gundê Fereq Xan de li (Melbenda Palo) de⁵⁸ hate bigirêdan, date biveguhestin. Di civîne jî de hate bigotin, ku ne beşdarbûna Eşîrên Qezilbaşên rûniştî li herema Farto (Wilayeta Mûş) û

⁵⁷M. N. Dersimi, Kurdistan Tarihinde Dersim, Haleb. 1925, R.174

⁵⁸M. Ş. Firat, Dogu illeri ve varto Tarihi, R. 129

li Xinês (Wilayeta Erzerom) de ango hebûna dijiwariyan beramberî raperînê têtin biderketin. Tevî ku Şêx Seîd bi rabûna rakişandina van Eşîran jî ber bi raperînê ve hate birabûn, ew bi ser ve nehate bikevtin. Herwehaji ew bi rabûna rakişandina Eşîrên Dêrsimê ve ber bi raperînê hate birabûn, lêbelê jî ev pêrabûnên wîyî hanê jî bi ketinê ve hatin birûkirin⁵⁹.

Di vê dema hanê de bi xwe jî ve ji bona likarxistina pêgirtîyî raperînê diji desthilatîya Turkî di pir Wilayetên Rojhilatî Welêt de hate bidestpêkirin. Herwehaji gift û bêj di nava Serokên Eşîrên Dêrsimê de li ser xebatkirinê de ji bona rizgarkirinê ji bin nîrên Turkî dihatin bikirin. Ligelvêjî piran ji wan siyaseta hajbûnê dane biwergirtin û berjewendiyên xweyî taybetî dane bihelbijartin.

Weha ew li ser xewin û nigaşan de bi siyaseta Kemali ve beramber bi pirsîyarîya kurdî ve dihatin bîponijandin. Di nava wanên piştgiirtvanên vî berê hanê de Endamê Civata Gelê Turkiyî Bilind Wênerê Dêrsimê Hesên Xeyrî di hate bidîtin. Herwehaji hinên din dihatin bipeyda kirin, ku wan rawestandîneke cuda ji ya Hesên Xeyrî, nemaze Beytar Nûrî Dêrsimî, Seîd Rîza dabûn biwergirtin, yê ku wan piştgiirtina çarekirîneke bi ngehî ve ji bona pirsîyarîya kurd didatin bigirtin.

Herwehaji li aliyên wan de hin ji Mirovên Kurdên bi nav û deng ve dihatin bidîtin, yê ku wan bi sozên desthilatîyên

⁵⁹S. S. Aydemir, Tek Adem, Mustafa Kamal, Cilt 3, İstanbul 1966, R. 225

Turkî ve ne didane bibawerîkirin û di xebata çekdarî de wan ji bon bi cihanîna mafeyên Milîyî Miletê kurd ve bi tenha ve rê didatin bididîtin. Tevlivêjî Eşîrên Dêrsimê ligel tevgera Şêx de ne hatin bibeşdarîkirin.

Wê gava ku Kurdên Rojhilatî Dêrsimê raperîneke giştî dane bilikardixistin, hinan ji Rêberên Eşîrên Dêrsimê ligel hev de li ser Şûnkarîyê de di Civata Gelê Turk de didane bipevçûnîkirin. Weha bi vî tonî ve wan alikarîyeke gewre ji bona kemaliyan dane bipêşkeşkirin, yên ku wan di dijûnên heyî de di nava Eşîrên Kurdan de ji xwe re dane bikaranîn û weha bi vî corî ve wan siyaseta xweyî dujminayeti beramber bi Gelê Kurd ve datin bicihanîn.

Di vê pêla hanê de bêzarbûn di nava Xelkên Wilayetên Rojhilat de her û her bi bêtir ve dihate biderkevtin. Evaya bi diyarî ve hate bidiyarkirin, gava ku serdana Şêx Seîd jê re hate bikirin, bi sedan Kurdên çekdar tev li wî de hatin bikirin. Herweha tevaya Xelkê bi germbûn ve lê datin bipêşewazîkirin.

Di nava nîvê duwemî meha befirbarê de ligel Şêx Seîd de komeke pir ji Şêx, Mele û Maqûlan serdana Navînîya Wilayeta Dar Ahîne (Xenc) û Melbenda Licê û Xanê datin bikirin⁶⁰.

Di 5 reşemeha sala 1925 de Şêx Seîd ji Xanê ligel sed Suwarî û Komekê ji Serokan de ber bi gundê Pîran ve hate birêvekevtin⁶¹. Ew bi Pîran ve hate bigahiştin û bi Mêvanê

⁶⁰M. Toker, Şeyh Sait ve Isyani, R. 37

⁶¹Gundê Pîran di Melbenda Arxanê de li (Wilayeta Bingolê) de tête bikevtin.

Birayê xwe Ebdul-Rehim ve hate bikirin.

Di vê şeva hanê bi xwe de Sitvanê Yekem Husnî Efendî ligel Sitvan Mustefa Asim û bi 15 Serbazan ve bi mala Ebdul-Rehman ve hatin bigihaştin. wan ji Şêx Seîd bi berdestkirina deh Kurdan ve, yên ku ew bi kuştinê ve hatibûn bitawanbarkirin û ew li nik mala Mirovekî de di bin navê Behrî de têtin bidîtin, datin bidaxwazîkirin. Li ser vê daxwazê de Şêx Seîd date bibersivkirin:

"Em û wan ligel hev de bi vir ve hatine bigihaştin, em û wan Hevalê yek rê bûn. Ez hêvîdikim, bi hebûna min ve li vir de dê hûnê tu ziyanan bi wan ve nedin bikirin. Piştî ku ez ji vî cihê hanê çûm, wê çaxê, li gora dilê xwe de hûn çi dixwazin, ji xwe re bidin bikirin"⁶².

Şêx Seîd ji wan date bidaxwazkirin, ku ew ji bona wan Kesan destdirêjyê nedin bikirin, lêbelê Evserê Turkî date bizanîn, ku ew nikare hîç rêzekê li Kesekî de bide bigirtin û ew bes û bi tenha ve li ser ronahîya Qanûnên Komarê de dide bikarkirin û ferman bi berdestkirina Tawankaran ve date bikirin.

Gava fermana Evser nehate bicihanîn, pevçûnek çekdarî di navbera Xelkên gunde û Komekê ji Evseran de di bin Seroktîya Husni Efendî de hate birûdan. Hin ji wan hatin bikuştin û yên mayî hatin bidîlkin.

Weha vê pevçûna hanê, ya ku ew li gundê Pîran de di sala 1925 de hate birûdan, rê liber bernameya raperînê date

⁶²M. N. Dersimi, Kurdistan Tarihinde Dersim, R. 176

bibirîn.

Bi rastî jî ve Şêx Seîd didate bididîtin, ku kurd ji bona pêrabûna raperîneke giştî hêjî ne hatibûn bilikarxistin; jiber vê jî wî dev ji gundê xwe date biberdan û ji bona gemkirina tiştê rûdayî û ne hiştina belavbûna wê li cihên din de wî berê xwe ber bi Xencê ve date bivekirin.

Lêbelê gava Birayê wî Tahir bi wan bûynînên li Pîran de hate bipêzanîn, wî di dehê reşmehê de Berîd li Licê de date bigirtin. Di yazdehê resmehê de ew ligel dused Mirovan de ji bona nik Şêx Seîd li Xenc de hate bihatin û wî dirav û belgeyên girtî ji bona wî dane bidan. Weha ev herdu bûynînan hanê nala bi destpêkirina raperîne ve têtin bidîtin.

Di bin van rewş û zînetên hanê de li ber Şêx Seîd de hîç bêtir nema dihate bidîtin, ku ew bêje: "weha tete bîdiyarkirin, ku evaya Qedera me ve tete biderkevtin"⁶³.

Weha ew di rastîya rastî de bi Rêberê raperînekê ve hate bidanîn, ya ku ew bi berî sitewandina xwe ve hate bivêketin.

Di çardehê reşmehê de Şêx û Hevalbendên wî, yên ku jimara wan ji deh hezar Kes bêtir dihatin biderkevtin, bajarê Xenc dane bivegirtin⁶⁴.

Herwehaji Parêzvan û Karmendên Turkî hatin bidîlkin û Serokê Eşîra Modan Feqê Hesenan nala Parêzvan ji bona

⁶³M. Ş. Firat Dogu illeri ve varto Tarihi, R. 132

⁶⁴M. N. Dersimi, Kurdistan Tarihinde Dersim, R. 177

Xenc hate bidestnîşankirin û Qanûneke taybetî hate biderkevtin, ku pê bajarê Xenc nala Paytextê Demîyî Kurdistanê û herwehaji ji bona her Kurdekî Bawermend hate bidanîn. Pêrejî pê tevaya desthilatîyên oldarî û dunyayî jî ji bona nava destên Şêx Seîd hatin biveguhestin û hate bipêwistîkirin, ku tevaya bac û Dîlan ji bona Xenc bêtin birêkirin⁶⁵.

Pêrabûnvanên raperînê bangek dane bibelavkirin, ku ew tede hılanîna bêşa "Dehikan" ya pîs û pir giran li ser milên Xeklê de datin bidazanîn û wan ji dêlva wê alîkarîya Şûreşgeran bi zad û qût ve ji Xelkê datin bidaxwazkirin. Vî karê hanê li nik Cemawerên Cotkaran de pir deng date biwergirtin û weha pîranîya mezin ji wan ji xwe re çek beramberî desthilatîyên Turkî dane bihilgirtin⁶⁶.

Di demeke pir kurt de serhildanê erdên pir fireh li ber xwe de ji xwe re date bivegirtin. Weha wan çar Wilayetên Rojhilat ji xwe re datin bivegirtin⁶⁷.

Kêrên bi zor ve têtin biderkevtin, yên ku wan di pêla pêşî de alîkarîya bi serketina raperînê ve dane bikirin. Dibe, ku dijiwarîya rêyan û pîrbûna çîyan û newalan alîkarîya Şureşgeran dane bikirin. Pêrejî di him katî jî de kelemên pir mezin di pêşîya livandina Sipahê Turkî de hatin biafirandin.

⁶⁵M. N. Dersimi, Kurdistan Tarihinde Dersim, R. 177

⁶⁶S. S. Atanasiv, Rewşa Kêmanîyên Milî li Turkiyê de. Yerîvan 1963, R.54

⁶⁷S. S. Aydemir, ikinci Adam, Ismet Ünûnû Cilt: I. Istanbul 1968, R. 308

Herwehaji suwarkirina Milîyî heremên, yên ku li ser wan de raperîn dihate bigerandin, bi qazanca Şûreşgeran ve dihate bidîtin. Ji bona nimûne, di Wilayetên, yên ku Şûreşvanan ew dabûn bigirtibûn, şeşsed hezar Kurd di wan de dihatin bidîtin, ango ewan sê carî li jimara Turkan de dihate biderkevtin.

Ligelvêjî de di heremê de sed hezar Çerekesî, bi serdeji Kêmanîyeke Milîyî Erebi û Yekeke dinî Ermenî dihatin bijîyandin. Zaruwên van Kêmaniyên Milî ligel Şûreşgeran dihatin bidildarîkirin.

Weha pir li wan de bi çekên xwe ve xwe tev li Şûreşgeran dane bikirin û mil bi milan ve diji sitemkarîyê, ya ku wan ji bal desthilatîyên Turkî de didatin bihildigirtin, dane bişerkirin. Van kar û barên hanê bi hev re bi komel ve alîkarîya bi serketîna tevgerê ve di pêşîya wê de dane bikirin.

Weha Armstong dide binivîsandin:

"Raperîn li Kurdistanê de hate bivêketin. Tevaya Wilayetên Rojhilat jî di bin tîrsa vê raperînê de têtin bidîtin. Weha Textê Komarê bi hejandina ketina xwe ve tete bidestpêkirin⁶⁸.

⁶⁸H. C. Armstrong, Grey Wolf, Mustefa Kamal, London 1934, p. 264

Birêveçûna Raperînê

Di nîvê reşmeha sala 1925 de Şêx Seîd hêzên Hecî Hesen û Omerê Faro û herwehaji Eşîrên Mustan û Botan di binarê çiyayê Koçeran de di bin Rêberîya xwe de date bixistin. Herwehaji di bîstê wê mehê de bi xwe ve wî Licê û Xanê jî date bivegirtin.

Weha hêzên Salih Beg (ji Xanê) tev li wî de hatin bikirin û herdu bi hev re di gelîyê Xanê re ber bi Diyarbekrê ve hatin birêkevtin. Di bîstûheştên reşmehê de li ser pesarên Diyarbekrê de, hêzeke mezin ji hêzên Şêx Şemsi-Dîn tev li wî de hate bikirin. Di wê demê de bi xwe jî ve, di bîstûnehên reşmehê de, Şêx Abdul-Rehman, Birayê Şêx Seîd li melbenda Madenê (Wilayeta El- Ezîzê) de beramberî Turkan bi ser xwe ve hate birabûn. Lêbelê Şêx Eyûb ligel 500 Şervanî de li Cirmîk (Wilayeta Diyarbekrê) de tev li Şêx Abdul-Rehman de hate bikirin. Û ji wê derê ew ligel hevdû de ber bi Erxenê de hatin birêkevtin.

Weha di bîstûheştên reşmehê de bajarê Palo nala bargeh ji bona Şêx Seîd û Sipahê kurdî, yê ku jimara wî di wê çaxê de bi bîst hezar Serbaz ve dihate biderdiketin, hate bidanîn. Li vê derê jî de wan agehdariyên xwe li ser hêzên kurdîyî karker de li Mêrdînê, Erxenê û Madenê de ji xwe re didan biwergirtin.

Li vê derê jî de divê bête binîşankirin, ku bi serkevtin û pêşveketinên Kurdan ve ne li ser encama hêrîşeke rêxistî de ji bal hêzên Sazmendî de dihatin bikirin.

Şêx Seîd Sipahsalar ji bona Sipahekî Sazmendî ne bû, lêbelê ew ji bona hêzên Eşîrên Kurdî Rêber bû, yên ku ew di pêşîya pêşî de ji bal Şêxan de dihatin biserokkirin. Li gora pêşkevtina Kurdan di rabûnên xwe de Xelkên cih tev li wan de dihatin bikirin. Her gava ku wan naverasta cihê Xelkêyî civandî didane bivegirtin, wan Serpereştîyeke nuh didate birakirin, ku hin caran ev Serpereştîya hanê ne weke divayîbû dihate bidanîn.

Tevliêvî ev rûnkirina nîşakiriyî tê divê bête bidiyarkirin: Ji dema vêketina raperînê û tanî hatina Ismet paşa li ser desthilatîyê de di 3 avdara sala 1925 de bi Serkevtinên Leşkerî li alîyên Kurdan de dihatin bidîtin. Weha bi diyarî ve tête bieşkerekirin, ku Xelkên heremên rizgarkirî di bin kêra Şêx Seîd de bûn û Hevalbendên wî bûn. Wisa Şêx Seîd ji bona rizgarkirina dîn ji nava Destên Serdarên Enqerayî Xwedan Nenas date bibangkirin. Weha wî bi vî rengê hanê ve armanca rastîyî raperînê ji bona Cemawerên fireh date bipoşandin:

ku ew jî di pêkhatina Dewleteke Serbixwe de û di Paytexta wêyî Amedê de dihate bidîtin.

Û li vê derê de bi xwe ve kêmanîya cewherî di politika Şêx Seîd de tête bidîtin. Jimareke pir ji Rêberên Kurdan hîç guh bi giringbûna nuhî banga Şêx Seîdî Oldariyê ve nedidan bidan, herwehaji wan ji bona ketina qada ceng û şer ji bona oldariyê hîç nedidane bidilkin.

Weha Rêberên kurdan didane biniyazkirin, ku ew Dewleta Serbixwe piştî rizgarkirina Amedê bidin bidazanîn Lêbelê Amed berên şeran ji bona kara desthilatîyên Turkî date biveguhertin. Şêx Seîd hate biliberkevtin, ku hêzên wî ji bona vegirtina Amedê naytên bitêkirinn. ku ta ew demê

bi destên xwe ve bide bixistin, wî ligel desthilatîyên li wir de dest bi gift û goyînê ve date bikin, belkî Welatperwerên kurd di hundurê bajêr de bi raperînekê ve bikaribin bêtin birabûn. Berpirsiyarên li Amedê -Diyarbakir- de, Parêzer Alî Cemal (Bîrdacî), Serleşkerê Parêzgeh Kazim Paşa û Serleşker Mursul Paşa hemû deqên giring li bajêr de ji xwe re dabûn bigirtin û bendewarîya yarmetiyên didan bikin. Weha desthilatîyan belavkirina çekên li ser Xelkên bajêr de dane binayînkirin. Sipah bi serêxwe ve wergirtina parastina bajêr bi ser milên xwe ve date bihildan. Û jiber -ku Berpirsiyaran berdestkirina bajêr dane binayînkirin, weha Şêx Seîd di destpêkirina avdarê de hêrîş ji bona ser bajêr date bibiryarkirin. Destêyên Kurdê çekdar bi çekên nêçîrê û tivingên mawzer ve û hinên din bi daran ve bi dizî ve xwestin ji bona nava bajêr bêtin bitêkevin. Weha di şeva yazdehê avdarê de Desteyek ji Şervanên neqandî di rêya Dergehê Mêrdînê de xwe bi bajêr ve bidin bigihandin û ew tev li Hevalbendên Şêx bûn, yên ku ew ligel hêzên Turkîyê ji wan pirtir de bi şer ve hatin bikevtinû wan didan bibangkirin: "Bijî Serxwebûn, Bijî Kurdistan".

Di şerekî germ de bi hêzên ve ne mînahev sed û pêncî Kurd hatin bikuştin, yên mayî hinan ji wan di bin tarîya perda şevê de xwe ji bajêr dane bidûrkirin û hinên din ji bona nava malên xwe li bajêr de hatin bivegeriyan.

Piştî bi serneketina Şêx Seîd ve di vegirtina Diyarbakirê de wî ji bona hêzên xwe fermana vegerandinê date biderkirin.

Rewş û zîneta hêzan roj bi roj ve bi xerabtir ve dihatin biderkevtin. Weha ew ji alîyê Jorî de bi çil hezar Serbaz û ji

alîyê Jêrî de bi sî hezar Nefer ji hêzên Dewletê dihatin bigemardanîkirin. Wê çaxê Şêx Seîd bi rabûneke bê hêvî ve ji bona Civandina Rêberên Kurdan û Serbazkirina Mînegê Mirovanî û Diravî bi niyaza başkirina rewşa raperînê ve hate birabûn.

Weha ji bona nimûne wî di nameyeke xwe de ji bona Birayê xwe Şêx Abdul-Rehman û Şêx Ismaîl date binivîsandin:

"Weha min di demjimara çaran de ji roja îrê nameya weyî mêtûkirî di 19 Şabanê (15 avdarê) de sala 1925 de date biwergirt. Herwehaji ligel wê jî de nameya Şêx Mohemed Reşîd jî min date bidîtin. Hûn tede dibêjin, ku Bozan Axa û Şêx Eyub ji bona Kara Bexnec hatin bigehastin û hûn dixwazin, ku ez jî xwe bi wê ve bidim bighandin. Min dixwest, ku ez serdana we bikim bikirin. Lêbelê berî niha min Reşîd Axa ligel sed Suwarî de ji bona anîya Rojhilat date birêkirin.

Herwehaji ez îro pêşbînîya hatina Eşîra Nêrxîyan dikim bikirin, -heger Xwedê xwest- dê ezê wan jî ji bona anîyê bidim rêkirin. Herwisajî min Şêx Tahir û Şêx Sirac jî ji bona hindaman dane birêkirin, da ku ew derd û kulên Şervanan bidin bikêmbikin, lêbelê ew hêjî nehatine bivegerandin. Piştî vegerandina wan dê ezê li vir de bi hin rabûnan bêtîm birabûn û wê çaxê dê ezê ber bi heremên we ve bêtîm birêvekevtin, da ez ji bona pêrabûna gift û bêja ligel Bozan Axa û Şêx Eyub bikim bikirin

" Ez we bi bînfirêhbûnê didim biamojgarîkirin û Şervanan didim bitemînîkirin, ku ew xwe li gora ayînîrêya Musulmantîyê bidin bilivandin. Ji wan bîxwazin, ku ew xwe

dûrî talankirina malên Musulmanan bidin bikirinn. Lêbelê weke min di nameyeke xweyî berê de daye binîşankirin, di pêwistîya pêwist de yarmetîyê ji anbaran bidin biwergirtin, divê hûn bawernameyekê bi wergirtinê ve bidin bidan; jiber dê emê ji wan Kesê yarmetî hatîye biwergirtin, çi ser bi ser ve yanî bi pûl ve ji wan re bidin bivegerandin .

Bendê Şervanan Mohemed Seîd Al-Neqşebendî ⁶⁹.

Lêbelê xebata Rêberên raperînê ne dikarîbû Hêrîşa hêzên Turkî pir bidin birawestandin.

Di vê pêla ku hêzên Turkî xwe nêzîkî pesarên Diyarbekrê didane bikirin, hêzên Şêx Seîd bi vegerandina xweyî ber bi dolên Xanê ve datin bidestpêkirin, li wir de Desteyên Şêx Abdul-Rehmanî revyayî li Erxenê de tev li wî de hatin bikirin. Piştî liberxwedaneke kurt de Raperînvana duçarî vegerandinê ji bona Darahînê hatin bikirin. Herwehaji li wê derê jî de ew ji bona Koman hatin bibeşkirin û ew di nava daristanên Xenc, Palo û Cebaqcûr de xwe dane biveşartin. Weha Şêx Seîd ligel Şêx û Serokên Eşîrên Darahîne de di 27 avdarê de ji bona Cebaqcûr hatin bigihaştin. Li wê derê de wan çavdêrîya hatina Ebdula, Şafî û yên din ji Şêxên El-Ezîzê, Farto û Kêxî didan bikirin⁷⁰.

Hêzên Turkî bi hêrîşeke givaştî ve di 26 avdarê de li heremên Diyarbekir, Farto û El-Ezîzê de hatin bipêrabûn û li ser vê jî de Leşkerê Yekemî Turkî bi nava bajarê Farto ve

⁶⁹Akşam. 27. 4. 1925

⁷⁰M. Ş. Firat, Dogû illeri ve Varto tarihi, R. 134

hate bikevtin.

Weha Serleşkerên Turkî dixwestin, ku ew Raperînvanan ji her çar semtan têweredan bidin bikin, da ku ew li pêşîya wan de rêya çûna Îraqê, Suryê û Îranê li ber wan de bidin bigirtin⁷¹.

Ji hoyên ku alîkarîya pêşketina Sipahê Turkî dane bikin, alozî, rav û rûtkirina li bajarê El-Ezîzê û yên din de ku ew hatin bikin. Herwehaji cudabûnên ku di nava Rêberên Kurdan de hatin bipeyda kirin û veguhestina hinan ji wan Rêberan û hin ji Serokên Eşîran ji bona alîyê Turkî de, yên ku ew hatin biveguhestin, (nemaze Serokên Eşîrên El-Ezîzan) yên ku ew hatin biveguhestin.

Ji bona nimûne, Maqûlê Eşîrê Necîb Axa ji (Oxa) û Begên El-Ezîzê, herwehaji Eşîrên Rojhilatî Dêrsimê Kefîran, Lolan, Abûrolan û Soran di bin Serokê Ayînî de Doman Diyo Oxlu Hisên de, yên ligel Turkan de dane bialîkarî kirin û bêbextîya tevgera kurd dane bikin. Pêrejî wan ji paş hêzên raperînên ligel Şêx Seîd de dane bixincer kirin. Di dawîya dawî de Raperînvana duçarî vegerandinê ber bi Palo ve di 1 cotan de hatin bikin, yên ku hêzên Kazîm Paşayê Sipahî xwe nêzîkî wan didane bikin⁷².

Beşê mezin ji Kurdan (nêzîka pênc hezar Kes) ber bi dola Mindo ve hatin bivegerandin û ji bona gurdanê kazîm

⁷¹S. S. Aydemir, Tek Adam, Mustefa kamal. Cilt 3, R. 226

⁷²M. N. Dersîmî, Kurdistan Tarihinde Dersîm, R. 187

Paşayî pêncem bose dabûn bidanîn. Di 3 cotan de şerekî germ hate bivêketin, rojeke rebeq wî date bidirêjkin û têde hêzên kurd bi qehremanî û pehlewani ve şer didane bilidarxistin. Lêbelê tevlivêjî de ew duçarî kişandina xwe ji bona dolê û penabûna xwe ji bona nava Daristanê hatin bikirin.

Lêbelê Şêx Şerif ligel Peyên xwe de ber bi Cebaqcor de çûn û ew tev li Şêx Seîd bûn. Di 6 cotan de hêzên Dewletê Cebaqcor dane bivegirtin. Weha Şêx Seîd ligel Hevrêyên xwe de, yên ku jimara wan sêsed Suwar di hate biderkevtin, duçarî vegerandinê ji bona Selxanê bûn.

Weha Eşîra Xormik piştî desthilatîyên Turkî dane bigirtin. Ji bona nimûne, Serokê Eşîrê Kuçu Mohemed Xolyusê Efendî xwe ligel sêsed çekdarî de li bin Destên Turkan de dijî Raperînvanan date bidanîn. Herwehaji Birayê wî Alî Kemal sed Suwar ji bona Turkan date bipêşkeşkin.

Weha hêzên Turkî ligel Eşîrên Hevalbend de dikarîbûn hêzên Kurd ji Eşîra Cubran li deştên Farliyova de bidin bibezeandin. Herdu Serokên Eşîrê Bobo û Xito ligel pêncî Suwarî ber bi herema Sun ve hatin bivegerandin û li cihê Eşîq Meydan de ew tev li Şêx Seîd de hatin bikirin.

Serleşkerên Turkan pîrozbayî ji bona Serokên Eşîra Xormik û Xelkên Kixê dane birêkin, yên ku wan alîkarî ji bona hêzên Dewletê dane bipêşkeşkin. Herwehaj birûska Mustefa kemal Serekê Komarê ji bona Parêzerê Erzeromê Zohet, Çavdêrê Leşkerê sêyem Kazim û Sertîpê Tîpa Yazdehan Osman Nurî hate bipêşkeşkin⁷³.

⁷³M. Ş. Firat, Dogû illeri ve Varto Tarihi, R. 138

Di dawîya avdara sala 1925 de Xalid Hesenan, Alî Riza, Xalid Cibrî û yên din ji Serokên Kurdan ligel hezar Suwarî duçarî vegerandinê ber bi Rojhilat de piştî şikestina hêrîşê li ser Xîns de hatin bikirin⁷⁴.

Di vê dema hanê de hêzên Turkî li Qerqoşê de bi alîkarîya Serokên Eşîra Heyderîyan Kurd ve ji nuh ve duçarî şerekî germ ligel xwe de hate bikirin.

Weha Xalid Hesenan ji bona buhurandina sînore Îranê hate bineçarîkirin. Dewleta Îranê pêşewazî li Kurdên Raperîvan de bi hesin û agir ve date bikirin. Weha bi vî rengî ve Lawê Xalid Hesenan, Şemsi-Dîn, Lawê Şêx Seîd, Ebas, herwehajî Serokê Eşîra Zergan, Kerem û yên din ji Raperîvanan hatin bikuştin.

Weha Xalid Hesenan Beg, Alî Riza û ligel yên mayî de ji Şervanan tev li Rêberê Kurd Simko de hatin bikirin⁷⁵.

Hoyê şikenandin û bipaşvegerandina Kurdan li hemû hereman de di pêşîya pêşî de di givaştina likarxistina xweyî Dewletê de di warê Serpereştîyê de, Ramyarîyê de û Leşkeryê de ji bona temirandina raperînê tete bivegerandin.

⁷⁴Kanîya pêşî, R. 143-145

⁷⁵M. N. Dersimi, Kurdistan Tarihinde Dersim, R. 178-179

Pêrabûnên Yasayî û Sipahîyî wergirtî ji bal Serdarên Turkan de ji bona nabûdkirina Raperînê

Bi cudabûna pêşbînîya desthilatîyên Turkî ve bi tengbûna Raperînê ve ew weha di pêşî de di nava Wilayetên Rojhilat û Jêrî Rojhilatî Welêt de hate bibelavkirin. Lêbelê rojnamên Turkî piştî çend rojan ji destpêkirina raperînê, weku jêre bi "Rûdanên li Xenc" dibêjin, datin binivîsandin. Tevî ku Dewleta Turkî li ser tevgera kurd de li Rojhilatî Welêt de agehdarbû, lêbelê wê mezinbûna gewdeyê wê bi vî rengê hanê ve lê pêşbînî nedidate bikirin. Hoyê vê ji bona ser nûçeyên başbînî dihatin bivegerandin, yên ku ew ji bal rojnamên Turkî dihatin bibelavkirin.

Herwehaji daxuyaniyên mîrîyî bi derew ve, yên ku ew ji bal desthilatîyê dihatin biderketin, bi lezbûna nabûdkirina "tevgera Şêxî Kevneperestî" ve didan bizanîn. ji bona nimûnê, di 18 reşmeha sala 1925 de, di cîvîna Parlemanê Turkî de, Wezîrê Hundur bersivê li ser pîrsa Wênerekî de dide bizanîn, "ku li Xenc de Rêbirek bi navê Şêx Seîd ve ligel Hevalbendên xwe de li heremê de rav û rûtkirinê dide bikirin, lêbelê pêrabûnên pêgirtîyî wergirtî ji bal Dewletê de dê bi leztirin dem ve wî bide binabûdkirin"⁷⁶.

Di vê babeta hanê de, Merov dikare peyvdarîya Anis Beg, Pêrabûnvanê Kar û Giriftanê Turkî li Mosko de bide binîsankirin, yê ku ew dibêje:

"... Ev tevgera hanê tu metirsîyê li ser Dewleta Turkî de

⁷⁶B. Cemal, Şeyh Sait Isyani, Istanbul 1955, R. 39

nade bipêkanîn, herwehaji ew zînetê Welêt nade bitêkdan. Şêx Seîd di bin perda durujmên oldariyê de serê xwe daye bihildan; jiber vê jî dibe, ku hin ji Kevneperestan li Turkîyê de ligel vê tevgera Şêx Seîd de dildariyê xwe bidin biderxistin, lêbelê Cemawerên Gelêrî jî vê tevgerê pir bi dûr ve têtin biderkevtin. Ez hîç lêgûmanê nadim bikin, ku dê ev tevgera hanê jî nala raperîna Eşîra Abor di sala çuyî de bête binabûdkirin, herwehaji hîç gûman têde nayête bidîtin, ku Şêx Seîd jî dê bi lez ve bête bixistin⁷⁷.

Weha bi vî tonî ve daxuyanî û pevdariyên Mîrîyî Turkî wisa dihatin biderkevtin. Û ew weke diyarin, bi lezbûna bi dawîanîna rûdanên di Rojhilatî Welêt de zor başbînî ve dihatin biderkevtin, herwehaji di him kafî jî de ew li ber metirsiya zînetê de dihatin bikevtin. Jibervêjî wan destên xwe jî bona pêrabûnên pêwist jî bona nabûdkirina raperînê datin biavêtin.

Di derengîya paşîya şeva 22 û berbeyanîya 23 ji reşmehê de Civata Wezîrên Turkî civîneke ji nişkêve di bin Serokîtiya Serekê Komarê de date bilidarxistin. Di vê civîna hanê de Sercengoş Fewzî Paşa (Çeqmaq) jî têde hate bibeşdarîkirin, civînê yek biryar date biderxistin, ku ew jî ev bû, Rewşa Jirêderktî dane bidazanîn û herwehaji xistina herema raperînê jî bona mehekê di bin Dadgehên Serbaziye de dane bibiryarkirin. Civata Tevaya Turkî li ser wê biryarîya gotî de pê hate birazîkirin. Weha di biryarîyê de hatîye binivîsandin:

Raperîna ku diji hêzên Turkîyî çekdar li beşekî de li

⁷⁷"Sibehilata Rojhilat" 1. 3. 1925 (bi zimanî Rusî)

Wilayeta Erxenê de hatîye bivêketin û Diyarbekir, El-Ezîz û Xenc jî dayite bivegirtin, herwehaji jiber li nik wê de karîna firehbûnê tete bidîtin, weha jibervêjî Dewletê dayite biryardan, ku ew Rewşa Jirêderketî li Wilayetên Mûşê, Erxenê, Dêrsimê, Diyarbekrê, Mêrdînê, Orfa, Siwêrekê, Sêrtê, Bedlîsê, Wanê û Hekarê de, herwehaji li herema Kîxê, Xinês li Wilayeta Erzeromê de dide bizanîn⁷⁸.

Di bîst û çarên reşmehê de Komekê ji Cîhگیرên Partîya Gelî Komarî civînek ji xwe re datin bigirtin, ku tede Serokê Wizaretê Fethî Beg û Wezîrê hundurû Cemîl Beg li ser rûdanên Xenc de datin bipeyvînkirin. Vê carê Mîrza Fethî Beg ew bi "Rêbirên Rêyan" ve nedan bipesinkirin, lêbelê wî li ser "Cewhera Kevneperestîya Raperînê" de hate bigûmankirin, herwehaji wî date binîşankirin, ku Şêx Seîd ji bona pêkanîna Dewleteke Kurdistaniyî Serbixwe, bicihanîna Ayînrêyê, vegerandina Xilafetê û bangkirina xebatê ji bona herifandina Rêstika Bêxwedaniya li rastê de dide bixebatkin⁷⁹. Tevaya Peyvbaran di civînê de dana bibêgûmankirin, ku raperîn bi kevneperest ve tete biderkevtin û ew di pêşîya pêşî de ji "Xwîngermiya Oldarîyî Korî Kurdan" û navtêdana Bêganan ji bona wan hatîye bikirin.

Piştî gift û bêjê li ser rewşa Rojhilatî Welêt de Mehmûd Esed Beg, Wezîrê Dadperwerîyê, Pirojeyê Qanûnê, yê ku ew dê ji bona Wizaretê bête bipêşkeşkin, date bixwendin. Di wî Pirojeyî de tete binivîsandin :

⁷⁸Hakimiyeti milliye, 24. 2. 1925

⁷⁹M. Toker, Şehy Sait ve Isyani, R. 22

Weha rojnamên Ermenî datin bizanîn, ku di pişt re hîç Ermenîyek lê nema hate bitengavkirin. Di pişt re nêzîkbûnê di navbera Sazmendîyên Ermenî û Kurdî de li derve de dijî

¹²⁹Gazet 5. 3. 1925

Politîka Zordariya Milî li Turkîyê de date bidestpêkirin.

Piştî nabûdkirina Şûreşê û kuştina Rêberên wê dest bi azardana Xelkên kurd û Ermenîyên bêguneh ve hate bikirin. weha Sipahê Turkî rav û rûtî datin bikirin û gund didan bisûtandin, Kal û pîr, Pîrek û Mendal didan bikuştin û bigurandin.

Weha bi vî rengî ve Armstrong rastîya vê azardariyê beramber bi Kurdan ve dide bidiyarkirin, gava ku ew dide binivîsandin:

"Kurdistan bi Şûr û Agir dane bivegirtin, Mirovan didin biazardan û bidarvekirin, gund didin bitalankirin û bisûtandin, Pîrek û Mendal didin bikuştin û bigurandin, dek û dolab li ser serên Kurdan de didin bigerandin, Serbirînê ji wan re didin bilikarxistin, ku hovîtiya rijandina xwînê deha bêtir ji ya pêrabûna Sultan derbarê Yunanîyan, Ermenîyan û Bolgaran de tête biserkevtin... Bi biryarekê ve bi kêfa xwe ve ji Dadgehan Kurd têtin bidarvekirin, bisorgonkirin û bizindankirin"¹³⁰.

Wehajî nameyên rêkirî ji bal Komelên Aşûrîyan de ji bona Hevgirêdana Netewan di gelawêja sala 1925 de li ser dirîtiya Sipahê Turkî û azardana wîna de ji bona Xelkê dane bipeyivandin¹³¹.

Piştî vemirandina raperînê û di navbera salên 1925-1926 de bi sedan gund hatin biwêrankirin, bi hezaran mal hatin bişewitandin, bi hezaran Xelkên bêguneh, ji Pîrekan, ji

¹³⁰H. C. Armstrong, Grey Wolf, Mustefa Kamal, R. 26

¹³¹Asia Française Paris 1926, 238, R. 86

Zarokan û ji kalan hatin biderkirin û bikuştin.

Tevî li van kar û baran tevan jî de rastgarîya Miletê Kurd ji dîtina ber çavên Sazmendiyên Cîhanî nala Hevgirêdana Netewan jî dûr hate bihiştin.

Vaye, ev bangeke ji yek bangekê tête biderkevtin , ya ku ew ji bal yekekî ji Merovkî Kurdîyî bi nav û deng ve di mêjûwa 25 gelawêja sala 1925 de ji bona Hevgirêdane Netewan re hatiye bipêşkeşkirin. Ev banga hanê ji bal Ahmed Alî Hac Sebrî de hatiye birêkirin:

"Vaye, du meh derbas bûn, lêbelê hêjî Şapên Xwînê li Welatê me de têtinn biherikandin, Miletê Kurd hêjî di bin barê Sitemkarîya Hovberan de tête bixûzkin.

Weha gava ku wî nema dikarîbû jê bêtir vê Zordarîya hanê li ser xwe de bide bihilgirtin, wî bi neçarî ve destên xwe dirêjî hilgirtina çekan date bikin, da ku ew bi azadî sernivîšta xwe bi destên xwe ve bide bixistin.

Ev xebata ku me pê dayite bidestpêkin, Hebûna me di Ayinde de dide bigirawkirin û weha dê em her û her li ser vê xebata hanê de bêtin biçûyîn, tanî ku em bi carekê ve ji Dewleta Anqera bêtin birizgarîkin.

Miletê Kurd bi xwedan Reha Arî ve tête biderkevtin, ew bi hîç pêwendîyekê ve ligel Turkan de ne bi Koka xwe ve, ne jî bi Reweşt û Rewenda xwe ve û ne jî bi zimanê xwe ve tête bitêkelkirin.

Ne pêtpêkirina Dewletên Rojavayî bi Kurdan ve Dewleta Anqera li ser bicihanîna Ramyarîya Nabûdkirina Kurd de nav pê tête bidan, ya ku wê bi serketî ve beramberî

Ermenîyan date bicihanîn.

Tevgera me bi xwedanê serûştîyeke Milîyî diyar ve tête biderkevtin û Miletê Kurd ji Hevgirêdana Netewan û Gelên Pêşveketî dide bidaxwazkirin, da ku ew pêşkeşkirina alîkarîya bi kêr ve û bi lez veji xwe re bidide bigirtin. Destdirêjkirina Dewletên Rojava jêre ne bes tenê nala ve bi erkeki Mirovanî ve tête biderxistin, lêbelêji ew bi pêwistîyeke Siyasî jî tête nîdîtin; jiber ku Gelê Kurd nala Girawkirina Aştîyê di Rojhilata Navîn de tête biderxistin"¹³².

Lêbelê Hevgirêdana Netewan hîç li ser yekekê de ji van bangên hanêyî pir neda bibersivkirin, hêjbêtir ji vê jî Hevgirêdana Netewan di gelawêja sala 1925 de biryarek bi Ne lênerîna Pirotêstên Kurdan ve ji yên dij bi pêrabûnên Dewleta Turkî ve beramber bi Kurdên Raperînvanan li Kurdistana Turkîyê de date biwergirtin.

Bi Hovîti vemirandina raperînê di sala 1925 de û bidarvekirina jimareke pir ji Rêberên wê bi tundî ve ji bal Xelkên kurdistana Jêrî de hate bitawanbarkirin. Ji bona nimûne, di 26 gelawêja sala 1925 de di Baxê Mirinê de li Bexdadê de Kurdan ji bona dagirtina pir Cemaweran dijî dirîtiya desthilatên Turkî beramber bi Kurdan ve dane bibangkirin.

Beşdarvanên wê civînê birûskek ji bona Hevgirêdana Netewan û Serdarîyên Dewletên Mezin dane bilêdan, ku wan têde ji bona alîkarîya Kurdên Turkîyê dane

¹³²Gazet 29. 6. 1925

bibangkirin¹³³.

Herwehaji Kurdên Sûlêmanîyê, Kerkûk, Hewlêrê û yên bajarên din li Kurdistana Îraqê jî de dane bipirotestokirin, lêbelê Kurdên Îraq û yên Îranê nedikaribûn yarmetîyeke bi kêr ve ji bona Kurdên Turkîyê bidin bipêşkekirin.

Weha raperîna Şêx Seîd Şopeke pir kûr di mêjuwa Miletê Kurd de bi xwe ve date bihiştin, ku evaya bi diyari ve di Wêjeya Kurd de hate bieşkerekirin. Herwehaji ew di jimareke pir mezin de jiberkirinên Şairên Kurdan de hate biwênekirin.

Dibe, ku destana Şairê Kurdê bi nav û deng ve Pîremerd ji tevan bi nav û dengtir ve bête bidîtin. Di vê destana hanê de Şair Dewleta Turkî nala "Mekînakê dide bidanîn, ya ku ew li Kurdistanê de nikarê bide bikarkirin, heger ku ew bi xwîna Gelê Kurd jî ve neyête bidonkirin".

¹³³Rojnama "Jîn" 22. 5. 1961, ji nivîsta Kemal Mezher Ahmed, tevgera Rizgariyî Welatîyî Kurd li Kurdistana Îraqê de, hatîye wergirtin

Serûştîya Raperînê

Raperîna Şêx Seîd di mêjûwa Miletê Kurd de him ji alîyê firehbûna xwe de û him jî ji alîyê rêxistina xwe de bi bê hempa ve tête biderkevtin.

Di lêvenerandina hoyên vê raperînê de cudabûn û gift û goyên pir di rojnameyên Turkî û yên Rojavayî de hatin bidîtin. Ew bîr û bawerîyên hanê ne li ser bingeheên Zanistîyê de dihatin biavakirin, lêbelê wan kêfdilya germî wan Siysîyan didan biwênekirin, yên ku li ser raperîna Kurd de di pêşîya pêşî de, ji destpêkirinê li gora berjewendîya Welatê xwe, Çînîya xwe û Desteyê xweyî Civakî de lê didatin binerîn. Di rojnameyên Turkî de di wê pêla hanê de li ser hoyên û Serûştîya raperînê de cudabûn dihatin bipey dakirin.

Weha dîtinekê raperîn nala talaniyekê ji bal Eşîrên Hov de date biderxistin. Weha bi vî rengî ve di vî babetê hanê de rojnama "Tanin" date binivîsandin:

"Belê raperîn bi xwedan bîr û bawerî ve dihate biderkevtin, lêbelê çî bîr û çî bawerî ev Xelkên Hovên Koçer dikarin wan bidin bigewdekin... Ger reman bikarîbana bi nav Mejîyê wan ve bihatana bikevtin, dê wan ev karên hanê nedana bikin... Ev Hişên Xav û kal, yên ku ew Nezanîyê, Sawilkîyê û Sofitîyê ew ji Remanê û Hişîtiyê dane bibêpişk û bibêparkirin; jibervêjî bes û bi تنها ve ew ji bal yek bîr û bawerî de ew jî bi rav û rûtkirin, şelandin û

talankirinê ve pê têtin bizalkirin"¹³⁴.

Bîr û bawerîya duwem kanîya wê dihate bivegerandin, ku hoyê bingehî ji bona rabûna raperînê di xwîngermîya Oldarîyî Kurda de tête biderkevtin. Insiklopêdiya Turkî dide bigotin:

"Hin ji Siyasiyên Xayin, Nokerên Biyaniyan... Xwîngermbûn ji alîyekî de datin bivêxistin û soz ji bona Çiyayîyan bi talankirina Xelkên bajaran ve ji alîyê din de hate bidan, ku ev bi hoyê rabûna raperînê ji bona ew bête bilidarxistin"¹³⁵.

Xwedanê vê bîr û bawerîyê bêgûmankirin, ku Cotkarên Li paşvemayî Şêx wan didin birêberdikin û ew dijî Serdarîya Komarê di bin navê vegerandina Xilafetê û Seltenetê de didin bixebatkin... Da ku ew rastîya vê bîr û bawerîyên xwe bidin bibêgûmankirin, wan bi mehne ve dane bianîn, ku raperîn ji bal Şêx û Hevalbendên wî de dihate birêberîkirin. Hêj ji vê jî bêtir wan derew dane bibelavkirin, ku Wênerê Dondeyên Sultanê Turkîyî Xistî di raperînê de tête bibeşdarkirin.

Ev bîr û bawerîya hanê rexne bi xwe jî ve nikare bide bihilgirtin. Berî her tiştî mîna ku me berê li jor de date bigotin, yê ku wan ji bona raperînê rê didan bixweşkirin, ne şêx bûn, lêbelê "Komela Serxwebûna Kurdistanê" bi xwe ve dihate biderkevtin, ya ku ew ji bal Mirovên Kurdên bi nav û deng û zana ve mîna Serhengê di Sipahê Turkî de

¹³⁴Tanin 28. 2. 1925

¹³⁵Hayat, Insiklopêdisî Cilt 20, Istanbul, R. 4359

Xalid Cibrî Beg, Rojnemevan û Mirovê Kurdîyî Civakîyî bi nav û deng ve Kemal Fewzî û yên din dihate birêberîkirin û xebat di bin navê "Bicihanîna Ayînê" de roleke biçûk beramber bi Durûjmê Serekî: "Serxwebûna kurdistan" ve date bilîstin.

Weha ma dê ji bona çî bi vê ve Kurd ji bona qazanca Xulefa bi raperînê ve bête birakirin, hêjbêtir ji bona Mirovekî nala Lawê Sultanê Berê Abdul-Hemîdê Duwem Kurd bi vê ve dê çîma bi rabûna raperînê ve bidin bîdestpêkirin? Heger di hin pêlên demên dûr de tevgerên Kurd dijî Xilafetê, Seltenetê û "Turkiya Genc" de hatine bidîtin, weha ma gelo çîma dê niha xerîb bête bidîtin, heger ku Kurd jî li pênavê rizgarkirina xwe de ji Zordarîya Milî di Serdema Şiyarbûna Asiya de, di Serdema Şûreşên Rizgarîya Welatî de, ew jî bi rabûna bi ser xwe ve neyêtin biraperîn? Bi giştî ve Xwîngermbûna Oldarîyê rojekê ji rojan ew ne bi nîşana kurdan ve hatîye bikirin.

Weha pir ji Eşîrên Kurdî bi nav ve Musulman bûn; jiber Rêçên Musulmantîyê di nava Kurdan de divabûn di pêşî de bêtin bipêşveketin. Herwehaji di tevgera raperînan de hin ji Eşîrên ne Musulman jî mîna Yezîdîyan, Zazan û hin din jî têde hatin beşdarîkirin.

Ev oldarîyên hanê, yên ku ew beşekî mezin ji bîr û bawerîyên Filetîyê û Bêxwedanîyê di nava xwe de dide binavdikin, pir caran di nava xwe de ligel hev de didin bişerkirin. Mêjûwa tevgera azadîxwazîya Kurd her û her daye binîşankirin, ku Kurdan li dûhev de xebat beramberî desthilatîya Sultan û dam û destgehên wî dane bikirin. Ev dam û destgehên ku di nava sedan sal de ramyarîya

zordariyê beramberî wan li ser de hatîye biçûyîn.

Weha ev tevde bi hev re bi diyarî ve didin bilêgûmankirin, ku Xulefa û Sultanen tiştêkî diyarî li ber çavan de ji wan re pê nedane bianîn.

Weha bi veğerandina desthilatîya Xanedanî -Orostikratî- ye dida biderxistin, ku ji nuh ve careke din Dewleta Biyokratîyî Nawendî dihate bivejandin, ya ku ew mafeyê Miletên din dide binayînîkirin. Vêna bi xwe jî ve ji bona kurdan jî ramyarîya zordariyê û nebûna mafeyên Milî dida biderxistin.

Hîç gûman têde nayête bidîtin, ku di bin Durujmê Rêzgirtina Musulmantiyê de Rêberên Kurdan ji xwe re datin bixwestin, ku ew desthilatîya Şêxan bi karanîna wî Durujmî hanê ve ji bona remanên xweyî Milî bidin bikaranîn; jibervêjî wan piştgirtina Xelkên Musulman û ligel wan jî de ya Turkan bi xwe jî ve dane bimisogerkirin. Jibervêjî divê bête biwergirtin, ku li Turkiya li paşvemayî de, nemaze di Wilayetên Rojhilat de û di yê Jêrî Rojhilat de hêjî cudabûnên Çîniyatî bi diyarî ve di nava wan de nedihatin biderketin û bi taybetî ve ew di Civaka Kurdî jî de ne dihatin biderketin.

Weha bi vî rengî ve tevgera welatîyî Kurd xwe karîbû di nava perda oldariyê de bide bipoşandin. Ev bûyînen hanê bi carekê ve didin biderxistin, ku durujmê "Rizgarkirina Oldariyê" ji Kemaliyan bes û bi tenha ve Raperînvanan nala Tektîkekî ji xwe re di xebata xweyî Ramyarîyî -Siyasîyî- Milî de dane bikaranîn.

Weha pir bi kêmbûn ve têtê biderkevtin, ku qîje qîja bêgûmankirina rojnameyên Mîrîyî Turkî li ser kevneperestîya raperîna Şêx Seid de di serîyan de bidin bixistin, herwehaji pêrabûnên wê bi her awayekî ve nav bi derew ve beramber bi tevgera welatîyî Kurdî bidin bidûxistin.

Ev bi serûştî ve dihate biderkevtin, ku Kemalîyan pirsîyarîya kurd didane bikaranîn û wan keftileft didane bikin, ku ew raperîna kurdan beramber bi bîr û bawerîya Giştî ve çi li hundur û çi li derveyî welêt de bi nav û nîşanên cudayî nebaş mîna: Paşvemayîna Kevneperest, Hovîfî, Talankerî û Xwîngembûna Oldarî pê didan bipêvekirin.

Di dawîya dawî de bîr û bawerîya Sêyem têtê bigivaştin, ku raperîn jiber dek û dolabên Bêgane nemaze yên Ingilîzî hate bivêxistin.

dibe, ku Merov vê bêja hanê di bin pir mercan de bide biwergirtin. Di vî babetê hanê de peyvdarîya Cîgerê Partîya Komarîyî Pêşverû ji Erzeromê Reşîd Paşa ji bona rojnamên Turkî di 26 reşmeha sala 1925 de pir guh ber bi xwe ve date birakişandin:

"... Derbarê Goya Destdirêjîya Bêgane ez bi xwe ve bi rastîya wê ve pê nadim bibawernkirin; jiber ku Xenc û Mûş pir ji sînor têtin bidûrkevtin. Heger Raperînvana piştî xwe bi yarmretîya derve ve bidana bigirêdan, weha li ser wan de divabû bihata bidîtin, ku ew xwe di heremên sersînora de bidin bilivandin û ew xwe ligel Eşîrên wan hereman de bida biyekkirin; jiber Serpereştîya Turkî li wê derê de ne dihate

bidîtin"¹³⁶.

Weha di dawîya dawî de raperîn ne bi navtêdana derve ve hate bivêxistin, lêbelê ew jiber pêkêrên hundurûyî jêhatî û yên her heyî hate bivêxistin. Yekek ji wan pêkêrên hanê tişt û miştên didin biderxistin, yên ku ew ji bal Wênerê rojnama "Vakit" de Naşid Heqî li Diyarbekirê de hatin bicivandin; jiber ew di civînên Dadgeha Serxwebûnê de dihatin biamadêbûn. Di Peyva Cîgerê Giştîyî Liberxwedanê de hatîye bigotin, mîna ku Wênervan dide biveguhestin:

"hoyê û Kanîya Şûreşa vê dawîyê, ya ku ew li Wilayetên Rojhilat de ji Welatê meyî Turkîyî hermayî hate birûdan, ew bi tûtîştî ji ve yên mîna xwe, yên ku ew li Bosne û Hîrsîk de ji mêja ne dûr de hatin bikirin, nayête bicudakirin. Bîr, bawerî û armancên, yên ku ew ji Şûreşa Kurd dihatin biderkevtin, ew bi xwe jî ve dihatin biderkevtin, ji yên ku wan Surî û Felestin dane bicihêkirin".

Serokê Dadgeha Serxwebûnê bi xwe jî ve di peyva xweyî dawî de berê xwe ber bi Tawanbarên dadkirî ve bi darvekirinê ve yanî bi karên sengînîyî her heyî ve date bivekirin û wî jî wan re date bigotin:

"Hinekan ji we bi mehna pîsbûna Dam û Destgehên Serpereştîya Serdarîyê ji bona raperînê dane bimehnekirin û Hinên din Liberxwedanajî bona Xilafetê dane bimehnekirin, lêbelê Hûn tevde li ser yek pirsîyarîyê de dihatin biyekkirin: Ew jî bi Kurdistaneke Serbixwe ve dihate

¹³⁶B. Cemal, Şeyh Sait Isyani, R. 2

biderkevtin"¹³⁷.

Bi vî rengê hanê ve vî Wênerên Dam û Destgehên Serpereştîya Turkî bi xwe ve di dawîya dawî de bi peyva nîv rastîyê ve li ser palpêdanên rastî de ji bona raperîna kurd bi pêrûniştîne ve pê hatin bineçarîkirin.

Tevlivêjî ma gelo Merov dikare raperîna Şêx Seid bi raperîna Kurdî Milîyî Giştî ve bide binavkirin?

Heger ku em lênerîneke giştî ji hemû alîyên perçeyên Kurdistan lê bidin binêrîn, wê gavê dê bersiv bi nayînkirinê ve bête bidan; jiber ji bona wê piştgirtin ji bal Serokên Kurdên derveyî Turkîyê de nala Ismailê Simko, Şêx Mahmud û yên din nehate bigirtin. Herwehajî raperîn ji bal hin ji Eşîrên Kurdistana Turkî de nala Eşîra lolan, Xurmik, Kurdên Dêrsimê û hinên din jî pišta wê nehate bigirtin.

Hêjbêtir Perçeyekî ji wan xwe bi ser alîyê desthilatîyên Turkî ve dane bixistin.

Di vî warê hanê de li vir de tanî radeyekî cudabûna Oldarî û Rêçî di navbera Eşîran de date bilîstin.

Lêbelê hoyê bingeşî tête bidîtin, ku Piranîyê ji wan, mîna kurdên Dêrsimê ji bona nimûne, bi karîna biserketina raperîna Şêx Seid ve nedidan bibawerkirin; jibervêjî wana ne dixwest, ku ew xwe ji bona nava agirê nemanê bidin biavêjtin.

¹³⁷ nivîsta L. Rambout, Les Kurdeset le droit, Paris, R. 27

Yekek ji destanên tevgera azadîxwazîya Kurd tête bidîtin, ku karê hevbeşîyî yekkirî di nava Rêberên wê de nedihate bipey dakirin, ji yên ku ew li dû qazancên xweyî taybetî de dihatin biçûyîn û di dawîya dawî de wê tevgerêke welatîyî yekgirtî ne date bipêkanîn.

Lêbelê tevlivêjî Merov dikare, na Merov divê raperîna Şêx Seid bi raperînek Gelêrî ve bide bidanîn; jiber piranîya Kûrdan di Wilayetên Rojhilat û Jêrî Rojhilat de û tevaya Desteyên Civakî de di Civaka Kurdan de, ji Gundiyan, ji Rewendan, ji Wênerên Borcuwazîya Bazirganîyê, ji Şêx û Axan, ji Zanevanên Serbazî û yên Bajarî û tanî Barkêşan li Istenbolê de têde hatibûn bibeşdarîkirin.

Serûştîye, ku beşdarbûn di tevgera Kurdî de ji bal van Destên hanê de ne bes tenê ji bona armancên Milî bi tenha xwe ve diahe bidîtin, lêbelê jî herwehaji ji bona armancên xweyî taybetî jî bi xwe jî ve dihate bidîtin.

Lêbelê van rê li ber wan ne dida bidadan, ku ew rêzên xwe bidin biyekkirin, da ku ew bi mêrxasî ve li pênavê Serxwebûna Kurdistanê de bêtin bimirin.

Weha tevî lênerîna tengî Armancên Çînîya Derebegîya Gewreyî Kurd ji raperîna Şêx Seid, mîna raperînên din, yên ku ew berî wê û yên piştî wê hatin birûdan, ew bi xwe ve bi xwedanîyeke Serûştîyî rizgarî ve tête biderkevtin.

Ramyariya Desteyên Serdarên Turkî Beramber bi Xelkên Kurd ve (1924-1939)

Weha Turkîyê piştî beza xwe di Cenga Cîhanî Yekem de pir ji deverên dagirtî bi Xelkên ne Turk ve ji destên xwe date biberdan. Bi vî rengî ve Turkî bi têgihiştina giştî ve nema bi Dewleta pir Milî ve tete bijimartin. Lêbelê tevlivêî pirsîyarîya Milî tede hêî giringbûna xwe nedaye biwindakirin.

Lîsta -1-

Serjimara Suwarkirina Milî di Komara Turkî de

(Li ser bingehe zimanê zikmakî de)*

Milîya	1927		1935	
	Jimara Xelkê	%	Jimara Xelkê	%
Turk	11777815	86.0	13899073	86.0
Kurd	1184446	9.0	1480246	9.16
Ereb	134273	1.0	153687	0.95
Yunan	119822	0.9	108725	0.67
Çerkes	95901	0.7	91972	0.57
Cihû	68905	0.5	42607	0.30
Ermen	64745	0.4	57599	0.35
Laz	-	-	63253	0.40
Gurcî	-	-	57325	0.35
Milîyên din	202373	1.5	203183	1.25
Gîşt	13648270		16157450	

Ji vê xana jimara -1- li ser serjimara sala 1927 û sala 1935 de serjimara Kêmanîyên Milî li dûhev de hatine binîşankirin:

1870825 û 2258377 Kes; jiber di herdu caran de ew nêzîka 14 % ji tevaya Xelkên Welêt didin bipêkanîn.

Di sala 1927 de Kurdan 9 % der sed ji tevaya Xelkên Turkî didan bipêkanîn û di Enedola Rojhilat de 34. 4 % didan bipêkanîn. Weha bi vî rengî ve ew bi gewretirîn Kêmanîya Milî ve li Welêt de dihatin bijimartin. Ji bil vê jî Kurdan li hin hereman de piranî didan bipêkanîn.

Li ser bingehe Tomarkirina Amara sala 1927 de Kurdan 77 % di Wilayeta Wanê de, 75 % di Wilayetên Bedlîs (Morn) û Sêrtê de, 69 % li Diyarbekir û Hekarê de, 61 % li Mêrdînê de û 53 % li El-Ezîzê de didan bipêkanîn¹³⁸.

Serjimara Kurdan li van heremên hanê de berî serhildana Şêx Seîdî sala 1925 de bêtir bû. Lêbelê di encamê koçkirina bi darê zorê ve, ya ku Desteyên Serdar li Welêt de piştî temirandina serhildana sala 1925 de li ser de diçûn, Amara Kurdan li Enedolê de bi renekî tûj ve hate bikêmkirin.

Weha Kemaliyan, piştî ku wan desthilatîya xwe li Welêt de dane bixurtkirin, ji bona guhertina Turkî nala

¹³⁸Li Amara salane ya Statistîk Yillîgi Bergê 5 de, 32/1931. Jimar 21, R. 70/71 bide temaşekirin.

Dewleteke lihevhatî ji alîyê Milî ve di xwestin bidin bikirin, evaya jî bi turkkirina tevaya Xelkê ve wan ji bona wê didane bikeftileftkirin.

Weha bi diyarî ve ramyarîya hilandina Milîyî Desteyên Serdar li Welêt de beramber bi Kêmanîyên Milî ve têtê bidiyarkirin. Evaya bi pir diyar ve di nimûna Xelkên Kurd de bi hemû diyarî ve têtê bieşkerekirin.

Berî em bi raxistina vê pirsê ve bidin bidestpêkirin, bi başî ve têtê bidîtin, ku em bi kurtî ve rewşa milyonek Cotkarên Kurd bidin bixuyanîkirin, yên ku ew azardariyê li ser destên Zemîndarên Kurd de û bi serdejî ve zordariya Milî didin bihilgirtin.

Weha desthilatîya Şêx û Maqûlên Kurdan pir diçû. Wan bi destên xwe ve xûkitî didan biwergirtin, Serdarî didan bikirin û Xelk didan bikuştin...hd. Di 19 kewçîrîna sala 1925 de rojname "Akşam" date binivîsandin:

"Cotkar li nik Derebege de hîç mafeyekî wan niye, -rewşa wanî yasayî weha ye. Lêbelê erkên li ser wan de Merov dikare wan bi pevikekê ve bi serhev ve bide bivekirin: "Tanî mirinê karkirin". Rewşa wanî destanî wan bi zîneteke koletîyî rastî ve dide bigihandin... Xwarina Cotkarî her roj nanê cehî û hin ji keşkê ye. Cotkar şev û roj bê rawestandî ew ji bona dagirtina xizna Derebege didin bixebatkin, yê ku Wênerê wî hinekî ji çandinîyê ji bona Cotkar re dide bihiştin, da ku ew ji birçîbûnê neyête bimirin..."¹³⁹.

¹³⁹Ji Kovara "pirsiyariyên Çandinyê", 1932, Jimar 1-2, R. 124

Cotkar bi dana perçeyekî gewre ve ji berê çandinîya xwe ve ji bona Derebege dihatin bineçarkirin û herwehajî pêrejî wan piştên xwe di nava erdên wî de ji bona demeke nîşankirî beramber bi karanîna hinekî ji erdên wî ve ji bona xwe didin xûzkin. Di wê demê de bi xwe jî ve Xwedancotên Kurd Divabûn bêşekê bi neçarî ve bidin bidan, ku ew bi navê "Omo" ve tête binavkirin. Ji dana vê bêşa hanê jî ew Kes jî, yên ku ew ji xwe re li karekî de li Istenbolê, Zudinfoldak, Izmir û bajarên din jî dihatin bigerandin, ne dihatin biazadkirin. "Omo" ji bal Wênerên Eşîran her salê carekê yanî her du salan carekê ew dihate bidan, Çendbûna wêna li gora hatin û xurtbûna Axê dihate binîşankirin. Herwehajî Axê dikarîbû bêşê bi darê zorê ve bida biwergirtin, heger ku ew bihata bipêwistkirin¹⁴⁰.

Di 19 kewçîrîka sala 1925 de rojnama "Akşam" date binivîsandin, ku kêra Derebege tête bitundkirin, çend em xwe ji Navînên Mezin bidin bidûrkirin. Weha desthilatîya wan li hin deveran de tête bigewrekirin, ku ew renekî desthilatîya Cihîyî Taybetîyî tengalkirî ligel Encûmenên Serdarîya Nawendî de dide biwergirtin.

"Di hin ji heremên çandinyê de (gundên malên Derebege M. A.) di Wilayetên Rojhilat de gava Merov di nava wan de ji gundekî ji bona gundekî din tête biçuyîn, weha Merov pê dide bihestkirin, ku belê Merov di navbera sînorê du Dewletan re tête biderbarskirin. Gava Merov pêrgî Cotkarekên çekdar tête bikirin û ji wan dide bipirskirin, "ma hûn kîne?" Ew wetov didin bibersivkirin,

¹⁴⁰Alî Kemalî. Arzincan... 1932, R. 197

"Em Peyê Filan Axîne"¹⁴¹.

Nabûdkirina Seltenetê di sala 1922 de û nabûdkirina Xilafetê di sala 1924 de ew bi xwe ve ji bona bidestkevtiyên Şêx û Maqûlên Kurdan bi nala lêdaneke pir tûj ve dihate biderkevtin. Herwehaji pêrejî bi nabûdkirina Dadgeha Dadweriyê ne bes Şêx ji hatinên mezin hatin bibêpişk û bibêparkirin, lêbelêjî desthilatîya wanî siyasî jî hate bitengavkirin.

Peyrewê zordarî, yê ku Serdarî ji bona neşînkirina Eşîran û neçarkirina qanûnan li wilayetên Rojhilat de li ser de diçû, bêzarîyeke tûj li Kurdistanê de date bipêkanîn.

Piştî ku desthilatîyên Turkî xwe ji erkên serxweyî biryarkirî li kongirê Lozanê de ji bona parastina mafeyên Kêmanîyên Milî date bidûrkirin, wê bi dûrkirina Zanevanên Kurdan û Merovên bi nav û deng ve ji yên tevgera wîyî rizgarîyî Milî ji Welêt di sala 1924 de date bidestpêkirin¹⁴².

Herwehaji wê Karmendên Turkîyî pir Kevneperest di Şûnkarîyên Serpereştîyê de li Kurdistanê de dane binîşankirin. Weha bi vî rengî ve bi derengixistina dana Moçên wan ji bona wan bertîl û dizîya mal li Kurdistanê de hate bigeş û bigûrbûn, tanî ku ew di rastîya Fermangehên Serdarîyê de li Kurdistan de mîna karekî reweştî dihate biderketin.

¹⁴¹Ji Kovara "pirsiyarîya Çandînyê" 1932, Jimar 1-2, R. 126

¹⁴²L. Rambout. Les Kurdes et le droit, Paris 1947, R. 26

Di vê pêla hanê de divabû Hevgirêdana Netewan li ayinda pirsîyarîya Mûsilê de bida bitemaşekirin. Lêbelê Impiryalizma Ingilîzî Hesteyê Milî li nik Kurdan de ji bona armancên xweyî pîs date bikaranîn. Weha wê ji bona givaştinê li ser Serdarîya Turkî de nav di Şêx û Serokên Kurdan de ji bona serhildanê date bidan. Ev Kêrên hanê tev bi hev re, bi serdejî ve Politîka Şovîniyî Desteyên Kevneperestîya Turkî, ya ku wê Hilandina Kurdan dida biarmanckirin, Kurd ji bona serhildanê hatin bipalpêdankirin.

Di rêbenda sala 1925 de Rêberên Komitîya Erzeromê bi tawanbarîya gerandina Vîlikan ve beramberî Serdarîyê hatin bigirtin, ya ku wê di nava xwe de Serokên Kurdên bi nav û deng ve dida biwergirtin¹⁴³.

Lêbelê di rêya çûna Bedlîsê de bi darê zorê ve ew ji bal Kurdan hatin bivegerandin û wan xwe ji bona nava çîyan dane biavêtin û weha wan ji bona likarxistina serhildanê dane bidestpêkirin.

Li kongirê Helebê de, yê ku Wênerên Kurdan ew di meha befirbarê de di sala 1924 de dane bigirtin, têde roja 21 avdarê sala 1925 de ji bona serhildanê hate binîşankirin. Lêbelê serhildan berî danîna dema xwe hate vbiêxistin. serhildanê di nîvê reşemehê de sala 1925 de di bin Rêberîya Serokê Eşîra Cîbran de Sertîp Xalid Beg de date bidestpêkirin.

¹⁴³Encûmena Erzeromê di bin Serokîtiya Sertîp Xalid Beg de di sala 1922 de hate pêkhatin. Wê Rêxistina tevgera kurd lipênavê pêkanîna Dewleteke Serbixwe de armancdikir.

Pilanvanên wêna durujmên weha: "Serxwebûna Kurdistan", "Vegerandin ji bona Xilafetê" dane berzkirin. Serhildanê bigir tevaya Wilayetên Rojhilat li ber xwe de date bivekirin. "Di nava du mehan de Kurdan deverên Mamurtê, El-Ezîzê, Xarpûtê dane bipakkirin û Parêzvanên Sipahê Turkî jê dane biderkirin û bi lez û bez ve wan xwe bi nêzikî Diyarbêkrê ve dane bikirin. Agirê serhildanê tevaya kurdistanê bi ber xwe ve û Wilayetên Rojhilat bi ber metirsîyê ve date bixistin"¹⁴⁴.

Serdarîya Turkî ji ji tevgera kurd saw pêhate bikevtin; jibervêjî ew bipêrabûnên karên bi lez û bez ve ji bona vemirandina wêna hatin bipêrabûn. Da ku ew rê li ber tevlêbûna Cotkarên Turkên Belengaz de ji bona nava serhildanê bidin bigirtin, Civata Netewê Turkîyî Bilind bi pele ve di 17 reşmeha sala 1925 de bi hilanîna Dehikên Derebege (Bêşa Serbiser) pêhate birabûn¹⁴⁵.

Ligelvêjî de wê şeweyekî nuh ji bona benda yekem ji qanûna Bêbextîya Welêt, ya ku ew di 15 cotana sala 1923 de hatibû bibiryarkirin, (qanûna jimara 556 ya di 25 reşmehê de hatiye biwergirtin) date bibiryarkirin. Ji vê mêjûwa hanê û pêve pêkanîna Sazmendiya Siyasî li ser bingehe Oldarîyê de, herwehaji bikaranîna Oldarîyê ji bona armancên siyasî jî hatin bizinharkirin. Her Mirovên Pêkvanên Sazmendiya wisa bin yaxud Endamên wan bin, ew mîna Bêbextan têtin bidanîn¹⁴⁶.

¹⁴⁴H. C. Armstrong. Grey Wolf. Mustafa Kamal. Lodon, 1934, R. 264

¹⁴⁵Destur, C. 6. Ankara, 1934, R. 99

¹⁴⁶kaniya Pêşî, R. 107

Ev Pêrabûnên hanê beramber bi Rêberên serhildanê ve, yên ku ew durujmê çepelî bi nav û deng ve "Vegerandin ji bona Xilafetê" dane biberzkirin, dihatin biberamberkirin. Herwehaji ew beramber bi Cemawerên Xebatkêşên kurdan ji ve, yên ku wan li pênavê Serxwebûna Welatê xwe de didan bixebatkirin, dihatin biberamberkirin. Weha di livandinên Serdariyêyî hatî de bi diyarî ve li ser vê rastîyê de têtin bimukurhatin.

Di 4 avdarê de Civata Netewê Bilind qanûna jimara 578 li ser parastina Rêstikê de date biwergirtin, ya ku ew li gora wê desthilatiyên Jirêderketî de ji bona beramberkirina tevgerên Gelêrî ji bona Femandaran hatin bidan. Weha Serdariyê piştî wergirtina morkirinê ji bal Serokê Komarê de dikarîbû "Sazmendiye Pîlanker" û "Çapemeniyên Kevneperest", yên ku ew navtêdanê ji bona serhildanê didin bikirin û "Aramiya Giştî û Parêza Welêt didin bitêkdan", bidin biqedexekirin¹⁴⁷.

Riftarên girêdayî bi Mirovên Tawanbarkirî ve bi van Jêhatbûnên joriyîyî wisayî bi navkirî ve ew ji bona "Dadgehên Serxwebûnê" hatin bipêşkekirin, yên ku ew li Anqera û Diyarbekrê de hatibûn bipêkanîn.

Di 7 avdarê de Dagirtina Perçeyî li Welêt de hate bizanîn. Di wê rojê bi xwe ji ve Mustafa kemal bangek date bibelavkirin, ku têde hatiye binivîsandin, Ku tevaya pêrabûnan ji bona nabûdkirina vê tevgera hanê hatine biwergirtin. Ev tevgera ku di bin encamê kêra wan Kesan

¹⁴⁷Kaniya Pêşî, R. 144

de hatîye bikirin, yên ku ew xebatê didin bikirin, da ku ew rûwê xweyî rast û durust li piş perda Oldarîyê de bidin biveşartin. Ew pêve çû û wî date bizanîn, ku li ser hêzên Dewletêyî bi pêgîrî ve wergirtina sûcdarîyên xweser û pêwist ji bona nabûdkirina raperînê têtê biderkevtin û herwehaji nehiştina wan kesa bi xwe ve têtê biderkevtin, yên ku ew "Aramîyê jihev didin bixistin û Hêvîyên Bilindî Netewe pê didin biyarîkirin"¹⁴⁸.

Di mêjûwa 12 avdara sala 1925 de bi vî Zaravayê han ve bi xwe jî ve zinharkirina "Dadgeha Serxwebûnê" li Anqera jî de weha bû. Di vê zinharkirina hanê de hatîye binivîsandin, ku dê Dadgeh "bi sertî ve her Kesê Oldarîyê nala Destikekî ji bona Armancên Siyasî dide bikarkirin, yanjî ew bîr û bawerîya Giştî dijî Rêstika heye dide bihandan, yanjî ew nav di Raperînvanan de dide bidan, yaxud ew xwe ji dema pêrabûna Serbazkirinê dide birevandin, yanjî ew yên din ji bona revê ji Serbazkirinê dide bilibêrxistin û bi vî rengî ve ew di dawîya dawî de yarmetîya Şûreşgêran dide bikirin, ew xwe dide bisûcdarkirin"¹⁴⁹.

Ne bi derewa ve zinhariyê li ser revînê de ji Serbazîyê bi wergirtina Sûcdariya balatir daye bigirêdan; Jiber Serbazên Turkan pir caran ji bona nava Şûreşê didan bibazdan, gava hêzên Serdarîyê ligel Kurdan de bi şer ve dihatin bikevtin. Di dawîya Avdarê de hêzên Serdarîyê, yên ku jimara wan bi 40 hezar Nefer hatibû bigihaştin, di

¹⁴⁸Histoire de la Republique Turque, Istanbul, 1935, R. 188

¹⁴⁹Ji Kovara "pirsiyariya Çandinyê", 1931, Jimara 9-10, R. 108

yek demê de bi hêrişa xwe ve li ser heremên raperînê de ji Bakur, ji Rojava û ji Jêr ve date bidestpêkirin.

Di vê pêla hanê de desthilatîyên Turkî karên pir baş ji bal Impiryaliyên Firensî datin biwergirtin, yên ku ew ji bona Yekaneyên Leşkerên Turkî ji Xakê Surî ji bona lêzîvirandina wan li Şûreşgêran de û vekirina wan ji bona Mêrdînê û Diyarbêkrê rê bi wan ve datin bidan.

Weha hêzên Serdarîyê, yên ku ew bi serketî ve bi jimara xwe ve û bi Destikên xweyî Cengînî ve, dikarîbûn gerdenê li Desteyên Kurdan de bidin bitengkirin û ew wan ber bi newalên di navbera Mûş û Xarpûtê de bidin bipalpêdan.

Di naverasta cotanê de hêza Serekîyî Şûreşgêran lê hate biçardorgirtin û di dola Xencê de hate bitarûmarkirin. Weha Şêx Seîd, Xalid Beg û Rêberên dinî raperînê di dema buhurandina pira Muradcayê de hatin bibigirtin, gava wan xwest bi şev ve ew ji bona Îranê birevin.

Komên dinî mayî ji Şûreşgêran wan xwe ber bi rêzên çiyayê Şeref-Dîn ve (45 Km dûrî Jêrî-Rojavayî Mûşê dikeve) xwe dane bikişandin, piştî ku ew bi bê Rêberî ve hatin bimayîn. Li vê derê de ew hatin bibazinkirin û di pişt re jî ew hatin binabûdkirin.

Lêbelê alozîyan li Kurdistanê de date bidirêjkirin. Jibervêjî di 20 cota sala 1925 de Civata Netewê Bilind dema Dadgehkirinên Jirêderketî ji bona dirêjbûna heft mehên din date bibiryarkirin, yên ku ew berê li herema

serhildanê û Wilayetên Hemsa de hatibûn bidazanîn¹⁵⁰.

Herwehaji pêrejî Civatê hêz ji bona Serdariyê ji bona pêrabûna guhertinan di Dam û Destgehên Serpereştîyê de yên van hereman de dabû¹⁵¹.

Herwehaji dema Civatê karê "Dadgehên Serxwebûnê" li Enqera û Diyarbekrê jî de ji bona Şeş Mehan date dirêjkirin (Ev Dadgehên hanê ji bona Şeş Mehan li gora Qanûneke taybetî hatin pêkhatin) û ji bona "Dadgeha Serxwebûna" li Enqera de mafeyê bicihanîna Dadkirinên bidarvekirinê yên jirêderketî hate dan¹⁵².

Kuştina bi hovîtî ve ji bona Xelkên kurdistanêyî bêguneh date bidestpêkirin. Hêzên Turkî gund didatin birav û birûdikirin û ew didan bisutandin, Pîr û Kal, Pîrek û Menal didan bigurandin.

"Laşên bi hezarn ji Gorîyan zevî û nişîvî dabûn bidagirtin, gund ji koka xwe de hatibûn bikavil û biwêrankirin"¹⁵³.

Armstrong Wêneyekî pir diyar li ser kuştina Xelkên Kurd dide biveguhestin, ew dide binivîsandin:

¹⁵⁰ Destur, Brgê 6, R. 566

¹⁵¹ Kanîya Pêşî, R. 567

¹⁵² Kanîya Pêşî, R. 568-569

¹⁵³ P. G. Uentizon. Mustapha Kamal ou l'orient en Morehe

"Kurdistan bi şûr û agir dane bivegirtin, Mirov dane biazardan û bidarvekirin, gund dane bitalankirin û bisûtandin. Pîrek û Mendal dane bikûştin, dek û dolab li ser serên Kurdan de dane bigerandin. Serbirîn ji wan re dane bilikarxistin, ku hoviîya rijandina xwînê deha bêtir ji ya pêrabûna Sultan derbarê Yunaniyan, Ermeniyan û Bolgaran de tête biserketin... Bi Biryarekê ve bi kêfa xwe ve ji Dadgehan Kurd dihatin bidarvekirin, bisergonkirin û bizindankirin"¹⁵⁴.

Namyên Komela Aşûrî ji bona Hevgirêdana Netewan de di gelawêja sala 1925 de pesnekî pirî hovdarî ji bona harbûna kirinên hêzên Turkî didin bivegerandin.

Di nameya mêjûkirî de di 6 gelawêja sala 1925 de:

... "Ew (Kurd û Aşûrî -Hesretyan-) ji niha û pêve nikarin ji gundên xwe bêtin biderkevtin. Malên wan hatin bitalankirin, ew ji terşên xwe bê pişk û par bûn û li ber Çavên wan Zordarî li Pîrekên wan de dihatin bikirin"¹⁵⁵.

Di pişt re jî datin bibîrxistin, ku Serdarî bi carekê ve guh bi Biryariya Hevgirêdana Netewan li ser girawkirina parastina Kêmaniyên Milî de li Turkiyê de pê nade bikin. Di nameya mêjûkirê de, di 10 gelawêja sala 1925 de ji bal Komela Aşûrî rêkirî de, ya ku li jor de pê hatîye binîşankirin, ku têde wê pirotêsto ji bona Hevgirêdana Netewan û Dewletên Mezin re dijî wêrankirinê û kuştinê, ya ku Serpereştîya Turkî bi renekî rêxistî ve li Kutdistanê

¹⁵⁴H. C. Armstrong. Grey Wolf. Mustafa Kamal, R. 26

¹⁵⁵L, Asie Française Paris, 1926. No. 238, R. 86

de pê dihate birabûn, date bipêşkeşkirin. Di namê de hatîye binivîsandin:

"Turkî bi talankirina mal û malan ve, bi dizîya terş û dewaran ve, bi sûtandina gund û bajaran ve, bi darvekirina... Rêberan ve , bi karanîna darê zorê beramber... bi Xelkên bêguneh ve nayête bitêrkirin... pêrejî ew Kurdên mayî, yên ku ew ji şewitandinê û serbirînê hatine birizgarkirin, bi darê zorê ve wan didin bikoçkirin"¹⁵⁶.

Di namê de hatîye bigotin, ku Turkî Xelkê Dêrsimê, Cezîrê û bajarên din ji bona Jêrî -Kilikya û ji bona Jorî-Samsûn Sinopya didin bikoçkirin. Bi fermanên ji Anqera Pîrek û Zilam ji hevdû dane bicudakirin û ew bi qeflan ve ji bona heremên cuda dane birêkirin. Weha piranîya Zilaman bi rê ve bi gulebarandinê ve dane bikuştin, lêbelê Pîrekên, yên ku ew bi mirinê ve jiber pêrabûnên diritîyê û hovitîyê nehatin bibextiyarîkirin, weha bi wan re bi darê zorê ve hatin birazandin û ew di bazarên bajar û gundên Enedolê de hatin bifiroştin¹⁵⁷.

Van tevan bi hev re bi rast û durûstî ve pilana bi şiyarîyî ve berê likarxistî date biderxistin, ya ku wê nabûdkirina Kurdan didate binîyazdikirin, bi armanca dûrkirina carekedin ve ku hîç Kurd bi raperîneke din ve nema bikaribin bêtin birabûn.

"Dadgeha Serxwebûnê" li 602 Reftaran de di şeş mehên

¹⁵⁶Kanîya pêşî

¹⁵⁷Kanîya Pêşî

hebûna xwe de date bitemaşekirin. Li ser 25 Kesan de û li ser serên tevan jî de Şêx Seîd Pîran bi mirinê ve, li ser 13 kesên din de bi karên Sengîn ve û li ser yên din de bi zindanên, ku ew ji bona dema 15 salan vegiheşt, yaxud biderkirina wan jî Turkîyê ve date bidadkirin. Di dema 1925-1926 de 206 gund hatin biwêrankirin, 8758. mal hatin bişewitandin, 15 hezar Mirovên bêguneh ji Pîrk, Zarok û Kalan hatin bikuştin¹⁵⁸.

Bi servêdejî ve bi hezaran Kurd ve di encamê Koçkirina bi komel ve hatin bimirin, ev Koçkirinên hanê bi pîrbûn ve di bin rewşên zivistanî sar de dihatin bikirin.

Piştî vemirandina serhildanê Desteyên Turkî bi belavkirina goyêke derewîn ve date bilezkin, ku tevger bi xwe ve bes û bi tenha ve bi tevgereke kevneperestî xwîngermbûn ve di hate biderkevtin, ku ew bi navtêdana xweser ve ji bal Dewletên Impiryalî de hatîye bikirin. Lêbelê Insiklopîdiya Turkî dibêje:

"Hin ji Ramyayên Bêbext, Nokerên Biyaniyan... Xwîngermbûn ji alîyekî de datin bivêxistin û soz ji bona Çiyayîyan bi talankirina Xelkên bajaran ve ji alîyê din de hate bidan, ku ev bi hoyê rabûna raperînê ve ji bona ew bête bilidarxistin"¹⁵⁹.

Tevlivêjî divê bête bibîrxistin, ku Piraniya Kesan li Turkîyê de bi van bêjên hanê ve nadidin bibawerîkirin;

¹⁵⁸L. Rambout, Les Kurdes et le droit, R. 28

¹⁵⁹Hayat Ansiklopedisi. C. 20. Istanbul. R. 4359

jiber dayînên din vê rastîyê didin didin bidiyar û binayînkirin.

Debera em awirekê, ji bona nimûne, li ser veguhestina Nardinvanê rojnama "Vakit" Naşid Heqî de ji Diyarbekir bidin biavêtin; jiber li wir de civînên "Dadgeha Serxwebûnê" dihatin bigirtin. Weha di liberxwedana Cîgerê Giştî de hatîye bigotin, ya ku ew ji bal Nardinvanê rojnmaê hatîye biveguhestin :

"hoyên û Kanîya Şûreşa vê dawîyê, ya ku ew li Wilayetên Rojhîla de ji Welatê meyî Turkîyî hermayî hate birûdan, ew bi tutîştî ji yên mîna xwe ve, yên ku ew li Bosna û Hîrsîk de ji mêja ne dûr hatin bikirin, nayête bicudakirin. Bîr, bawerî û armancên wan, yên ku ew ji Şûreşa Kurd dihatin biderkevtin, ew bi xweve bi yek ve dihatin biderkevtin, yên ku wan Surî û Felestîn dane bicihêkirin".

Serokê Dadgeha Serxwebûnê bi xwe jî ve di peyva xweyî dawî de berê xwe ber bi Tawanbarên dadkirî bi darvekirinê ve yanî bi karên sengînîyî her mayî ve date bivekirin û wî ji wan re date bigotin:

"Hinan jî we bi mehna pîsbûna dam û destgehên Serpereştîya Serdarîyê ji bona raperînê dane bimehnekirin û hinên din Liberxwedana Xîlafetê dane bimehnekirin, lêbelê hûn tev de li ser yek pirsîyarîyê de bi yek ve dihatin biderkevtin: ew jî bi kurdîstaneke Serbixwe ve dihate biderkevtin"¹⁶⁰.

¹⁶⁰Ji nivîsta L. Rambout, *Les Kurdes et le droit*, R. 27

Di çaxa derbasbûna Dadgehê de ji bona yekekî ji Tawanbaran ji Fuad Beg re ev pirsê hanê hate birûkirin:

"Çima te Serxwebûn ji bona kurdistanê dayit bidaxwazîkirin, di dema ku te xwendina xwe li Turkîyê de dayite biwergirtin û tu bi Turkî ve dide biaxivtin?"

"Fuad Beg bersiva pirsê wetov date bivegerandin:

Jiber ku ez kurdim û bendwarim, da ku ez Welatê xwe serbest bidim bidîtin. Bi hîç renekî ve pirsîyarîya Kurd nayête biçarekirin, tanî Singoyên Turkî li Kurdistanê de bêtin bidîtin".

Bersiv li ser van peyvên hanê de Serekê Dadgehê Alî Sahib date bivegerandin:

"Jiber ku tu canê xwe li pênavê Serxwebûna Kurdistanê de dide bigorîkirin û tu dev ji zanistîya xwe û sincîyên xweyî bilind ji bona wê bawerîyê hanê dide biberdan, weha dê tu bi xwe ve bête bidarvekirin"¹⁶¹.

Weha di dawîya dawî de hoyê bingeşîyê veşartî di pişt serhildanê de ne di Xwîngermîya Oldarîya Kurdan de û ne jî di navtêdana Impiryalîya Ingilîz de tevî kêra wêyî nekêm jî tete bidîtin.

Serkutkirina serhildana sala 1925 bi renekî hovîtî ve hîç tevgera rizgarîyî Xelkên kurd neda bişikenandin. Weha rabûnên serxweyî cuda di salên hatî de hatin bikirin, yên ku ew ji bal rojname û çapemenîyên Turkî vd bi karên "Rêbirên Rêyan" ve hatin binav û binîşankirin.

¹⁶¹Abdu-Ezîz Ekî. Kurdistan u Kurd Ixtîlalî, Bergê yekem, Bexda 1946, R. 830

Di havîna sala 1926 de Kurdan li Devera Beyazîdê de Tîpekî Peyade datin bibezandin. Herwehaji di gulana sala 1927 de serhildanên Kurdên Çiyayên Sasûnê (Keleha serhildanên Rizgarîyî Gelên Ermenî û Kurdan) di bin Rêberîya Mohemed Alî Yûnis û Kurdên Devera Arçîm de (li ser kenarê Jorî Gola wanê) de hatin bivêxistin, yên ku ew bi regekî hovîtî ve hatin bitarûmarkirin. Pêrejî di wê çaxê jî de jimareke ji serên jêkirî li naverasta bajarê Arçîm de hatin biraxistin¹⁶².

Bi hestkirina Dewleta Turkî bi rizandina zineta xwe ve li Kurdistanê de, ew ligel hêrîşên xweyî serkutkirinê de bi pêrabûnên Polîsiyî Serpereştî ve hate birabûn, da ku ew, li gora bîr û bawerîya wê, canê serbestîyê li bal Miletê kurd de bide binabûdkirin.

Di 19 axlêva sala 1927 de Civata Netewîyî Bilind li ser qanûna jimara 1097 de, ya ku ew bi Koçkirina Kurdan ve ji Wilayetên Rojhilat de ji bona Wilayetên Rojava dide biderxistin, date bibiryarkirin¹⁶³.

Weha di vê qanûnê de hatîye nivîsandin:

"Ji destpêkirina pêwistîyên Serpereştî, Serbazî û Civakî ji bona Serdarîyê desthilatî têtin bidan, da ku ew nêzîka 1400 Mirovan ligel malên wan û 80 malên serhildanvanan de, yên ku ew jiber pêrabûna wan bi tawanbarîyê hatine

¹⁶²D. S. Zaveriv. Ehdes Tarix liwilayetî Şemalî Şerqî Turkiya. Bedlîs, 1947, R. 149

¹⁶³Destur Bergê 8, R. 1668-1670

bitawankarkirin, ji bona Wilayetên bi navkirî ve bêtin bikoçkirin" (Benda Yekem)¹⁶⁴.

Heger ku em weha bidin bidanîn, ku her maleke Kurd ji du Nivşan û bêtir di encamê zalbûna Pêwendîyên Derebegî de û mayên Bavîyî Reh kûrî de di Wilayetên Rojhilat de tête bipêkanîn, weha tevaya Kurdên, yên ku ew bi Koçkirinê hatin biberamberkirin, pir zorbûn.

Lêbelêjî herwehaji tevaya Kurdên derkirî ji cihên xwe jî çend bin, ev rastîya hanê bi تنها ve xwe jî nafka şeweyên dirî dide biderxstin, yên ku Serdarîyên Turkî ji bona nabûdkirina tevgera rizgarîxwazî Kêmanîyên Milî li ser de dihate biçûnyî.

Benda duwem ji qanûnê weha didate bidîtin, ku Koçkirin di dawîya gelawêja sala 1927 de bête bidawîkirin. Lêbelê malên xwedan erd dikarîbûn li malên xwe de tanî dawîya çirya Paşîyî sala 1927 de bêtin bihiştin.

Weha evaya dide biderxistin, ku di pêşîya pêşî de Koçer, yên Perçeyên pir ku ew bi ne aramiyê ve û bi canê şerkirinê ve di nava Kurdan de bi nav û dengîn, herwehji pêrejî Karkerên çandinîyê dane bikoçkirin.

Benda Sêyem didate bidivadikirin, ku destikên guheztinê û qût ji bona "Niyazmendan" ji bona cihê veguheztina wan bête bigirawkirin.

¹⁶⁴Kanîya Pêşî, R. 1668

Lêbelê mîna her car desthilatîyan Kurd ji bona Wilayetên Rojava li ser kîsên wan de dane birêkirin. Herwehaji li gora bendeke taybetî de divabû Kurd li Wilayetên Rojava de bêtin bineşînkirin, yê ku Serdarîyê ji wan re dabûn binîşankirin. Herwehaji ji bona wê derê de Dadkirvanên, yê ku wan dema dadkirinên xwe dabûn buhurandin, datin birêkirin. Herwehaji Civata Wîzaretê dikarîbû rê li ber wan de bide bigirtin, ku ew ligel malên xwe de neyêtin bijîyandin. Lêbelê di pişt re wan dikarîbûn çûn û hatinê li Welêt de bidin bikirin, bêtî ku ji bona wan mafeyê vegerandinê ji bona Wilayetên Orfa û Beyazîdê, yaxud ji bona tevaya Wilayetên Rojhilatê bi rastî ve bête bidîtin. Û ji bona her Kesê ku ew li ser van divabûna de nehata biçûyî, di derbarê wî de benda 526 ji qanûna gunehan dihate bicihanîn¹⁶⁵.

Ji bona Barkirvanan mafeyê dan û sitandinê bi malên wanî veguhestî ve hate bidan (Benda Heftem). Lêbelê beramber bi malên wanî ne veguhestî ve (erd, avanî, enbar...hd.) du sal ji bona Koçkirvanan hatin bidanîn, da ku ew kar û barên xwe di nava van herdû salan de binin bicihanîn. Weha heger ku ew di wê dema nîşankirî de nikaribin kar û barên xwe bidin bicihkirin, weha Serdarîyê malên wan di mezada eşkere de dide bifiroştin û nêrxê wan bi Xwedîyên wanî berê ve dide bidan (Benda Heşt).

Di rastîya rastî de ev karê hanê ji bona malên neveguhestîyî Kurdên Koçkirî nala sitandina bi darê zorê ve dihate biderkevtin. Weha benda nehan didate bidîtin, ku

¹⁶⁵Kanîya Pêşî, R. 1668

Encûmên li her Melbendekê ji sê Neferan bêtin bipêkanîn, da ku ew nêrxê erdan û xaniyên bi ban ve li ser wan bidin binîşankirin. Lêbelê jiber ku di rêzanê de Encûmen ji Karmendên Turkan dihatin bipêkhatin, weha nêrxê hêjakirî ji bal wan de ji bona malên nevegühestîyî Kurdên Koçkirvanan pir ji nêrxê xweyî rastî kêmîtir dihatê biderkevtin. Lê di vî babetî de hêjî bi seyrîtir ve dihatê biderkevtin, ku benda dehîm ji bona Mirovên (Barkirvanên) hanê hêz dihatê bidan, yê ku ew li ser hêjakirîna nêrxbûnê de bihatana bitûrekirin, ku ew berê xwe ji bona Dadgehên Wîlayetên bingehîyî weha bi navkirî ve ji bona ew li Reftarê de bidin bitemaşekirin. Biryarîyên wan Dadgehan bidawîbûn¹⁶⁶. Weha divabû Barkirin bi pîrbûn ve di nava heşt mehan de bihata bidawîkirin.

Evana bi alîyên bingehîyî qanûna jimara 1097 ve têtin biderkevtin, ya ku wê barkirîna bi hezaran ji malên Kurdan ji bona Wîlayetên Rojava, dûr ji gundên wan di Enedola Rojhilat de date bikirin, piştî ku pîranîya wanî mezin mal û milkên xwe ji destên xwe dane biberdan. Herwehaji desthilatîyên Turkî Kurd, yê ku ew di rapêrîna sala 1925 jî de nehatibûn bibeşdarîkirin, ji cihê wanî kokî dane biderkirin. Li ser vî jî de qanûna jimara 1178 têtê bimukurhatin, ya ku ew di 5 befîrbara sala 1927 de ji bal Civata Neteweyê Bilind de hatîye biderkirin.

Weha jê benda yekem dide biderxistin, ku mafeyê Civata Wîzaretê ji bona betalkirîna bi kêrkirîna qanûna

¹⁶⁶Kanîya pêsi, R. 1669

Jimara 1097 ve beramber bi Mirovên barkirî ve ji bona Wilayetên Rojava tête biderkevtin, yên ku ew bi karkirinê ve di raperîna Şêx Seîd de û di Rûdanên hatîyî de di "Birîna Rêyan" de beşdarî nedane bikin¹⁶⁷.

Weha di dawîya dawî de peyv li ser derkirina bi dehan ve ji malên "Serpêçkirîyî-Serhildayî" bi navkirî ve di benda yekem de ji qanûna jimara 1097 de nayête bigerandin, lêbelê ew li ser barkirina giştîyî Kurdan de tête bikin.

Weha pir ji Kurdan, yên ku wan nexwestin ji cihên xweyî makî bêtin birabûn, xwe di Çiyan de dane biveşartin, herwehaji hinên din ji Wilayetên Rojava revîyan, piştî ku wan azarên giran ji "Jiyana Bextiyar" li wir de dane bihilgirtin. Desthilatîyê pêrabûnên pir sert beramber bi Kurdên, yên ku wan serên xwe li ber Ramyarîya wê de dane birakirin, date bigirtin.

Weha benda duwem ji qanûna jimara 1178 bi xurtî ve date biderxistin, ku "Kes û malên ji mêj de li ser rav û rûtkirinê, raperînê û zordariyê fêrbûyî û herwehaji Kes û malên ji heremên Rojavayî ji bona neşînîyê nîşankirî revyayî û yên xwe tev li Rêbirên Rêyan de didin bikin, dê kêra qanûna jimara 1097 wan bi ber xwe vee bide bixistin, heger ku ew di nava sê mehan de ji piştî belavkirina vê qanûnê xwe ji bonadesthilatîyê nedin biberdestîkirin"¹⁶⁸.

¹⁶⁷Destur Bergê 9, Anqera 1948, R. 13

¹⁶⁸Kanîya Pêşî, R, 140

Jiber Hîç yekek ji Kurdan, ji yê ku ew ji bona xebatê birabibûn, bi vê qanûna hanê nehatin bixapandin, weha ew di pişt re ji bona şeş mehên din hate bidirêjkirin¹⁶⁹.

Tevlivêjî hîç encamekî hêvîkirî ji bona Serdarîya Turkî nehate bidan. Di sala 1927 de Wezîrê hundurû Şukrî Kaya di Civata Netewê Bilind de li ser guhertinên şêweyên Serpereştîyê de di Wilayetên bi Kurdan nişînvana ve date bizanîn. Weha Wilayetên El-Ezîzê, Orfa, Bedlîsê, Hekarê, Diyarbekrê, Sêrtê û Mêrdînê di heremeke taybetî de di bin Rêberîya Cîgerê Giştî de li ser encamê wan guhertinan de hate bidanîn. Di wê salê jî de bi xwe ve Serdarîyê amojgarî "li ser desthilatîyên Cîgerê Giştîyî Wilayetên Rojhilat de" date biderkirin. Van pêrabûnên hanê kar û barên rêxistî "li Cihên Eşîrên Koçer û veguheştina Cotkar û Zevîvanan de ji bona Xwedîyên erdan didatin bidivakirin, yê ku wan di nava wan de didatin bikardikirin"¹⁷⁰.

Di 2 axlêva sala 1929 de Civata Netewê Bilind qanûna jimara 1505 li ser erdên, yê ku ew li ser Cotkarên heremên Rojhilat de dê bêtin bibelavkirin, date biderkirin. Navroka vê qanûna hanê bi vî rengî ve tete biderkevtin:

Benda yekem: Erdên, yê ku ew divabûn ji bona xiznê li gora benda nehem de ji qanûna jimara 1097, ya ku ew di 19 axlêva sala 1927 de hatîye biderketin, bêtin biveguhestin û yê ku ew li ser Gundîyên ji Eşîrên Koçer hatine bibelavkirin, ew têtin bihiştin .

¹⁶⁹ Kanîya Pêşî, R. 527

¹⁷⁰ Ji Kovara "Rojhilata Şûreşgêr" 1930, Jimara 1009, R. 176

Benda duwem: Serdarî ji bona belavkirina van erdên hanê li ser wan Kesên di benda yekem de ji vê qanûna hanê bi navkirî ve tête bidesthilatkirin, li gora ku ew di Wilayetên ketine vê herema hanêyî nîşankirî de li gora benda yekem de ji qanûna jimara 1097 de (Wilayetên Orfa û Beyazî de) têtin bidîtin. Nêrxê erdên belavkirî, yanî yên ku ew li jêrî belavkirinê de têtin bidîtin, li gora buhayê cihî nîşankirî de ji bal Civata Dadgehê de tête binîşankirin û ew ji bal Civata Wilayetê de tête bimisogerkirin.

Cîgerê Giştî di kar û barên van civatan de beşdarîyê dide bikin, yên ku ew bi van Pirsîyaran ve têtin bigirêdan. Bi hîç tu rengê ve buhabûn nabin ji heşt baran bêtir bêtin bikin û ew ji du baran ji nêrxên wan kêmtir nabin bêtin bikin. Erdên "Bor" (Erdên Çolbûyî) li gora topraxên ji hev vekirî de li ser navê Serdarîyê de têtin bitomarkirin¹⁷¹.

Li ser peyva Serokê Wizaretê Ismet Paşa de 70 hezar donim li gora qanûna jimara 1505 de hate bibelavkirin. Lêbelê di rastîya rastî de Serdarîya Turkî bes û bi tenha ve bi nav ev erd ji bona Eşîrên Neşînvankirî, yên ku wan berê xwedanîya wan didate bikin, belavkirna wan ji bona sermilên xwe wê date bihildan. Hêjî ji vêjî bêtir wêna ew Eşîrên hanê bi darê zorê ve ji bona dana Xukitîyê beramber bi Erdên, yên ku ew di koka xwe de li nik wan de dihatin bidîtin, dane bineçarîkirin. Hêjî ji vêjî bêtir giringtir weha Desteyên Serdar ji bona pêkanîna perçekirinê di xebata rizgarîya Miletê Kurd de, yê ku ew

¹⁷¹ Destur, Bergê 10, Anqera, R. 1793

tanî radeyekî beramber bi ramyarîya hilandina Turkî ve bi yekbûn ve dihatin biderkevtin, keftileft didan bikirin û wan di rêya neşînkirina Eşîrên bêtir alozvan kirina kurdan bi mêrgeke dewlemend ve ji bona wergirtina Bacên bi zorê ve didan biermanckirin. Tevlivêjî weha bicihanîna vê qanûna hanê Dewlemendan û Selefvanan jê sûd dane biwergirtin; jiber Cemawerên Xebatkêş, yên ku ji bona wan erd hatin bifiroştin, li nik wan de sermiyanên pêwist ji bona Çandinîyê nedihatîn bidîtin. Weha ew mîna rêzanekê ji bona nava lepên bendîtîya aburî dihatin bikevtin.

Lêbelê kuştin û pêrabûnên Polîsî-Serpereştî hêjî hatin bimayîn, wan bi hîç rengêkî ve nikarîbûn tûrebûna Kurdan jiber xwe bidin bihilanîn. Jiber Kêrên bi serên xwe ve, yên ku ew ji bona raperîna sala 1925 datin bidaxwazkirin, hebûn û hêjî ew têtin bimayîn.

Weha di 1928-1929 de Kurdan li deverên çiyayî xurt de li Jorî Rojhilatî Welêt de bi civandina hêzên xwe ve dane bidestpêkirin. Di pêşîya sala 1930 de li devera Araratê de raperîn hate bivêketin. Weha li wir de Serpereştîyeke Kurdîyî bajarvanî di bin Serokitîya Ibrahîm Paşa de hate bipêkhatin. Tevî ku jimara Kurdan, yên ku ew ji bona xebatê bi serxwe ve hatin birabûn, di pêşîya pêşî de bi du hezar yanjî sê hezar Kes ve nedihatîn bigihaştin, tevlivêjî wan di şerên pêşîn de ligel hêzên Serdarîyê de mêrxasîyeke bê hampa dane biderxistin. Weha vê serhildana ji nişkêve bi lez ve ji bona tevgera azadîxwazî Kurdî desthilatîyên Turkî pê hatin biveciniqandin. Jiber ku ne di karina hêzên civandî de li Wilayetên Rojhilat de nabûdkirina raperîna dikarîbû bihata bicihanîn, weha Serdarîyê biryar date bidan, ku ew ji bona bertîlê û

gerandina vîlikan destê xwe careke din bide biavêtin.

Weha wê ligel Serekên Kurdan de bi gift û goyînê ve date bidestpêkirin. Wêna ji bona lêbuhurandinê ligel Beşdarên raperînê de û qazancên taybetî ji bona Rêberên wê -Nurî Beg, İbrahim Paşa û yên din date bisozkirin. Lêbelê yek peyv der barê daxwazên Milî û başkirina rewşên Cotkaran nehate bipistînkirin. Wênerên Kurdan mercên Serdarîyê datin binayînîkirin. Piştî ku Rêberîya Leşkerî Turkî yarmetî ji xwe re date biwergirtin, wê dest likarxistina pêrabûnên cengê date bikirin. Piştî şerên germ û giran, yên ku wan nêzîka mehekê dane biajotin, hêzên Serdarîyê hatin bibezeandin.

Wan li dû xwe de 2 hezar Dîl, 60 Rêjîk û 24 Top di nava destên kurdan de datin bihiştin. Herwehaji 12 Balafir hatin bixistin. Van tevan desthilatîyên Turkî bi renekî pêgîrî ve datin bitirsandin, jîbervêjî wê bi lez û bez ve jimara hêzên xwe li heremên dorhîla Erartê de tanî 45 hezar Nefer date bibêtirkirin¹⁷².

Di axlêva sala 1930 de hêzên Turkî bi piştgirtina Balafîran ve bi dorlêgirtina Kurdan li tiraşên Çiyayên ser Tuxûbên Îranê-Turkîyê de hatin biserkevtin.

Di vê dema hanê de Kurdên herema Mako (li Îranê de) yên nêzîk ji sînor bi hewara Şûreşgêran ve hatin bigihaştin û wan pişt li hêzên Serdarîyê dane bigirtin. Herwehaji tev li van komên hanê de Kurdên Wanê jî hatin bikirin.

¹⁷² K. August. Le pays de amal Ataturk, Leipzig, 1938, R. 30

Weha bi vî rengî ve jimara Şûreşgêran li heremê de, ya ku serjimara Xelkên wê bi 100 hezar Kes ve dihate bighiştin, bi 10 hezar Zilam ve hate bigihiştin.

Weha berî wê Serdarîya Îranê di gulana sala 1930 bi hêzên Turkî ve pê rê date bidan, ku ew di nava xakê Îranê re piştê li Şûreşgêran de bidin bigirtin. Bi rastî ve yekaneyên hêzan ji vê sûd ji xwe re dane biwergirtin. Wan weha pêwendiyên kurdan datin bibirîn, da ku ew ji birçîbûnan wan bi berdestkirinê ve bidin bineçarîkirin. Di 12 tîrmeha sala 1930 Eensa Nûçeyên Enedolê evê tê date bibelavkirin:

"Şerên leşkerî beramber bi Serpêçan (Liberrabûyîvanan) ve hatin bidawîkirin û ew hatin binabûdkirin. tevgera Serpêçîyî Kevneperestîyî Diyar, ya ku ew di 10 axlêvê de li ser destên Serpêçên çekdarî de, yên ku ew ji Farisê hatibûn, ya ku ew li herema Zîlanê de hate bivêxistin, bi carekê ve ew hate bitemirandin. Serpêçan hêrîşên xwe bi renekî bingeşî ve beramber nawendîyên dorhêlên: Moqawîs, Beyazîd, Batnots, Artix û yên din didan birûkirin. Rabûnên Şûreşgêran li pir cihan de, yên ku têde pasewanîya Leşkerî nedihate bidîtin, beramber bi liberxwedana Cotkaran de, yên ku wan liberxwedan bi xwe ve dane birêxistin, hatin bitarûmarkirin Weha bi hîç renekî ve di mejîyê Serpêçan de ne dihate biderkevtin, ku dê Xelk weha ji bona Rêstika Komarî bi vî rengî ve bêtin bidilsozîkirin. Tevaya pêrabûnên Rêberên Serpêçvanên ji Farisê hatine nehatin biserkevtin. Radanaser ji bona serjêrkirinê, ya ku ew di 5 axlêvê de beramber bi Serpêçan ve hatibû biwergirtin, ew di 10 axlêvê de bi serkevtineke bê hempa ve hate bitackirin. Tevaya giştîyî Serpêçvanan bi nîzîka 1500.

Zilam ve dihatin biderkevtin, tevî ku piranîya wanî mezin ji Farîsê hatibûn"¹⁷³.

Ev nûçeya hanê, ya ku pê bîr û bawerîya Giştî hatibû bixwestin, ku ew pê bête bixapandin, bi hîç renekî ji rengan ve ligel rastîyê de nedihate bilihevkirin; jiber şerên germ û sengîn hêjî tanî mêjuwa 20 gelawêja sala 1930 de li herema Wanê de lidarbûn. Herwehaji pêrejî jimara Şûreşgêran pir bi kêr ve hatine biderxistin. Weha Rojnamên Turkî "Cemhoriyet" û "Miliyet" dane bibîrxistin, ku raperîn bi berê xwe ve ji ya Şêx Seîdî sala 1925 de bi mezintir ve dihat biderkevtin. Heger wekû gotina Serîdarîyê bahate biderkevtin, dê Serdarîya Turkî ji bona nabûdkirina 1500 Şûreşgêran bi neçarî dagirtina 45 hezar Serbazî ve nehata bikin. Herwehaji bêgûmankirina li ser dildarîya Cotkaran de ji bona Rêstika Komarî û peyvkirina "ku wan bi xwe ve Liberxwedan datin birêxistin", ev bi xwe ve bes û bi tenha ve bi dewreke bê ser û pê ve tete biderkevtin. Li ser vena de banga Cîgerê Giştîyî Wilayetên Rojhilat Ibrahim Talî Beg (Endamê Partîya Gelê Komarî) tete bimukurandin. Weha wî di banga xwe de Xelkên pênc gundan, yên ku wan alîkarîya "Rêbiran" dane bikin, bi sizakirina sert ve date bizinharîkirin¹⁷⁴.

Wehaji di dawîya dawî jî de hîç bi rast ve nayete biderkevtin, ku bête bigûmankirin, ku piranîya Şûreşgêran ji Îranê hatibûn. Dorlêgirtina herema Eraratê tevî ne wekhevûna hêzan jî yek salê hate bidirêjkin. Wehaji raperîn nehate bitemirandin, tanî ku xwarin û teqemenî bi

¹⁷³"Belavoka lidûhev li ser Ragiyandina Rojhilata Navîn" Taşqend, 1930, Jimara 8-9, R. 36

¹⁷⁴Kanîya pêşî

carekê ve li nik Şûreşgêran de nehate bidawîkirin.

Li gora agehdariyên rojnama "Zarya Vastoka" de, ya ku ew di 20 avdara sala 1931 de hatîye biderkevtin, nekêmtir ji 200 gund û konên Koçerên Kurdan hatine binabûdkirin û herwehaji li ser destên hêzên Turkî de kuştina bi hezaran ve ji Xelkên, yên ku wan dikarîbûn bida bikarkirin, hate bikirin. Weha bi vî rengî ve tevaya gorîyan ligel malan de bi 10-15 hezar Mirov ve hatin bigihiştin.

Li gora Dayînên Encûmena "Xweyîbûna" Kurdî de 660 gund li ser destên Desteyên Komandên Turkî de hatin bikavil û biwêrankirin¹⁷⁵.

Weha vê serkutkirina hoviî ji bona serhildanê tûrebûneke pir tund li Welêt de date bivêxistin, ku wê date bihiştin, dengê wê li nik Civata Netewê Bilind de bête bivegerandin. Weha jimareke pir ji Cîgeran (Nuri-Dîn Paşa Kurdê-Wênerê ji bal Wilayetên Rojhilat de) ji bona hemû rûdanan dane bitawanbarkirin. Yekekî ji wan Cîgeran date bizanîn, di dema ku Belengazên ne agehdarkirî (Nêt li vir Kurdin) jîna xwe dane bipêşkeşkirin, weha Navtêdanên Serekî ji bona serhildanê niha ew bi parêzgarîya Cîgerîyê ve têtin biparêzkirin.

Lêbelê Cîgerê Qonyayê bigotin:

"Nuri-Dîn Paşa! niha ez gotina xwe ji bona te didim biraserkirin. Dem hatîye bisitewandin, da ku tu bête bipeyvandin. Demjimar hatîye bigihaştin, da ku tu buhayê

¹⁷⁵Kanîya Pêşî, 1931, Jimara 12, R. 14

xwîna rijandî bide bidan. Nu'ri-Dîn Paşa! Tu ji bona likarxistina vê bizavê û pêkanîna hoyên wê tête bitawanbarkirin, yên ku wan alozî li Welêt de dane bivêxistin"¹⁷⁶.

Weha di 30 gelawêja sala 1930 de Ismet Paşa, yê ku ew Serokê Wizaretê bû, di Peyva xwe de bihatina vekirina Şiva Hesinîyî Sîwasê de date bizanîn:

"Miletê Turk bi tenha xwe ve li vî Welatî de mafeyê daxwaza mafeyên Nijadî û Regezî bide bikirin, di vî warê hanê de mafeyê hîç Regezên din bi daxwazê ve nayête bidîtin"¹⁷⁷.

Lêbelê Wezîrê Dadperwerîyê Mehmed Esed Beg hêjîbêtir di peyva xwe de bi diyartir ve di hate biderkevtin, ya ku wî beramberî Bijarvanan li Odîmîşê de date bikirin:

"Em li Turkîyê de têtin bijîyandin, ya ku bi azadîyê ve bêtir ji her Welatekî li vê Dunyayê de tête biderkevtin. Wênerê we, yê ku ew bi hemû rastî û bîr û bawerîya xwe ve ji we re dide bi axivtin, dê nikarîba cihekî ji vî cihî baştir ji xwe re bidate bidîtin. Jibervêjî ez dilê xwe bi carekê ve ji we re didim bivekirin. Merovê Turk ew bi Mîrzayê bi tenha xwe ve tête biderkevtin û ji bona vî Welatî ew bi Xwedanê bi tenha ve tête bikirin. Lêbelê Mîrovên din, yên ku ew ne ji Nijadê Turkîyî paqij têtin biderkevtin, weha ji bona wan di vî Welatê hanê de bes û bi tenha ve yek mafe tête bidîtin, ku ew jî bi Kole û Bend ve bêtin biderkevtin. Debera vê rastîya hanê Dost û

¹⁷⁶P. Guentizon. Mustafa Kamal. on I, Orient en Marche 1937, R. 136

¹⁷⁷"Miliyet", 31. 8. 1930

Dujmin bidin bibihîstin û herwehajî debera Çiyan jî ji bona wê bêtin biagehdarîkirin"¹⁷⁸.

Weha bi vî rengî ve peyvên Wênerên Desteyên Serdarkirî bi hemû diyarî ve Ramyarîya Şovînî beramber bi Kêmanîyên Milî ve bi giştî ve û beramber bi Gelê Kurd ve bi rengê taybetî ve didin biderxistin. Herwehajî Ragiyaandina Turkî ji vî Canê hanê jî nedihate bicudakirin. Weha rojname "Hakimiyetî Milî" di mêjûwa 10 gelaweja sala 1930 de date binivîsandin:

"Hîç gûman bi serê Kesekî ve nayête bikevtin, ku me mîna van daxwazên hanê (li ser Serxwebûna Kurdistanê de - M. A. Hesretyan) ji bal van Hovên dir de... nala qerfekê dida bidanîn. Miletê me Ferhenga xwe bes û bi tenha ve bi dused gotinê ve dide bisînorkirin... Goşa bi tenha xwe ve ji bona Serpereştîya Xwedmoxtarîya wan li Naverasta Efrîqya de, yanî di yekekê ji Beyabanîya wê de, ya ku nîvê wê bi Mirovan ve û nîvê dînî wê bi Meymûnan ve tete bineşînkirin, tete bidîtin. Lêbelê Asya, Dergûşa kevintirîn Şahrîstanîyê bi hîç rengê ve dawxwazên wisa nikare bide bihilgirtin. Ew kesên, ku Mêrxasîyê ji bona nîyazeke weha di xwe de didin bidîtin, li pênavê Parastina Giştî de divên bêtin bizindanîkirin, bi rastî jî ve wehajî ew têtin biberamberkirin"¹⁷⁹.

Weha bi vî rengê hanê ve rabûn bi ragiyaandineke weha tije bi kîn ve li ser Mirovanyê de di Dewletekê de dihate bikirin, ku Wezîrê Dadperwerîya wê beramber bi

¹⁷⁸Kanîya Pêşî, 19. 6. 1930

¹⁷⁹"Belavoka lidûhev li ser Ragiyaandina Rojhilata Navîn", 1932, Jr 13-14, R.73

Bijarvanan ve date bizanîn: "Em li Turkîyê de têtin bijîyandin, ya ku bi azadîyê ve bêtirî ji her Welatekî li vê Dunyayê de tête biderkevtin".

Li ser ronahîyên li roj de hatine bixuyanîkirin, ne bi dujware ve tête biliberketin, bê çima Kêmanîyên Regezî û bi taybetî jî ve Kurdan bi hemû karînen xwe ve ji bona Rizgarkirina xwe ji bin destjêrîya Turkî dane bikeftleftkirin.

Di vekirina Rûniştina Civata Netewê Bilind de di mējûwa 1 çirya paşî de di sala 1930 de Mustafa Kemal di dema raxistina lêvenerîna xwe de li ser Rewşên Wilayetên Rojhilat de date bizanîn, ku Rûdanên, yên ku wan di Rojhilatî Turkîyê de dane birûdan, wan Serxwebûna me didan bitirsandin¹⁸⁰.

Weha bi vî rengî ve Desteyên Serdar li Welêt de li Xebata Gelê Kurd de li pênavê Serbestîyê de nala zordariyê li ser Serxwebûna Turkîyê de lê didatin bitemaşekirin. Piştî ku bi hovîti ve raperîna sala 1930 hate binabûdkirin, Serdarîya Turkî li ser pêrabûnên wergirtîyî xweyî taybetî de beramber bi Hilandina Kurdan li ser de hate biçûyîn. Jibervêjî weke ku piştî serhildana sala 1925 de, careke din Serdarî bi Koçkirina Kurd ve bi komel ve ji bona Enedola Naverast hate bipêrabûn, da ku Kurd di nava Beroşa Xelkên Turkên Cihî de bêtin bimeyandin.

Di 5 gulana sala 1930 de ji tevaya Dunyayê re qanûnek hate bizanîn, ku li gora wê de çar heremên Neşînvaniyê li

¹⁸⁰ Ataturkum Soyleve ve Demegleri. Cilt I, Istanbul, 1945, R. 349

Turkîyê de hatin bipêkhatin¹⁸¹.

Sisê ji wan li Kurdistanê de hatin birêxistin, tevî ku yekek ji wan "jiber hoyên Serûştîyî Tendurûstî, aburî, Ferhengî, Siyasî, Sitratîcî û herwehajî bi armanca parastina Rêstikê" ve divabû bi carekî ve ew bête biçolkirin û ji bona heremeke girtî bête biveguhestin.

Herwehajî du movikan di wê qanûnê de karîn ji bona Desteyên Serdar li Turkîyê de ji bona tewandina Yekitîya Eşîrî bi darê zorê ve, bi pêrabûnên Serpereştîyê û Serbazîyê û hılanîna mafeyên Reweştî ve ji bona Serokên Eşîran bi armanca xurtkirina cihên Desteyên Serdar li heremên Kurd de bi wan ve hate bidan. Li gora movika sêyem de tevaya malên neveguhestî yên Eşîran ji bona Maldarîya Dewletê hatin biveguhertin.

Weha bi vî terzî ve Xelkên Kurd ji Hatinên Jîyana xwe hatin bibêpişk û biparkirin. Movika çarem bi dana erdên sitandî ji bona Derketîyên Turkîyên ji Yunanê ve date biderxistin.

Di dawîya dawî de desthilatîyên Turkî ji bona peqandina Bingehê Abûrîyî Hebûna Eşîran ji alîyekî de û Neşînkirina "Regezên Turkîyî Girawkirî" di heremên Rojhilat de ji alîyê din de didate bikeftileftkirin, ku vî kar û barê hanê li gora bîr û bawerîya wan de divabû careke din vêxistina rapêrîneke din nede bihiştin.

Movika pêncem mafe ji bona Serpereştîyê bi dûrkirina

¹⁸¹L. Rambout, Les Kurdes et le droit, R. 32

tevaya Kesan ve ligel malên wan de bi mehna "lêgûmankirina Sîxuryê" de date bidan.

Lêbelê movikên şeşem û heftem weha didatin bidîtîn, ku divên pêrabûnên weha bêtin biwergirtin, da ku Kêmanîyên Milî zimanê xweyî zikmakî bidin bijibîrkin û herwehajî Kurdên li Neşînvîya danîştî de bes û bi tenha ve di warên xebitandinê û suxrê de bêtin bikaranîn.

Di dawîya dawî de movika heştam, ya ku ew bi taybetî ve ji bona Bijavtina -Helandin-Kurdan bi hemû diyarî ve hatibû bidanîn, dida bidivakirin, ku Endazîya Kurdan 10 % ji tevaya Xelkên Turk di heremên neşînkirî de neyêtin bibêtirkin.

Danzanîna qanûna 5 gulana sala 1930 de li Kurdistanê de metirsiyek date bidiyarkirin. Jîbervêjî Serdarîyê bi belavkirina derewan li ser vê qanûna hanê de pê hate birabûn, ku ew tanî piştî deh salên din nayête bicihanîn. Lêbelê du sal hêjî nehatibûn biderbaskirin, tanî ku ew qanûna koçkirinê jimara 2510 di mêjuwa 21 axlêva sala 1934 de hate bibiryarkirin. Vê qanûna hanê Derketîyên Turkî ji alîyên Rengê xwe ber bi xwe ve dida bivedan, lêbelê lêvenerandina wê dide bidiyarkirin, ku ew dijî Kêmanîyên Milî û di pêşîya pêşî de dijî Kurdan bi xwe ve dihate biraserkirin.

Weha benda yekem dide biderxistin, ku Serdarî li ser bingehê bernameyên, yên ku ew berê hatibûn biamadekirin, ji bona Wîzareta hundurû mafeyê "veguhertina" Cihê Neşînvîya Gelê li Welêt de li ser

"Pêwendîyên" Ferhenga Turkî de pê dide bidan¹⁸².

Bi gotineke din ve divabû, ku Serdarî bernameyekê ji bona Bijavtin, Koçkirin û Belavkirina Kêmanîyên Milî bide bilikarxistin û pêrejî Wizareta hundurû ev karê hanê ji bona misogerkirina bi cihanîna wî ve ji bona ser şanên xwe date bihildan. Wisa li gora neqşê de, ya ku ew ji bal Wizareta hundurû de hatibû biamadekirin û ji bal Serdarîyê de hatibû bimisogerkirin, Turkî ji bona sê hereman hatibû biparvekirin (Benda Duwem):

Herema yekem têde Melbendên, yên ku divabûn Xelkên Xwedanê Ferhenga Turkî têde bêtin bicivandin, hatin bidanîn.

Herema duwem heremên cudakirî ji bona belavkirina Koçkirvanan, yên ku ew divabûn di nava Ferhenga Turkî de bêtin bimeyandin, hatibûn bidanîn.

Herema sêyem, ya ku ew "jiber Hoyên Tendurûstî, abûrî, Ferhengî, Siyasî, Serbazî û herwehajî bi armanca parastina Rêstikê ve bi koçkirina ve bi carekê ve hatibû bidaxwazdîkirin û ji bona Neşînîyê û têde livandin hatibû binehiştin, hatibû bidanîn"¹⁸³.

Weha piranîya Kurdan di vê herema sêyem de dihatin bijîyandin û di dawîya dawî de peyv jî li ser derkirina wanî bi carekê ve de dihate bikirin.

¹⁸²Destur, Bergê 15, Perçê Duwem, Anqera, 1937, R. 1156

¹⁸³Kanîya pêşî, R. 1156

Li vê derê de em dixwazin bendên qanûna jimara 2510 bidin bianîn, ya ku ew bi rengekî yan yê din ve ji bona Bijavtina Xelkên Kurd li Turkîyê de dihate biraserkirin. Ji bona vê jî perçeyê duwem ji qanûnê hatibû bitirxankirin. Weha ji bona Civata Wîzaretê mafeyê careke din ji nû ve belavkirina Xelkên Neşînvana yanî yên Koçer ji herema sêyem ji bona heremên xweştir "ji bal mercên Jiyanê û tendurûstîyê de" hate bidan (Benda Heştam)¹⁸⁴.

Li gora benda nehem de mafe ji bona Wezîrê hundurê ji bona belavkirina Rewendan, yên ku ew bi Ferhenga Turkî ve ne bi girêdayî ve diahtin biderkevtin, nala Koman li ser bajarên biçûk û gundên Xelkên Turkan de hate bidan. Ligelî de Wezîrê hundurê dikarîbû wan Kesan, yên ku li wan de ji bal "Sîxurîyê" de dihatin bigumankirin, ji heremên sînorî wan bidin biderkirin, bi serdejî ve wî dikarîbû "Neşînvana Biyanî, Qereçîyan, Koçeran, yên ku ber bi Ferhenga Turkî ve nedihatî bivekevtin, ji bona derveyî sînorê Milî bide biderkirin"¹⁸⁵.

Lêbelê di benda dehem de ji qanûna 2510, ya ku Merov dikare tevaya wê bi Kurdan ve bide bisipartin, dide bigotin:

A. Qanûn bi Rewayaya Eşîran ve pê nayête birûniştin, heger ku ew jî ji bal Dadgehana yanî Fermanana yan jî bi her

¹⁸⁴Kanîya pêşî, R. 1157

¹⁸⁵Kanîya pêşî, R. 1158

Belgeyekî jî be hatibe bicihkirin. Tevaya desthilatîyên Maqûlan, Axan, Began, Şêxên Eşîran û hemû Encûmenan, yên ku ew ji bona wan li gora her Belgeyekî be jî, yanjî li ser reweşt û rewendan be jî hatibe bidan, têtin bihilanîn.

B. Hemû malên nevegühestî berî derkirina qanûnê, gerjî li ser çi Belgeyekî bin, yanjî Kaxezan bin, yê ku ew jî pê bêtin birûniştin, nala Malên Eşîrê jî bin, jiber ew rûwê wêyî rewaye, ku ew ji bona Maqûlê wê yanjî ji bona Beg, yanjî ji bona Axê yanjî ji bona Şêx hatibin bidan, ew malên hanê ji bona Maldarîya Dewletê têtin bivegühestin. Weha li gora vê qanûnê û bîr û bawerîyên serdarîyê de ev malên hanê li ser Derketîyan de tête bibelavkirin.

C. Wezîrê hundurû li ser biryara Serdarîyê de bibarkirin û belavkirina Maqûlan, Began, Axan û Şêxan ligel Zar û Zîçên wan de ji heremên nîşankirî hate bidesthilatkirin, heger ku Hebûna wan Kesan li heremên Sînorî de metirsîyê ji bona parastinê dide bidaxwazîkirin...¹⁸⁶.

Borcuwaziya Turkî bi pêrabûnên xwe ve ji bona nabûdkirina bidestketinên Serokên

¹⁸⁶Kanîya Pêşî, R. 1158-1159

Eşîran ne bes tenê pirsîyarîya xweşkirina berzbûna abûrî û zanyarîyî Xebatkêşên Kurdan diser guhên xwe re date biavêtin, herwehaji li ber wan be beramber bi sitemkarîya Karmendan ve nedida bidan, hêjîvivêjî bêtir wêna pirsîyarîya çandinîyê ne li ser berjewendîya Cemaweran de date biçarekirin, lêbelê wê her û her keftileft didate bikin, ku ew Xelkên Kurd nala bûjenekê ji bona çewisandinê û bijavtina Milî bidin biveguhertin.

Di benda yazdehan de ji qanûnê weha tête biderkevtin:

A. Li ser her Kesê, yê ku zimanê wîyî Zikmakî ne bi Turkî ve tête biderkevtin, nabe, ku ew avanîyan, gundan yanî taxan bide biavakirin, nabejî, ku ew ji bona Sazmendîyên Destkarîyê û Karkeran bi Endamî ve bête biwergirtin...

B. Bi erk ve li ser Wezîrê hundurû de tête biderkevtin, ku ew bi wergirtina pêrabûnên pêwistî ve li ser bingehe biryarîyên Serdarîyê de li ser pirsîyarîyên Ferhengî, Sipahî, Siyasî û Civakî de bi armanca parastinê ve li ser Rêstikê de beramber bi wan Kesên negirêdayî ve bi Ferhenga Turkî ve, yanî yên ku ew pêve bi negirêdayî ve têtin biderkevtin, lêbelê ew bi zimanê Turkî nadin bipeyivin, bide biwergirtin. Ji nava komên van pêrabûnên

hanê koçkirina wan Kesan ji bona heremên din, belavkirina wan ji hev û herwehaji ji wan jêsitendina mafeyê neşînvaniyê têtin bidîtin.

C. Bi hîç corekî ve nabe, ku serjimara Koçkirvanan, yên ew li gundên pêşveketî de û li bajaran de têtin bicihkirin, endaza wan ji 10 % ji tevaya Xelkên Melbendên Wilayetê bêtin bibêtirkin, herwehaji li ser wan de bi carekê ve avakirina taxên bi serênxwe ve tette biqedexekin¹⁸⁷.

Herwehaji qanûna jimara 2510 li ser pêrabûnên cudayî din jî de dide biavxtin, ku mebest jê kêmkirina çûn û hatinên Kêmanîyên Milî û nemaze ya Kurdan bi xwe ve tete biderkevtin.

Tevaya malên nevegühestîyî Kurdên barkirî ji herema sêyem ji bona Maldarîya Dewletê hatin bivegüherthin. benda 26 ev karê hanê date biderxistin.

Bi armanca bicîkirina Regezê Turkî li heremên Kurd de Serdarîyê ji bona Hatvanên ji Yunanê ji bona deh salan barkirina wan ji van hereman date biqedexekin.

Weha di benda 29 de hatîye binivîsandin:

"divê li ser Hatinvanan de... Rêwendan û herwehaji, yên ku ew ji bal Serdarîyê de di herema sêyem de hatine

¹⁸⁷Kanîya pêşî, R. 1159

bicîkirin, demeke ne kêmtir ji deh salan li wan heremên nîşankirî de bêtin bijîyankirin. Ji bona wan neşînî li heremên din de nabe bête bikirin, tanî ku ew destûrê ji Wizareta hundurû nedin biwergirtin"¹⁸⁸.

Lêbelê ji bona Kurdan û Wênerên Kêmanîyên Milîyî din tanî piştî derbasbûna deh salan jî bê destûra Serdarîyê li ser wan de barkirin ji cihên nîşankirî ji wan re ji bona neşînîyê bi carekê ve hatibû biqedexekirin.

Weha lêvenerîna hinan ji bendên qanûna taybetî ji Koçkirinê dide biderxistin, ku Desteyên Serdar li Turkîyê de Ramyarîya Turkkirinê beramber bi Kêmanîyên Milî ve pê dihate birabûn. Tevaya pêrabûnên wan bi carekê ve dihatin biraserkirin, ku careke din Xelkên Kurd li Welêt de ji nuh ve li pênavê xebatê de ji bona serxwebûnê nikaribin bi serxwe ve bêtin birabûn.

Di havîna sala 1934 de piştî hatina Şahê Îranê ji bona Anqera di navbera Dewleta Turkî û Îranê de lihevhatinek li ser "Nehîştina" pirsîyarîya Kurd de hate bigirêdan. Herdu Dewletan ji bona girtina sînorên xwe dane bilihevkirin, da ku "Rêbirên Rêyan" ji bona Îraqê û Surîyê nema bikaribin xwe bidin biavêtin.

Pêrejî di wê demê de bi xwe jî ve Serdarîya Turkî Rêstikeke Jirêderketî li Kurdistanê de date bidanîn. Weha Walîyê Sipahî Ceneral Ebdul-la Doxan desthilatîyên bêtir ji pêwist pê hatin bidan, da ku ew rê liber "Aloziyan" de bi her şeweyekî jî ve bide bigirtin. Xelkên heremên Kurdî û

¹⁸⁸ Kanîya pêşî, R. 1165

herema Botan bi taybetî ve fermana amadebûnê ji bona Barkirinê dane biwergirtin.

Lêbelê piranîya wan barkirina ji Erdê Bav û Kalan dane binayînîkirin û ew bi serê çiyar ve hatin bikevtin.

Weha azardana giştî nala bersivê li ser vê de hate bidestpêkirin. Di gelawêja sala 1934 de Balafîran ji bona pênc rojan herema, ya ku Kurd têde hatibûn bipenabûn, datin bibombeparankirin, da ku Kurd ji wê derê bêtin biderkirin. Bi pêrûniştina Rojnamevanên Biyanî pir ji Kurdan li Xarpûtê de hatin bidarvekirin, da ku "Kurdên bêtir bêdeng kûrtir bidin biremankirin". rojname Şamê "El-Qebes" di mêjûwa 19 gelawêja sala 1934 de date binivîsandin:

"Peyv li Kurdistanê de, mîna ku hin rojname didin biderxistin, ne li ser Şûreşê de têtê bigerandin, lêbelê ew bêtir li ser liberxwedana kurdan de beramber bi desthilatîyên Turkî ve têtê bigerandin; jiber desthilatîyên Turkî dixwazin Kurdan ji cihên wan bidin biderkirin û wan ji bona Rojava bidin bikoçkirin"¹⁸⁹.

Di 18 çirya pêşîya sala 1934 de Civata Bilindî Netewe li ser qanûna jimara 2848 de li ser guhertinên hin bendên qanûna Koçkirinê de date bibiryarîkirin¹⁹⁰.

Ev guhertinên hanê têtin biserhevdedan, ku ew zincîrên ji erkan, yên ku ew bi koçkirina Kurdan ve ji Wilayetên

¹⁸⁹ L. Rambout, Les kurdes et le droit, R. 37

¹⁹⁰ Destur, Bergê 17, Anqera, 1936, R. 28-30

Rojhilat ji bona yê Rojava ve têtin bigirêdan, ew ji bona Serpereştîya Wîzareta hundurû, Karê Civakî û Tendurûstîyê hate bidan, piştî ku ew bi Serdarîyî ve hatibûn bigirêdan.

Weha bi vî rengê hanê ve qanûna jimara 2848 ji nû ve careke din ramyarîya armanckirî de bi bijavtina - hilandina- Kêmanîyên Milî ve bi darê zorê ve date bibiryarkirin.

Bi başî ve di vî babetê hanê de têtê bidîtin, ku em perçeyekî ji gotara "Turkî û pirsîyarîya Milî", bidin bianîn ya ku ew di rojnama "Temps" de di 18 gelawêja sala 1937 de hatiye bibelavkirin. Ew bi xameya Rojnamevanekî Turkî hatiye binivîsandin:

"Hilandina Eşîrên Kurdan hêjî ne hatiye bicihanîn; jiber pirsîyar li ser encamê pîrbûna jimara Tawanbaran de hinekî têtê bidîjwarîkirin... Ji nêzîka du salan Serdarîyê (ya Turkî M. A. Hasretyan) Rêstîkek Jirêderketî li Welêt de dayite bidanîn û herwehaji tevaya desthilatîyê di nava Destên Walîyê Sipahî Ceneral Abdu-la Aleb Doxan de daye bicivandin, yê ku ew rêk û pêkxistina parastinê li deverê de bi hemû şeweyekî ve pê hatiye bisipartin. Ji wê çaxê û pêve destikên ragiyandinê hîç nûçe nema dane bibelavkirin. Bêgûman ku pêrabûnên wergirtî bi kêr ve daihatin biderkevtin; jîbervêjî ew bi bédilê Xelkê vê dihatin biderkevtin"¹⁹¹.

"Bi her awayekî jî ve-Nivîsyanê gotarê dide

¹⁹¹Temps, 18.8. 1937

bidawîkirin- tevî ku aramîya di demên 1934-1935 de li ser destên Ceneral Doxan hatiye bikirin, yê ku wî ji alîyekî de Serpereştîya kar û barên Civakî dida bikirin û ji aliyên din de nîşan didan bibilindkirin, da ku ew Dujminan li El-Ezîzê de bide bitirsandin. Weha van kar û barên hanê dest bi berdanan dane bikirinkirin, lêbelê berdanên wan pir nedane bidirêjkin..."¹⁹².

Di sala 1934 de Serdarîy Turkî bi destpêkirina xweser ji bona sertewandina Eşîrên Dêrsimê bi carekê ve date bibiryarkirin. Di pêşîya pêşî de wêna "bingeheki Êdyolocî" ji bona pêrabûnên Polîsî Serpereştîyê date bidanîn. "Zanistvan" û Rojnamevanên Turkî datin bizanîn, ku Kurdên Dêrsimê bi "Zaza" ve têtin biderkevtin û ew "Turkin, yên ku wan ji mêj ji deşt û çîyan ve dane bibarkirin", tevî ku ew ji Turkên din di pêşvektina xweyî Ferhengî de li paş de hatine bimayîn, lêbelê ew "ji bona xurtkirina pêwendîyên xwe ligel Welêt de ji nû ve careke din pir têtin bidildarîkirin".

Di vî babetê hanê de movikek li ser kêşa "Kurdan" de di Insikilopêdîya Turkî de dide bigotin: "Ku piranîya Kurdên Komara Turkî bi zimanê Turkî ve didin biaxivtin, ew mîna Turkan têtin bijîyandin û em Turk (Desteyên Serdar. M. A. Hesretyan) wan bi Neteweyekî din ve nadin bidanîn, ku ew pê têtin bigirêdan"¹⁹³.

Gava pêşîyî Serdarîya Turkî ji bona "bicihanîna

¹⁹²Kanîya pêşî

¹⁹³ Hayat Ansiklopedisi, C.7, Istanbul 1932, R. 2966

parastinê" li Dêrsimê de pêkanîna Wilayeteke nuh -Tuncilî- bû. Li ser vê hêzên Turkî derbasî nava Dêrsimê bûn, têde Serbazîgîrî date bizanîn û li ser tevaya heremê de destûra Turkî date bidanîn. Wê bi avaniya dibustanan ve li Dêrsimê de date bidestpêkirin, yên ku wan divabûn bi zanebûna Kurdên "Zaza" ve bihata birabûn, "yên ku wan zimanê Bav û kalên xwe" ligel Ferhenga Turkî de dabûn mijibîrkin.

Weha bi karanîna peyva "Kurd" nala nîşana Milîbûneke nîşankirî ve hate biqedexekirin. Bes û bi tenha nala ve Navekî giştî dikare bête bikaranîn.

Lêbelê liberxwekirina Cil û Bergên Milî, Sitiranên Gelêrî... Weha bi carekê ve ew hatin biqedexekirin. Di wê çaxê de bi xwe jî ve Serdarîya Turkî, ya ku jêre tête bigotin, Rastkirina Bacan li Dêrsimê de date bidestpêkirin. Jiber Xelkên heremê bigir xûkitî nizanîbûn bê ka çiye; jibervêjî bicihanîna vê "Rastkirina" hanê di rastîya rastê de bi ber barkirina Xelkên Dêrsimê ve bi barên Bacan ve dida biderxistin, yên ku berê wan ew nedidan binaskirin.

Rewşene, ku "Rastkirinê" ne bes tenê Xelkên heremê nedan biçogkirin, lêbelêjî ew nala hoyekî bingeşî ji bona serhildana sala 1937 de hate bidîtin. Herwehaji aloziya pêgirî di nava Kurdan de li ser Sitendina Erdên Eşîran de, yên ku ew ji mêj de di rastîya rastê de di nava destên Cotkarên Dêrsimê de dihate bidîtin, û ew ji bona Turkên-Hatî û Derebegên cihî hatin bibidan.

Pêrabûnên xistina bacan ji bona nava Dêrsimê û sitendina erdan ji Eşîran bi Liberxwedana Kurdan ve hatin

biberamberkirin, ku pê Serpereştîya Turkî bi ne cîkirina pîlanên xwe ve bi neçarî ve bi tex û paşvegerandinê ve hate bikirin.

Di sala 1937 de rabûna desthilatîyên Turkî cara duwem bi "Rastkirinê" ve nehate biserkevtin. Vê carê wê bi kuştinê ve date bidestpêkirin. Hin ji Kurdan, yên ku ew beramber bi pirojeyên wê ve hatin birabûn, wê ew di kolanên El-Ezîzê de li Sêpîyê de dane bixistin. Evaya nala çurûska pêşî ji bona serhildana Kurdan hate bidîtin

Weha bi lez û bez ve Dêrsimê xwe di nava virîna agirê serhildanê de date bidîtin. Jimara Şûreşvanan bi 30 hezar kes ve hate bigihaştin. Şûreşvanan li ser Yekaneyên Girdê Turkî de dane bihêrîşkirin. Pir, rê û têlên telefona dane bixerakirin, yên ku Dêrsim bi Cîhana derve re dida bigirêdan.

Serdarîya Turkî bi pêrabûna dagirtina perçeyî ve di cotana sala 1937 de hate bipêrabûn. Wê nêzîka 25 hezar Serbaz li Wilayeta Tuncilî de date biserhevkirin û wê ew nala carên berê bi Balafîran dane bipîştgirtkirin. lêbelê tevî liberxwedana Kurdayî gernasî jî weha serhildan hate bitemirandin û desthilatîyê xweser dest bi zoradrîyê, kuştin û xwînrijandina Xelkên Dêrsimêyî Bêguneh ve date bikirin.

Serheng Alginson di gotara xwe de "Pirsiyarîya kurd" weha daye binivîsandin:

"Qanûna Turkîyî nuh, ya ku ew di rêbenda sala 1937 de nala çûna li ser ramyarîya hilandina Milî de hate bizanîn, metirsîyeke mezin li Dêrsimê de date bikêrkirin. Di vê

herema hanê de, ya ku ew tanî niha tevgerên cudayî raserkirî dijî Serdarîyê hêjî pê nehatibûn bigihiştin, tevî pîrbûneke gewre ji Kurdan jî têde têtinn bipeydakirin. Piştî ku Turkan hêzên gewre dane biserhevkin, di gulana sala 1937 de dijî Serpêçan bi pêrabûnên şerkirinê ve dane bidestpêkin... Wezîrê hundurû Celal Beg bi Serdarîyê ve date bigihandin, ku ji niha û pêve nema pîrsiyarîyeke kurdî tête bidîtin. Wî date bigotin: Bajartî ligel Zordarîyê de dijî Rêbiran hatibû bibetirmekirin (biqelemkirin)...

Rawestandîna Mîrkarî tanî niha wisa dihate biderkevtin û Kurd bi Mîrkarî ve li Turkîyê de bi Turkên Çiyayî ve têtin binavkirin"¹⁹⁴.

Li ser têgihiştina "betirmekirina bajartîyê bi darê zorê" rastîyên tên didin biaxivandin:

"Weha nuhtirîn çek hatin bikaranîn û giringtirîn deqên sitratîcî hatin bigirtin. Herwehaji Balafirana roleke pir giring datin bilîstin. Di vê çaxa hanê de hate bizanîn, ku Balafirvana Turkî Sebîhe Nemkecen Diploma Zor Baş ji bona hêjabûna wêna pê hate bidan; jiber wê karên pir baş li Dêrsimê de date bikin.

Ne bes tenê wê firandinên lêgerandinên bi tirs ve ji bona dîtina cihên veşartîyî Serpêçan (Asîvanan) pê dihate birabûn, lêbelê hêjbêtir jî wê ew bi agirê rêjînkên xwe ve didan bibarandin...

Di 27 gulana sala 1937 de Leşker li ser cih de hate bizalkirin... Careke din ji nuh ve pilana (Hilandina Milî

¹⁹⁴International affairs Jr. 1, R. 96-97

-M. A. Hesretyan) sala 1935 de, ya ku ew hatibû bidanîn, tête bicihanîn"¹⁹⁵.

Weha Xwedîyê gotarê di rojnma "Tems" de date binivîsandin. Ev tev bi carekê ve têtin bimukurkirin, ku Destyên Serdar li Turkîyê de di pêrabûnên xwe de ji pilana danîneyî taybetî ji bona hilandina kurdan date bidestpêkirin.

Lêbelê Pêrabûnên Polîsî, yê ku Xelk bi wan ve pê tanî nabûdkirina canê wan dihatin birûkirin, bingehekî serekî ji bona vê Pilana hanê didan bipêkanîn.

Weha rojnama Turkî "Tan" date binîşankirin, "ku Dêrsim -Nawendîya tevgerê- dê bi carekê ve bête biwêrankirin û Xelkên wê dê ji bona heremên din bêtin bibarkirin...

Weha Xelkên Dêrsimê -yên Turk, *Turkên XURÛ* (gewrekin ji bal min de hahtîye bikin. M. A. Hesretyan), yê ku ew jiber zor û sitema Têmorleng ji bona Dêrsimê hatin birevandin, niha ew ligel tevaya Gelê Turkî de têtin bihilandin..."¹⁹⁶.

Weha niha ji bona we pêrabûnên wergirtî ji bona tevlêkirina Kurdên Dêrsimê -" *Turkên Xurû* "- ligel tevaya Gelê Turkî de didim bipêşkeşkirin.

¹⁹⁵Tems, 18. 8. 1937

¹⁹⁶Tan VI 1937

"Sêpîyên Dêrsimê bi Serpêçan ve hatin bixemilandin. Dadkirina bidarvekirinê xweser hatin bicihanîn..."

Piştî tomarkirina van rastîyên hanê Xwedîyê gotarê di "Tems" de dide bidawîkirin:

"bi pîrbûn ve têtê bîdiyarkirin, ku pîrsiyarîya Kurd bes û bi tenha ve pîrsiyarîyeke bi xwedan serûştîyeke Polîsî ve têtê bîderkevtin".

Bi armanca nabûdkirina her pêrabûneke kurd di liberxwedana zordarîyê û hilandina Milîyî de bi zorê ve rewşa Jirêderketî di Wilayetên Rojhilat de hate bihiştin û tevaya desthilatîyê di nava destên Serpereştîya Sipahî de hate bimayîn.

Herwehaji pêrejî ji nû ve careke din Serdarîya Turkî dest bi koçkirina Eşîrên Rewendên Kurdên dilsoz ve ji bona Wilayetên Rojava û yê hundurû date bîkirinkirin.

Amarên xweser li ser Kurdên Koçkirî ji Wilayetên Rojhilat ji bona yê Rojava de nayên bidîtin. Lêbelê Merov dikare wan ji Tomarkirinên Serjimarên Xelkêyî salên 1935, 1940 û 1945 bide bîderxistin, yê ku ev xana hanê li ser bîgehên wan de hatiye bîrêxistin.

Lîsta -2-
Livandina Xelkên Turkî (X):

Wilayet	Xelk		
	1935	1940	1945
El-Ezîzê	256189	190366	198081
Corux	271900	153273	159328
Erzerom	385387	371394	395876
Mûş	143899	73939	82699
Sêrt	127518	146522	133627
Tikîrdax	194252	209888	202666
Tuncilî	-	94639	90446
Wan	143437	112975	127858
Mêrdîn	229921	252505	234457
Diyarbakir	214142	257321	249949
Hekarê	-	36446	35124
Riza	-	172764	171925

(X). Li ser bingehê amarên: Istatistik Yillgi, sala 1951
R. 72- 73 hatiye birêxistin.

Waha serjimarên Xelkên Wilayetên El-Ezîzê, Corux,

Erzeromê, Mûşê û Wanê bes û bi tenha xwe ve ji sala 1935 de tanî sala 1940 nêzîka 298865 Kes hatin bikêmkirin. Weku ku diyare, li Turkîyê de hîç di nava van salên hanê de pêş û bapêş nehatin bidîtin. Bi serdejî ve bêtirbûna Xelkên Welêt bêtir ji 10 % ji sala 1935 de tanî sala 1940 hate bipêkhatin. Weha ev dide biderxistin, ku serjimara Xelkên Wilayetên nîşankirî divabû ew neyên bikêmkirin, lêbelê ew divabûn nêzîka 120 hezar Kes bêtin bibêtkirin.

Di dawîya dawî de divê em hoyê kêmkirina gotî di serjimara Xelkê de ji bona koçkirina Kurdan ji bal Serdarîya Turkî de bêtir ji 400 hezar Kes ji van Wilayetan ji bona Wilayetên din bidin bivegerandin.

Ramyarîya Desteyên Serdarî Turkî beramber bi Xelkên Kurd ve bi van xêzên bingeşîyî ve têtin binîşankirin:

1. Nayînkirina mafeyê Milîyî Kurd nala Miletêkî heyî bi serêxwe ve, yanî nala Komeke Rehîyî ji Turkan cudakirî tete bikin.


2. Pêrabûna hilandina Kurdan bi darê zorê ve di rêya pêrabûnên polîsî û serpereştîyê de tete bikin.

3. Serberjêrkirina Eşîrên Nîvserbixwe ve bi armanca veguhestina Kurdan ji bona mebesta civandina bacan, kolekirinê û yarmetîdan ji bona cengan têtin bikin.

4. Xebatkirin ji bona veguhestina

Koçeran ji jîyana rêwendîyê ji bona neşîniyê di rêya firotina erdên Kurdên koçkirî de tête bikirin, yên ku ew bi darê çove ji bona Wilayetên Rojava têtin biveguhestin.

Ez vê wergerandina kurmancî ji bona Heval û Dostê xweyî hêja Fewzî Esed didim bidîyarîkirin; jiber ku bi saya serê wî ve tevaya karên wergerandinên minî kurmanncî hemû hatine birastkirin. Dr. Cuma



- Di dawîya gulana sala 1937 de li gundê kêstek de di herema Cezîrê de ez hatime bizayîn.
- Di dibustanên bajarê qamişlo de ji sala 1946 tanî sala 1956 de min date bixwendin.
- Di dibustanên bajarê şamê de ji sal 1956 tanî sala 1959 de min date bixwendin.
- Di sala 1959 de min dest bi xwendina xweyî zanistgehê ve li zanistgeha şamê de berê felsefê de date bikirin.
- Ji sersala 1960 de ez ji bona Elmanya hatim biçûyin Piştî xwendina zimanê Elmanî li bajarê Koxil de ez di buhara sala 1960 de ji bona bajarê Monîx hatim biçûyîn û li wir de di zanistgeha wê de min zanistiyên dewletê tanî sala 1964 de date bixwendin.
- Di sala 1963 de ez ji bona Elmanya Demokrasî hatim biçûyîn û li wir de li bajarê Berlin de di Kolêca Abûrî de zanistîya abûrî û siyasîmin date bixwendin, der sala 1967 de min Diplom di zanistîya abûrîya siyasî de date biwergirtin û der sala 1972 de têde jî min Nama Doktora di zanistîya mêjûya abûrîya siyasî de date biwergirtin.
- Ji sala 1975 tanî sala 1992 de min di zanistgeha Hombold de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa abûrî siyasî de didate bikarkirin.

Dr. M.Ş.Cuma